# ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ

# DARIŞTIN

# AMADEYÎ 3

*Ziman û Perwerda Kurdî*

**Amadekar**

**M.Mele Şîrîn**

**Bi arîkariya**
**Komisyona ziman**
**M.Mele Elî**
**M.Mezlûm**
**M. Hawar**
**M. Îsmet**

**Nivîsîn**
**û**
**Şêwdayîna pirtûkê**
**M.Munzur**

**Têbînî:**
Pirtûka me jibo perwerdeya sala 2007-2008`ê ji aliyê saziya ziman ve di cih de hatiye dîtin.

# PÊŞGOTIN

Her gelek an neteweyek bi zimanê xwe tê naskirin,û bi ziman ;hebûna xwe ya li ser rûyê Cîhanê diparêze. Her çiqas neyarên Kurdan xwestine gelê Kurd ji ziman û çanda wan bi dûrbixin û bihelînin,lê ne karîne , lewma merce kû zimanê Kurdî di hemû qadên jiyanê de bê bikaranîn û parastin .Jibo vê yekê ,gelek erk û xebatên dikevin ser milê me kû divê ,em pê rabin hene,wekû tê gotin ziman stûna netewane ,ziman nasnameya gelane,ger em dixwazin xwe bi dost û dijminan bidin naskirin divê em li zimanê xwe xwedî derkevin û di jiyanê bikarbînin.

Xwendevan û mamostayên birêz yê ji vê pirtûkê sûd digrin.
Hêvîdarim kû bale bikêşin li ser xalên jêr.

Dariština refa sê yê amadeyî yak û rê dayî xurtkirina pskojî,guhdarikirin ,axaftin û nivîsînê. Di heman demê de cih daye tiştên van ji me re têdigihînin.

-P iştî nivîsîna her dabaşekî,ji wê dabaşê re mînakên pêwîst hatine danîn. Jibo hîn zelatir têbigihin dabaş bi gelek awayan hatine vekirin.
-Jibo xwendekarên me bikaribin azad bihizirin;di pirtûka me de ji helbest û parçeyên serbixwe re jî cih hatiye veqetandin.
-Armanc ji çêkirina vê pirtûkê ewe kû xwendekar di hunerê axaftin ,guhdarkirin ,nivîsîn û şrovekirinê de bên pêşxistin.
-Di dariştinê de pêşxistin,tê wateya pêşxistina di hemû aliyê jiyanê de.

M.Mele Şîrîn

## NAVEROK

### BEŞA YEKEMÎN 1
### XURTKIRINA DERÛNASIYÊ

1.Têkîliya Bi Kesekî Din Re ........ 10

a.Ji xwe re rêzgirtin.

b.Rêzgirtina guhdarê xwe.

c.Di hundir xwe û têkîliyên de bi pîvanbûn

2.Xwediyê vegotina xweşik sedemê gihandina rûmetê ye ........ 15

TESTA 1 ........ 19

### BEŞA DUWEMÎN
### GUHDARKIRIN

1.Nirxandina Kesê Didi Guhdarkirin ........ 22

2.Rexnekirina Guhdar ........ 23

3.Hilbijartina Ji Nava Guhartiya ........ 27

4.Di Demê Guhdarinê De Peyvên Hilbijatî Di Nivîsandin Yan Axaftinê de Karanîn ........ 29

TESTA 2 ........ 32

### BEŞA SÊYEMÎN
### AXAFTIN

1.Wateya Zarave Û Devokan ........ 35

2.Zimanê Nivîsînê (Zimanê Çandê ) çi ye ........ 40

3.Hêza Hevgirtinê Ya Zimanê Nivîsînê( Zimanê Çandê ........ 42

4.Cih û Girîngiya Ziman,Nivîsîna Huner,Wêje Û Xebatên Zanistî De ( Çand ) ........ 43

5.Bi Zimanê Nivîsînê(zimanê çandê,axaftina amadekirî û bê amadekirî tê kirin)48

a.Axaftina Rojane Yên Di Mijarên Corbecor De ........ 49

b.Axaftinên Hizrî Yên Di Pleya Yekem De Civakê Têkildar Dikin.
c.Xebatên Dramatîzasyonê.
ç.Xwendin Û Jiberkirina Helbestan ........ 51
TESTA 3 ........ 61

## BEŞA ÇAREMÎN
## NIVÎSÎN

1.Xebatên Nivîsînê ........ 64

2.Plan çi ye? ........ 98

3.Xebatên Çêkirina Planê ........ 105

4Xebatên nivîsîna Bi Plan ........ 123

5.Hûrkolîna Nivîsînê ........ 131

Testa 4 ........ 137

# BEŞÊ YEKEM. 1

## XURTKIRINA DERÛNASIYÊ

**1.Têkildayîna bi kesekî din re.**

**a- Ji xwe re rêzgirtin.**

**b-Rêzdayîna guhdarê xwe.**

**c- Di hundirê xwe û têkîliyên xwe de bi pîvanbûn.**

**2. Xwediyê vegotina xweşik sedemê gihandina rûmetê ye.**

**1.Têkîliya bi yekî din re.**
**a.Ji xwe re rêzgirtin.**
**b.Ji guhdarê xwe re rêzgirtin.**
**c. Bipîvanbûn, di hundirê xwe û têkîliyên xwe de.**

**XEBATÊN AMADEKARÎ**

1. **Taybetmendiyên kesê bi xwe bawerbûn û rêzdariyê diyardikin çine?**
2. **Dema yek ji te re rêzdariyê nîşa diki, tû bi çi dihesî?**
3. **Kesê bi axaftinê xwe ve girêdayî, di derbarê welatparêziyê de, nêrînên xwe naguheri, bi awayek rêkûpêk ,welatpariziya xwe berdewam dike, li ser rûmeta wî ya di nava civakê de cure**

## KANÎ AXA KURDAN

Ez sûnd dixwim tu bizan roniya erd û ezman,
Ji av û axa Kurdan.
Keskesora biharê evîn û dost û yarî,
Peyda bûne ji Kurdan.
Birûsk û tev gorî jî birîndar û dilhezîn,
Ji tîr û qîrê Kurdan.
Çiqas şahî xemrevîn pehîz bihar û havîn,
Hemî ji keyfa Kurdan.
Çi te'lîm û çi destxet çi hikmet û dewlet,
Hemî ji qewmê Kurdan.
Çi şehbaz û hunermed, çi govend û neqş û bend,
Bela bûne ji Kurdan.
Çi comerd û mêranî çi şabaş û nîşanî,
Hemî ji eslê Kurdan .
Çi kelat û çi xelat çi esîl û çi malbat,

Ji dost û eslê Kurdan.
Çi segvan û çi nêçîrvan çi dengbêj û bilûrvan,
Hemî hene li nik Kurdan.
Ewr û sahî her xweşe werin biçin Laleşa,
Kanî axa me Kurdan.

**Mistefa Ehmed Botî**

**:PEYV**

- **Gorî**:Qurban, cangorî
- **Dilhezîn** :dilbixem.
- **Tîr**:amêrek ya şer.
- **Xe**mrevîn :kesê xema mirova direvîni.
- **Te'lîm**:fêrkirin.
- **Hikmet**: Zanabûn.
- **Şehbaz**: Çeleng, core firindeyekê mezin.
- **Neqş**: nîgar.
- **Bend** : stranên dirêj.
- **Şabaş**:pereyên kû ji mitriban re tên dayîn.
- **Nîşanî** :dest nîşankirin.
- **Kelat:** navê navçeyekî li rojhilatê Kurdistan.
- **Esîl**:resen.
- **Segvan**:nîşançî.
- **Sahî** :ezmanê bê ewr.
- **Laleş** : heca Kurdan li Şêxana Başûrê Kurdistanê.

**PIRS:**

1. Li gor nivîskar girîngiya xakê çiye?
2. Li gor vê mijarê tiştên ji Kurdan peyda bûyî çine?
3. Li gor kû evqas taybetmendiyên kû helbestvan dane diyarkirin, çima Kurdan nekariye axa xwe tevayî bi destbêxin û azad bikin.
4. Mistefa Ehmed Botî di pesndana Kurdan de, xwestiye çi bêji?

## 1.TÊKILIYÊ BI YEKÎ DIN RE

Têkiliya di nava kesan de, tiştek di nava rêkûpêkiya civakê de, ji wan tiştane kû dest jê nayê berdan. Di roja me ya îro de, di nava civakê de gihandina kesên bikarin di nava kesan de têkiliyê pêkbînin armanca serekî ya rêkûpêkirina perwerda hemdeme. Ji bo tû bikaribî têkiliya di nava kesan pêkbînî, divê tû bi xwe bawer bî , rêzdariyê bi kesên din bidî hesandin, rêzdariyê ji guhadarê xwe re nîşan bikî , di xwe û danûstandinên xwe de bi pîvanbî.

### a. Rêzgirtina ji xwe re

Rêzgirtina ji xwe re; asteke, avêtina tiştên ez-ezî, pêşxistina aliyê mirovahiyêye. Kesê gihayî vê astê nabi kesekî xwe pesinkirî, bi xwe re lihevhatî, ew nebes ji xwe tenê, ji tevahî mirovan ,tebayan û xwezayê hesdiki û heya ji destê wî tê diparêzi. Kesê ji xwe re rêzdar, bêyî cudabûna ziman, ol, netew, çîn û hizra ramyarî bi tevayî mirovan re dixwazi têkiliyê avabiki. Bêmafiya kû li ser mirovekî tê kirin , wekî li ser tevahî mirovan hatî kirin bawer dikin.

Rêzdarî di civakên demokratîk de, nepîvanekî ya mezinbûnêye. Endamek ya li hevkirinê ji bo parastina mafê hev, azadiya hev bi awayekî berambere . Ji bo tû bigihî vê, pêwîste ji biçûkatî ve , bi xwendinê, fêrî riya hizirîna rast bibî û bibî xweyê hizra rexnekirinê. Ji bo kû tû bigihî vê çêbûnê, ev bi xwendin, guhdarkirin , çavdêrkirin û di nava bûyeran de cih girtinê gengaze.

### b.Rêzdariya ji bo guhdarê xwe.

Her kesê li derdora me, yê kû têkiliya me pêre heyî û danûstandinê pêre dikîn, guhdarê meye.

Em çiqas dixwzîn rêzê bidin xwe, divê ewqas jî rêzê bidin guhdarê xwe jî .

Li ser vê pêşiyên me wiha gotine:

“Dema tû sibê şiyar dibî, destpêkê dûa ji cîranê xwe re bike , pişt re ji xwe re bike”.

Ji vê gotina mezina tê têgihîştin kû tevgera tû ji xwe re di cih de dibînînî, tû dikarî ji hevalê xwe re jî bibînî, tişta em ji xwe re nexwazin, pêwîste em ji hevalê xwe re ziyan bihesibînin..

Di çaxên destpêkê de hizirmendê Çîniyan Konfoçyos gotinek ya wî bi vî awayî heye: "Tişta tû nexwazî li te bibi, tû jî li tû kesî neke." Ev pîvana hoye û heya niha nehatiye guhartin.

Melayê Cizîrî di helbelstek ya xwe de wiha gotiye:

**Ger luilui û mensûr ji nezmê tû dixwazî.**
**Wer şîirê Melê bîn te bi şîrazî çi hacet.**

Weke ji helbestê jî tê zanîn mirov di hêla hizir û ramana xwe de nekêmtirî Şîrazî ye. Pêwîste em ji xwe bawerbin; lê dema hûn vê dikin pêwîste hûn têgihîştibin, xweş dîtinbin û bihedarbin. Ji bîr nekin pêwîste guhdarî yê hember xwe bikin .

Hizrmendê Feransî Voltaîre (Volter) di rûniştinek ya xwe de ji guhadarên xwe re wiha dibêje:"Ez tevlî nêrînên we nabim lê jibo hûn bikarin hizira xwe biparêzin, bê xwestin ezê cane xwe bidim .

Rêzdariya ji bo guhdaran pîvanek ya kesê pêşketiye. Em jî li gor vê xwe bigihînin

**C. Bipîvanbûna di xwe û têkiliyên xwe de.**

Hevsengiya hundirîn, serkeftin û keyfxweşiyê zêde diki; rasterast bandorê li tenduristiya mergî diki .Taybetmendiyeke kû di nava civakê de asta mirov bandor diki. Kesê kû her dem dikevi nava diliyê (bonalim) û li hemberî tiştên asayî jî şaş dimîni, nizani çi bike, tişta diki jî pir poşman dibi, di hundire xwe de nehevsenge. Xwendekar li gor dizani, ger bixebiti wê refê derbaz biki, her dem dixwazî bi alîkariya kesên din refê derbaz bike di hundirê xwe de hevseng nayê hesibandin .

Hevsengî;ewe kû mirov bi reftarê xwe ziyanê didi wî û kesê derdora wî, jê birevi û bigihi têgehekê û vê ji xwe re biki rewşa jiyanê.

Pêwîste, mirov netenê di hundirê xwe de hevsengbi, Pêwîste di têkiliyê bi derdor re jî hevseng bi. Kesên kû gotin û rastiya wî newekheve, yên di soza xwe de ranawestin, bêbiryarbûna wan balê dikêşînin, di nava civakê de baş nayêdîtin.

Kesê bi vî awayî kû bawerî û hestê wî nehatine şiyarkirin, di têkiliya bi mirovan re neserkeftiye .

Ger em di nava xwe de û di têkiliyê bi hinek din re hevsengbin, di demekî kurt de emê bibînîn kesekî heskirî û bijartî, ji ber mirov dema têkiliyê bi me re datînin bi bawerin, balê dikşînin li ser durustî, biryarbûn û nebiryarbûna me. Lê belê kesê di hundirê xwe û

têkiliyên xwe de, hevsengbin, dostbûnek mayînde diparêzin û di jiyanê de serkeftî dibin.

Kesên di hundirê xwe de û di têkiliyên bi kesên din re nikaribin hevsengiye avabikin, dikevin rewşa xemgîniyê de, kesê nêzîkî xwe jî bê gêwl dikin. Xwendevanê neserkeftî, ji ber dê û bavê, neserkeftîne dibi sedemê ne serkeftina wî.

Ji ber wê em di rojnaman de bûyerên xemgîniyê yên weke xwekuştin û şelandinê dixwînin, di televizyona de jî rastê bûyerên bi vî awayî tên. Di civakên ji kesê bi hevseng pêkhatî de bûyerên bi vî awayî kêm tên dîtin. Ji ber di civakên bi vî awayî de distûrê têkiliyê di navbera mirovan de rêxistin dikin, hîna di zarokî de didin fêrkirin Tevahî distûrên civakî ji bo hêsankirina jiyana kesan, xweşikbûn li gor mergî û fîzîkî(fîzyolojîk) têne rêkûpêkirin. Di civakên pêşketî de her kes vê rastiyê dizani û ji bo parastina vê sazûmaniyê hewldidi .

Pêwîste neyê jibîrkirin rêxistina kû dibêjin dewlet nehêzekî ya rizgarkirina civakêye, dewlet awayekî ya rêxistinkirina gele ji nêzîk ve bi pileya perwerda gel ve girêdayiye û ji ber vê di serî de malbat, her endamekî yê civakê pêwîste kesê di hundirê xwe de hevseng û di têkiliyê bi derveyî xwe re jî hevseng bibin.

**RAHÊNAN**

**1-"Serkeftina herî mezin, serkeftina li hemberî xweye."**

-Vê gotina mezina di refê de bi awayekî devokî şîrove bikin.

## 2. Xweyê vegotina xweşik sedemê gihandina rûmetê ye.

**XEBATÊN AMADEKARÎ**

1. Dema hûn nikarin bin, tişta hûn dihizirin bînin ziman hûn çi hîsdikin?
2. Li gor we ji bo hûn yê ji derveyî xwe bi awayekî devokî yan jî nivîskî bandor bikin çi pêwîste?
3. ”Zimanê xweş bihara dilaye.”

**“Bi zimanê xweş mar ji kunê tê derxistin.**

Van gotinên mezinan vekin .

## BÎR Û BAWERÎ

Hebûn Bîr û Bawerî dû xortên çak çeleng bûne yekdil û serî li nav welatan bi deng .

Bîr û bawerî dû kesên birayê hevdû bûn , ji bavê wan dehlekî pir xweş mabû wan di nava vê dehla xweş de keyfekî mezin dikirin . Neyaran dixwest bikevin nava vê dehlê; lêbelê ji ber lehengiya van ciwanan ne diwêrîn bikevin nava dehlê. Xwestin biratiya navabera Bîr û Bawer xirabikin, destpêkê çûn gel birayê biçûk Bîr û jêre gotin em pir ji te hesdikîn û dixwazin bi te re hevaltî bikin; lê ji ber birayê te Bawer em nikarin werin serdana te, Bîr bi lêvbaziya wan hesiya û ji wan re got derkevin min ji bîr nekiriye we bavê min ji bo vê dehlê kuştiye . Ji wir rabûn û çûn cem birayê mezin Bawer heman tişt ji Bawer re jî gotin. Bawerê belengaz daxwaza wan ya hatina nava dehlê pejirand dema bi bawer re xwe berdan nava dehlê, Bîr li hemberî wan rawestiya û şer destpêkir Bawer jî bi neyaran re li hember Bîr şer kir. Bîr ji nava dehlê derxistin. Piştî demekî neyar li Bawer zivirîn û gotin : pêwîste tû ji nava dehlê derkevî, her çiqas Bawer li berxweda, piştî ser û dest şikandina xwe, ji nava dehlê derket û berê xwe da çiyê. Li birayê xwe Bîr geriya , piştî çend

rojan di rewşekî xirab de rastî birayê xwe Bîr hat, herdû birayan xwe avêtin hevdû û dest bi girî kirin**,** rewşa xwe ya kevin anîn bîra xwe, bi leyîstika li wan hatî kirin hesiyan û bi hev re êrîşî ser dehlê kirin .

Bîr û Bawerî bûn yek avêtin kîna berê dijmin kuştin lek bi lek dîsa bûne yek serî .

**Hezîn Kurdî**

**PEYV**

- **Çak**:baş
- **Çeleng**:kêrhatî,xweşik
- **Dehl**:cihê av û darên fêkî têde heye
- **Kîn** :xerez
- **Lek bi lek**:bir bir

**PIRS:**

1. Nirxandinekî li ser Bir û Bawer bikin.
2. Li gor parçê sedemê neyar ketî dehlê çi ye?
3. Li gor nivîskar ji bo em bikaribin, neyaran ji welatê xwe derxînin pêwîste em çi bikin?
4. Hizra bingehîn ya vê mijarê çiye?

**2. XWEYÊ VEGOTINA XWEŞIK SEDEMÊ GIHANDINA RÛMETÊ YE**

Tê zanîn xweyî ragihandina xweşik ji derdora ve pir tê heskirin û rêz jêre tê girtin . Ev gotinên mezinan, pendên pêşiyan , helbest, çîrok, serpêhatî , destan , yê mayîn roja me ya îro û hizira mirovan gihandin roja me, berhemên hostayên gotinane.

Ew peyvên xweş yên kû hizir, raman û hestên mirovan dertînin holê nebes kesî birêz dihêli, çand û şaristaniyê jî xwedî diki û pêştêxi .

Kesên xweş taxivin di nava civakê de rêzdariyê bi dest têxin."Goştê mirovan nayê xwarin, kevilê wan nayê wergirtin, ji derveyî zimanê wan yê şîrîn çi heye?"

Ev gotina mezinan rûmeta danûstandina me behs kirî radigihîne.

**Gotina di cih de çiqas giran bihaye.**
**Gotina şîrîn ji şîr şîrîntire.**

**Gotina tehl ji rule tehltire,**
**Gotina rast ji şûr tûjtire.**

Weke ji vê gotina mezina ya derbaz bûyî tê zanîn, kesên xwedî zimanê xweş dikarin gelek karên serkeftî biki.

-"Di pêkhatina civaka komîn de gotina komîn ji şêwe zedetir ji bo cewherê dabaşêye. Ev yek îsbat dike ku civak bi şêweyê komînî dikarê hebûna xwe dewam biki. Wextê civak ji rengê xwe yê komîn derkevi, di heman demê de derdikeve. Her pêşketina li dijî nirxê komîn bi xwe re hin nirxê wê jî dibi. Ji lewra ya rast eve; mirov jiyana komîn wek bingehê jiyanê bibîne."

**Serok APO**

Bi rastî jî kesên bi gotinên xwe yên xweş ber didin civakê ; disa kesê di hêla ramyarî û civakî de civakê diguherînin hene .

Rêberê gelê Kurd APO jî yek ji vaye , di ber dayîna civakê de rolek mezin leyîstiye. Di vê mijarê de kesê herî zêde bal kişandî ser xweye. Serok APO karî bi zimanê xwe yê pêşketî, gelê Kurd yê kû li gelek ola hatî belavkirin careke din kombiki.

Xweyê gotinên xweş, dikarin guhdar û xwendekaran bandor bikin, ber bidinê. Serok APO bi gotinên xwe yên xweş û giranbiha heskirin û baweriya gelê Kurd bi destxistiye. Serok APO ji zaroktiya xwe ve, bi zimanekî xweş dixwest bandora xwe çêbike. Bi vî awayî bû xwedî vegotinek xweş û civak bi awayek giştî bandor kir, kesê perwerdeyekî baş dîtîn , ji xwe bawer, ji guhdarê xwe re rêzdar, di mijarên vegotinî1 yên nivîskî û devokî de serkeftîne.

**MERCÊN AXAFTIN Û NIVÎSÎNA XWEŞ:**

**a.** Dîtina perwerdeyek baş ya ziman .
**b.** Bûyîna xwediyê çandekî giştî .
**c.** Pêwîste bizanibi tişta dihiziri li gor hiş bêxê rêzê.
**ç.** Rêzê, girîngî û rûmetê bidê guhdarê xwe.
**d.** Di xwe û têkiliyê xweyê bi derdor re bi pîvanbe .
**e.** Nirxê civaka di nav de jiyan kirî baş bizanibe.
**ê.** Divê bigihi gihandinekî wisa kû bikaribi xwendevan û guhdarên xwe û gel bandor bike û pewerde bike, zimanekî germ ji dil û têgihandî bikarbîne.

**RAHÊNAN**

Axaftina kesekî xweş daxive yê kû hûn nasdikin bi awayekî vekirî binivîsin û di refê de bixwînin.

## KURDÎ

Kurdî, zimanê kesê mezin,kes aştî xwaz û azadî xwaz,kesê gelê Rijhilata Navîn ji zordariya Dehak rizgarkir kirî,kesên xwediyê çanda newlotîk,kesên rê li ber xebitandina hişmendiyê vekirî,zimanê hozanvana ,zimanê we ye.

Kurdî;zimanê dayîkan ,zimanê dayîkan zimanê herî xweşike…Li gor cihê xwe ji şûr tûjtir,ji pola hişktir,ji tehta behintir,ji brûskê bi leztir,ji mûyê ziratir ,ji pelpelîkê firektir,ji kulîkan bi rengtir,ji bêhnê şîrîntir,ji zêr biriqîtir,ji avê zelatir e.

Kurdiya kû leza dilxweşa,germahiya dilbikula,baweriya lehengan,bankirina baban,nermbûna dilê dayîkan,kîna xeyîdiya ,şkandina şkestiya,henekirina bi gêwla ,şînatiya ezmanan,zindîbûna avê,leyîstina rohniya heyvê,bi lez derbazbûna tîrêjên rojê bi me didi zanîn. s hundir. Li hemberî tevahiya zimanan dikare bibe bersiv û dikare hemû hestan bi me bide têgihandin,kurdiya me ya jiyanê bi me didi zanîne.

Kurdiya me,ya kû me bi hev didê têgihandin,ya kû em di nava gelê Cihanê de ,kirin xwediyê cihekî bi rûmete …

Ciwanên ji me ciwantir xwezî bi we ,hûnê bi vî zimanê pîroz ji me xweştir baxivin.

# TEST I

## Bihêzbûna Derûniyê

**1.Kîjan taybetmendî, mirov nayêxi şayanê têgehek rêzdar?**

**a.** Ez ezîbûn.
**b.** Bê cûdabûn ji tevahî mirovan heskirin.
**c.** Parastin û xwedî derketina li maf û azadiya kesî.
**ç.** Ji her kes û her tiştî zêdetir ji xwe heskirin.
**d.** Bi awayek baş ji hevdu veqetandina kesê dilnizm û ketî.

**2.Kesê ji xwe re rêzdar nakevi nava kîjan hewldanan?**

**a**. Bi baldarî û berdewam dixwîni.
**b.** Çavdêrek başe.
**c.** Rûmetê didi xwe rexnekirinê .
**ç.** Di navbera hest û hizirê xwe de hevsengiyek baş çêdike.
**d.** Ji ber kû pir ji xwe bawere guhdarî tu kesê din naki.

**3.Kesê ji guhdarê xwe re rêzdar, kîjan taybetmendiyan hilnagiri**.

**a.** Tişta nexwaze li wî bê kirin, naxwazi li tu kesê din bê kirin.
**b.** Ji bo yê li hember xwe neşkêni nêrîna xwe nabêji.
**c.** Ji pêşdarezandinê hatiye paqijkirin .
**c.** Axaftina yê hember xwe nabiri.
**d.** Wek heyî tê dîtin,wek tê dîtin jî heye.

**4.Kîjan mirov di xwe û têkîliyên bi guhdarê xwe re bê pîvane?**

**a.** Parêzerê bawer diki kû çi doza bikeviyê, wê ser bêxi.
**b.** Doxtorê krêdarê xwe yê xeydî, bi awayê herî baş venêrîn diki.
**c.** Xwendekarê giliyê hevalekê xwe yê ew şkandî, li cem mamosta naki.
**ç.** Dergevanê xizan dema cûzdana pera ya cîranê xwe di baxçe de dibîne, di cih de didiyê.
**d.** Karbidest dema di karekî de bin dikevi, xwe nû diki.

**5.Ji van vebijarkên jêrî ,kîjan ne taybetmendiya kesê ji xwe re rêzdare ?**

**a.** Di zanebûna kêmayî û meyla xwe deye.
**b.** Xwe gihîştî û bes dibîni.
**c.** Xwe nas diki.
**ç.** Sedemê binkeftina xwe dizani.
**d.** Di zanebûna kêrhatinên xwe deye.

**6. Xwediyê ravekirina xweşik, kîjan taybetmendiyan hilnagirin.**

**a.** Hest û hizirê xwe heya dikari di nava rêk û pêkiyekî de tîne ziman.

**b.** Hem ji xwe û hem jî ji guhdarên xwe re rêzdar û bi bawere.

**c.** Rûmeta civaka di nav de jiyan kirî baş dizani.

**ç.** Ji bo berjewendiya xwe karê neki nîni.

**d.** Weke çawa zimanê axaftin û nivîsînê baş bikartîni, wilo tona deng li gor pîvana rêzdariyê tevgera dest û rû jî bikartîni.

## BEŞA 2
## GUHDARKIRIN

1. **Nirxandina kesê didi guhadarkirin.**
2. **Rexnekirina guhdarker.**
3. **Hilbijartin ji nava guhdarkiriya.**
4. **Di demê guhdarkirinê de, peyvên hilbijartî di nivîsandin yan axaftinê de bikarbînin.**

1. **Nirxandina kesê didi guhdarkirin.**
2. **Rexnekirina guhdar.**

**XEBATÊN AMEDEKARÎ**

1. **Guhdarek bi rêz, balder, bi berhem û sentezvan, dema guhdarkirinê de pêwîste çi biki?**
2. **Dema tû taxivî tû ji guhdarê xwe li hêviya çiyî?**
3. **Dema tû dibêjî têgeha hizira rexneker, çi têdigihî?**

## BIRYA DESTPÊKÊ YA PKK`Ê

Piştî serokê gelê kurd sala 1973 ê biryara cûdabûna ji çepê Tirkan didê,lêkolînekî bi giştî li ser tevayî Kurdistanê diki û wiha dibêje:

Kurdistan heye û bindeste,bi vî awayî dest bi xebatê kirin,armanckirin kû gelê Kurd weke gelekî bi namûs û bi şeref bidin jiyankirin. Ev tişt bes ,piştî azadkirina kesayetiya kurd gengaz bû,jiber gelek çiqas dewlemed dibe bila bibi piştî bindestbi û di kesayta xwe de ne azad bê ,tû caran şayanê cihekî bilind û danûstandinekî bi rêzdarî nayê dîtin.

Pejirandina bindestiya hêzekî biyanî,taybetmendiyekî ya kesên ji taybetmendiyên mirovatiyê dûr û kesên jibo bindestiyê cave wan hatî tewandine,kesên ne ketî vê rewşa ketî,bi vîna xwe tû caran naxwazin bindestiya biyaniyan bipejirînin.

Di rastiyê de, namûs û şanaziya gelê Kurd mezin û bilinde,gelo ger gelê Kurd heya dawî bigota ,ez dîlim û neçarim her tiştê dagirkeran bipejirînim dê çi biba? Di encamc de ,rojekê dê neçarî şerê azadiyê ne biba?

Bi vê cûdabûnê gelê Kurd dibin rêvebiriya PKK ê de bê kû ji mirinê bitirsi dest bi şer kir û weke kesê bi şeref û namûs bi destê xwe dest bi qetandina zinzîra koletiyê kir. Nexwest bibê ew gelê bê

rûmetê kû bi destê xwe zincîra koletiyê têxin stûyê xwe,ev tişt bi dost û neyaran da hîskirin.

**PIRS:**

**1.** Cîwaziya di navber kesê azad û ne azad de binirxînin.

**2.** Ji gotina rêber APO ya kû dibêje Kurdistan heye û bindeste ,hûn çi têdigihin?

**3.** Raman bingehîn û yên arîkarê vê mijarê nîşa bikin?

**1.NIRXANDINA KESÊ DIDI GUHDARKIRIN**

Di bihîstin û guhdarkirina mijarekê de cêwazî heye. Guhdarkirin, tevgerekî zanistî ya sazûmaniya bihîstinêye.

Pêwîste guhdar li ser mijarê bi baldarî rawesti. Baldarî bi tenê nebese, guhdar pêwîste bi awayekî rexneker, yê daxivi di parzinga hişê xwe re derbaz bike.

Ji bo kû yê guhdar diki, ji axaftina yê daxivi sûd wergiri, pêwîste xwe ji pêşdarezînê rizgar bike. Bes guhdarek bê alî dikare bi awayekî tendurist axaftinê binirixînîni.

Di demê guhdarkirinê de; peyv, biwêj û têgehên wateya wan ne hatî têgihîştin, pêwîste têbînî bikin û piştre wateya wan têbigihîn.

Ji beriya kû em guhadarî axaftina bi amadekarî ya weke konferans, civîna vekirî û sempozyomê bikîn, pêwîste ji çavkaniyên di derbarê van mijaran de kû agehdarî di wan de heyî, têbînî bên girtin. Bi vê xebatê mijar wê hîn zelal bê têgihandin. Ji bo em bikaribin yê didi guhdarkirin, têbigihin pêwîste em li gor van distûran tevbigerîn:

**a.** Pêwîste em agehdariyên serekî yê mijarê kombikin.

**b.** Bê alî guhdar bikî, ji pêşdarezandinê birevîn.

**c.** Pêwîste di demê guhdarkirinê de têbîniyan bigirîn.

**ç.** Pêwîste axaftinê bi baldarî ta dawî guhdar bikîn.

**d.** Peyv, biwêj û têgehên wateya wan tênegihayî binvîsî, piştî fêrbûna wata wan nirxandina xwe bikin.

**e.** Bi awayekî rexneker, guhdariya axaftinê bikin.

**2. REXNEKIRINA KESÊ GUHDAR**

Rexnekirina her nêrîn, danûstandin û helwestê napejîrînin, nezanistiye.

Rexnekirina bi rêkûpêk netenê tişta em napesinînin, pêwîste aliyê dipesinînin jî derxînin holê.

Dibi kû kesek vê axaftinê nepesinînî, lê belê her kesê kû vê dibêji, neçare çima napesinînî bidi diyarkirin. Ji ber kesê dipesinînî jî, neçare bêji çima xweş dîtiye, kesê vê rêbazê pêkneyînî, erênî nayê hesibandin.

Nirxandina guhdarvan di pêşxistina hest û hizira pêvajoyekî tîştekî wilo ye dev jê nayê berdan. Ger em li axaftvanekî ji ber distûra dilpakiyê, yan ji civaka kesên bi çand hes dikîn guhdar bikîn, li distûra rêzdariya me û yê em pêre daxivin re li hev nayê. Rexnekirina guhdarvana tê wateya rûmet dayîna axaftvan, bê deng mayîn yan jî her wekû guhdar dikî xwe nîşandan neraste. Divê neyê ji bîrkirin di welatên rexnekirin li wan belav û bi zanist tê kirin de, mafê mirov û demokrasî li ser bingerhek rast tê rûnandin.

Di civaka rexne di wan de nayê kirin de, yan bê distûr tê kirin, berjewendiyê kesî derbazî pêşiya berjewendiyên giştî dibi. Di civakên bi vî awayî de heskirina mirov, aştî û nirxên bi vî awayî ji dervey daxwazê derbazî jiyanê nabi.

**RAHÊNAN**

Axaftinekî; girîngiya dîtina xweş ya ku di jiyana demokartîk de dest jê nayê berdan tê de heyî binvîsin.

Axaftina we amedekirî di refê de bixwînin.

Aliyê axaftina xwe ya serkeftî û ne serkeftî bi hevalên xwe re cure bikin.

## ZANEBÛN Û WELATPARÊZÎ

Ji ber kû bavê min xwedî li ziman û kurdîniyê derdiket em neçar bûn ku ji Mukriyanê koçberî Başûrê Kurdistanê bibin.Gîw Mukriyanî bavê min û Husên Husnî mamê min bû .Van herdû birayan di warê rojnamegerî û rewşenbîriya Kurdî de gelek kar û xebat kirine.

Mamê min Husên Husnî yekemîn Kurde kû çapxaneyek bi Kurdî li Heleb'ê sazkiribû .Ji sala 1915'an heta sala 1925 an gelek kovar û rojname bi dizî çapkirin ;wekî çiyayê kurmênc. Ararat , Kurdistan û pirtûkek jî çapkiriye bi navê XUNÇEY BEHARISTAN. hemû xebatên wî bi kurdî bûn. Di sala 1925 an de neçar bû hate Baxda'yê, Nizanim belkî jî bandora wan li min kiribû, ji nava malbata me bi tenê min ev rê girtibû.Hîn ez zarok bûm ,min ev rê girt .Di dema şoreşa 14'ê Tîrmeha 1958'an de gelek şaîr dihatin rex bavê min,wan dabaşa biratiya Kurd û Ereban dikirin. Min ne dizanî lê dîsa jî min guhê xwe dida wan. Min wê demê dû helbest nivîsîbûn, bavê min dît kû ew behremendî li cem min heye,wî pûte bi min da. Wî ez handam. Ji bo ez pirtûkan bixwînim, min bi xwe jî jê hes dikir, çi dema derfet hebûya, ez li jora bavê xwebûm, jora wî tijî pirtûkbû.

Min hertim dixwend . min bi Erebî dinivîsand min çîrok nivîsandin, ji ber kû bi Erebî bûn , min nîşanî bavê xwe nedan, ji ber kû wî dixwest ez bi Kurdî binvîsim. Ez di kurdî de ne şarezabûm , paşê ez bi xwe hînî xwendina bi Kurdî bûm, lê nivîsandin bi Erebî bû.

Dema kû min xwendina amadeyî bi dawî kir, diviya ez biçûma zanîngehê , nasnameya me ya Îraqî tûnebû û ji ber kû navê min Kurdistan bû, nasname nedidane min. Min li Musil başa zanistî bi destxistibû, min dixwest matematîkê bixwînim, lê ji ber kû nasnameya min nebû, destûr nehat dayîn kû ez xwendina xwe bidomînim.

Ez salekê li male rûniştim , min têkoşin da heya kû ez nasnameya bi navê xwe wergirim, wan dixwest kû ez navê xwe bikim Erebî. Me gelekî hewlda, heya gihîşte wezîr û me gelek jî pere dan heya min nasname bi navê xwe wergirt.

Piştî wergirtina nasnameyê, bavê min got: “Tû neçe Mûsil’ê, ji ber kû navê te Kurdistane, dibi kû tû gelek bê çewsandin, were em biçin Baxdayê Min got: “Ez biçim Baxdayê li wir jî beşa zanistî bixwînim.” bavê min got: “Başe” Lê wê demê jî tiştek di serê bavê min de hebû , min pê nedizanî , wî dixwest ez biçim beşa Kurdî.

Ez çûm Baxdayê, min got: “Ez dixwazim zanistê bixwînim.” lê wî ji min re got : “Divê tû biçî li Musil’ê bixwînî, tû dikarî biçî beşekî kû li Musil’ê nîne “Lê planeke bavê min hebû, wî dixwest min bişîni beşa Kurdî. Min xwest biçim beşên din yên mîna felsefe û Îngilîzî biçi , wî got:”Tuyê çi ji felsefê û Îngilîzî bikî biçe kurdî , piştî te kurdî qedand tu dikanî beşên din jî bixwînî .Ez jî çûm Kurdî di destpêkê de gelek dijwar bû, jibo min ,hê demê sala 1964’an de bû.Piştî demekê ez lê vebûm .Di sala yekem de di beşê de duyem bûm salên 2,3 û 4 di beşê de yekem bûm li wir derfet bû min vebûn ; ku bi kurdî binivîsim , bi Erebî binivîsim , biçim dibistana seqafî Birîtanî Îngilîzî hînbibim. Ez têgihîştim ka Ereb çi ye? Helbest çi ye?Ziman çi ye? Yanî deriyê Cihaneke din li ber min vebû.

**PEYV:**

- **Mukiryan**:herêmeke li Rojhilatê Kurdistan’êye.
- **Pûte**: Girîngî ,qîmet(bakim)
- **Jûr**: ode, hundir
- **Handan**:Beridandin teşwîqkirin
- **Kuta**:dawîkirin
- **Çewisandin:**perçiqandin, Bişaftin
- **Dibistana seqafî:** dibistana Rewşenbîrî

**PIRS:**

**1.** Rola malbata Mukiryanî di çapexaneya Kurdî de çiye?

**2.** Sedemê Kurdistan Mukiryanî ewqas li berxweda û zimanê Kurdî hilbijart çibû?

**3.** Asta çapxaneya Kurdî destpêkê û niha beramber bikin.

3. **Hilbijartina ji nava guhdarkiriya**
4. **Di demê guhdarkirinê de peyvên hatî hilbijartin devokî yan jî nnivîskî bikaranîna wan.**

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

1. **Axaftina hûn guhdar dikin xwediyê kîjan taybetmendiya bi, dê bala we bikêşîni**
2. **Ji axaftina tû guhdar dikî sûd bigre û ji gotinên xwe axaftinekî amade bike**
3. **Di waneyek ya wêjeyî de tişta mamostayê we dayî, bi kurtî binvîsin.**

## EM LI SER DÎWARÊ MAMÊ FEQÎ DÎWARÊ ŞAŞ LÊ NEKIN

Roja 12'ê Adarê li Enstîtûya Kurdî ya Stembolê bi boneya salvegera koça dawî Feqe Hûsên sagnic kû me jê re digot (mamê Feqî) ,çalakiyek bîranînê hate li darxistin di vê şeva bîranînê de gelek kesan serborî û serpêhatiyên xwe yên li ser mamê Feqî vegotin.Yek ji yekî rengîntirbû; lê bivê nevê her bîranînekî hest û ramanên xwediyê xwe di nava xwe de dihewînin yan jî sobjektîvin. Di vê şevê de jî her yekî li gor dilê xwe wêneyek sazkir, yan jî her kes bû mîmarê dîwarê xwe. Ev jî tiştekî siruştiye; lê nirxandina hinek endaman yên li ser helwesta siyasî ya mamê Feqî ne tenê sobjektîv bû; belkî ji rastiyê jî dûrbû.

Danûstandina me bi mamê Feqî re bi piranî li ser zimanê Kurdî bû. Li ser siyasetê me zêde gotûbêj pêre ne dikir. Lê berî hilbijartina sala 1999'an dema kû em bi hev re em çûn Enqerê da kû beşdarî civîneke HADEP'ê ya li gel rewşenbîran bibin. Di rê de min derfet dît kû hinekî pê re li ser siyasetê gotûbêj bikim ,tişta kû min dît, mamê Feqî rêz û rêçikên sosyalîzmê baş fêr bibû. Baweriya xwe jî pê anîbû. Ji ber vê yekê jî xwe nêzî tevgera azadiyê didît. Pêşeroja xwe di nava vê

tevgerê de dîtibû. Ji ciwanên di nava vê tevgerê de hêz û gêwl digirt lewra jî ne tenê bi berhemên xwe û xebata xwe ya rewşenbîrî, her wiha bi çalakiyên xwe jî piştgirî dida tevgerê. Ji ber vê yekê ew bibû mamê hemû  ciwanên Kurd, yên azadîxwaz. Divê bê gotin kû helwest û rawestana wî di nava tevgerê de rewşenbîrî bû, lê rewşenbîriyeke têkildarî xebata çalak.

Di şevê de pirtûkeke li ser mamê Feqî hatî nivîsandin hate belavkirin. Di pirtûkê de bîranînên gelek kesan yên li ser mamê Feqî hebûn. Dema min bala xwe da bîranînên hinek kesan yên kû di pirtûkê de cih girtine, min dît kû nirxandinên bi heman rengî cih girtine, lê hinek nirxandin wê dîtinê pûç dertêxin. Ji van dîtinan ya herî balkêş dîtin û nirxandina Îsmail Beşikcî'ye. Dîtina wî girînge, ji ber kû wî mamê Feqî ji ber vê yekê rexnekirî. li gorî nirxandina Beşikcî mamê Feqî piştî kû PKK ê naskiriye têkiliyên xwe bi hevalên xwe yên berê re kêm û bi sînor kiriye, heya xwestiye wan jibîr biki. Ev dîtin bi tena serê xwe nirxandinên kesên kû dixwazin rengekî din bidin mamê Feqî pûç dertêxi. Ji bilî vê jî bersivên didin van kesan. Bû nimûne ev bîranîna birêz Şerîf Beyaz balkêşe :(konsolosê Emerîkayî yê stembolê rojek em vexwendin konsolosxaneyê sal 1993'ê bû. Dewleta Tirk operesyonên dijwar li Kurdistan'ê pêktanîn; tevî seyda em sê kes çûne konsolosxaneyê. Konsolosê sereke di dawiya axaftinê de bi awayekî veşartî dixwest kû rewşenbîr û gel piştgiriya PKK'ê nekin û wê bi tenê bihêlin. Di heman demê de seyda axaftina wî birî û wiha got: “Belê niha em wekî we û dewleta Tirkan nebihêzin, em jar û bindestin, lê dil û mejiyê me azade, PKK rûmeta me û ya gelê Kurd e; em nikarin dev ji rûmeta xwe berdin, lewra bê rûmetî mirine.”

Bi dîtina me helwesta mamê Feqî ya siyasî zelale. Pêwîst naki hinek li ser navê wî dîwarên xwehrûmarû lêkin her kes mîmarê dîwarê xweye. Mamê Feqî dîaliktîka meteryalîzim berî gelek rewşenbîrên Kurd bi Erebî xwendibû. Baweriya wî ya bi rêgeza sozyalîzmê xurt bû, lewra jî ji tevgera azadiyê nêzî dil û mejiyê xwe didît. Ez jî weke şagirtekî wî serê xwe li ber bîranîna wî ditewînim. Ezê gotina wî ya bi rengê **“Xwezî gêncan bizaniya û kalan bikariya.”** Tim di bîr û hişên xwe de bigrin û tucaran ji bîr nekim.

**Samî Berbang**

**PEYV:**

- **Vegotin:** amîna ziman
- **Sobjektîv:** nerînî
- **Mîmar:** endezyar
- **Surşt:** xweza
- **Gêwl:** bê mûral
- **Pûç:** vala ,kêr nehatî
- **Konsloxane:** sefaretxane

**PIRS**

**1.** Rola mamê Feqî ya di wêjeya Kurdî de lêkolîn bikin.
**2.** Gelo cûdabûna di navbera reweşenbîrekî serbixwe û reweşenbîrekî girêdayî rêkxistinekê Kurdî çiye? Binirxînin.
**3.** Nivîskar girîngî daye kîjan aliyê mamê Feqî?
**4.** Li gorî mamê Feqî rûmeta gelê Kurd di çi de ye**?**

**3- BIJARTINA GOTINÊN BÊJER JI ALIYÊ GUHDARAN VE**

We mijarek ya Samî Berbang di derbarê Feqî hûsên Sagnic de xwend. Li gor mijarê Samî Berbang pir bi Feqî bawere, derbarê wêjevanî û welatparêziya wî de bê guman taxivi. Ji vê tê zanîn girêdanek mezin ya nivîskar bi Feqî hûsên Sagnic ve heye.

Bê guman carna em bi axaftina me guhdarkirî bandor dibîn, dema kû em axaftinekî dibîhîsîn, em ne neçarin kû tevlî gotin û hizirê wî bibîn. Dibi kû em wateyek li hember nêrînên axaftvan bidini, ji ber wê dema em guhdarî axaftinekî dikîn, pêwîste em baldar bin û hizira bingehîn û ya arîkar bi awayek bend binvîsin.

Dibi kû di nava yê me guhdarkirî de, yê zanîna me zêde bike, di hêla çandî de sûdê didi me, darezîn û gotinên taybet hebin. Pêwîste em van ji gotinên vale cûda bikin.

Ji yê me guhdarkirî, hilbijartinên me yên rast bi demê re di pêşxistina me de wê alîkarbin.

Gelek guhdarvan seresere guhdar dikin, ji ber vê çendê piranî amadekariya axaftvan nagihin armanca xwe. Gotina:“Zana jibîr diki, pênûs jibîr naki” vale nehatiye gotin. Em ji mijarê agehdariyê bigrin û ji hinek din re ragihînin. Pêwîste di demê axaftinê de têbîniyan

bigrin. Dema em guhdarî axaftinekê dikîn, hilbijartinê dikîn, bi kinahî em bibîn peyrewê van distûran.

**A**. Em neçarin bi beriya axaftinê mijara axaftina fêrbibin û di derbarê mijarê de agehiyan bigrîn .

**B**. Em neçarin axaftvan nasbikin, di derbarê armanca wî de agehiyan kombikîn

**C**. Axaftinê bi baldarî guhdar bikîn, dema guhdar dikîn, ji hizira bingehîn û ya alîkar têbîniyên pêwîst bigrîn.

**Ç**.Gotinên bi bandor yê axaftvan û mînakên pir bi balkêş yê dayî, ger bi heman awayî dê sûd têde hebi. Nêrîna ji derveyî vê dimîni û hizirên wî divê em bi awayê têbînî bigrîn.

**4-DI DEMÊ GUHDARKIRINÊ DE HILBIJARTIYÊN ME GIRTÎ BI AWAYEKÎ DEVOKÎ Û NIVÎSKÎ BI KARBÎNIN**

Em ji konferans, axaftin, panêl, rûniştina vekirî û sempozyo mê û ji têgihandina mamosta, heval û yên nêzî xwe bandor dibin. Guhdarkirina me, di me de şarezayiyê pêktîne .Ger em guhdarek baş bîn, bi demê re tiştê me guhdarî kirî, emê di jiyana xwe ya rojane de pêkbînin. Ji bo em bibin guhdarek baş, pêwîste em li gor distûran tevbigerin. Di mijarên derbazbûyî de em fêrî van distûran bûyîn.

Di jiyana rojane de tiştên tên axaftin, bi awayê giştî em dişopînin. Ji bo zanîn girtinê emê guhdar bikîn. Ev ne awayek ya guhdarkirina bi armancek diyare, ji encama guhdarkirinê bi vî awayî zanîna me bi dest xistî, ji destpêkê ve em nehizirîne kû van zanînan di nava axaftinekî nivîskî yan jî devokî bikarbînin. Di demê guhdarkirinê de dibi kû em gotinên di derbarê têkiliyên mirov, civak, kes û tiştên kû pêşeroja me bandor biki bibihîsin. Guhdarvanek baş vana têbînî diki. Di axaftinên bi vî awayî de, ger bê xwestin peyvên kû axaftvan pir sepandî weke heyî bigri; lê belê pirbûna nivîsînê, me ji taybetiyê dûrtêxi. Ji ber vê çendê; dema em guhdar dikîn, dema em ji bêjer bijarkan digirîn, hewlbidin van bi peyvên xwe binvîsin. Ger bi vî awayî tiştê em guhdar dikin bi pejirînin, em dikarîn li ser zanebûna xwe zanînê zêde bikin; li milê din dema em tiştên me ji kesekî din girtî di gotin û nivîsînê de bikartînin, pêwiste çavkaniya wê diyarbikîn.

Nivîskar û helbestvanên kû em berhemên wan bi dilxweşî dixwînin, dibînin kû bi tiştê xwendî û guhdarkirî hêza wan ya

têgihandinê xurt bûye û zanebûna wan zêde bûye. Serok APO yek ji vanaye. Rexnekerê baş û xwedî mejiyekî pêşketiye. Ji têgihandina wî ya zêde, hîn zêdetir hostayiya wî ya gotin û wêjeyê heye. Heya gelek gotin û nivîsînên wî mirovên pêşketî di nava nivîsandinên xwe de bikaraniye.

Hûn jî bixebitin tîştê me ji bêjer bijartî, di nava axaftin û nivîsandina xwe de bikarbînin. Jibîr nekin kû xwendevanê baş weke mêşa hingiviye. Mêşa hingivî toza ji kulîlkên cor becor girtî, piştî kû bi hin avên di mîda xwe de tevlîhev diki re, berdidi ser şanê. Ev tevlihevî piştî demekê dibi hingivîn, hûn ji zanînên we ji çavkiniyên cor becor girtî bi gotinên xwe yên taybet ji hinek din re ragihînin. Piştî demekê hûnê bi gotina çiqas xweş daxivi, çiqas xweş dinivîsi re rû birû dimîne wê demê hûnê gotinên di derbarê serok APO de bînin bîraxwe .

**1.** Kurtiya axaftinek we guhdarî kirî binvîsin.
**2**. Milê vê axaftinê yên erênî û nerînî bînin ziman.
**3.** Li gorî vê axaftinê hûn jî axaftinekê amade bikin.

**Mînak:**

Agehî girtina ji aliyê kes ve; vedigere asta baldarbûn û guhdarkirina wî ji mijar û babetan re; di heman demê pêwistiya axaftvan jî bi guhdarkirina guhdarên xwe re heye ,bi taybet di dema tevlîbûna wan ji pirs, bersiv û guftûgoyan re. Guhdarkirin nayê wateya tenê bihîstinê; dibi kû kes gelek dengan bibihîsi, lê tênegihîjê û neyê bîra wî, ji ber kû guhdar nekiriye.

-Em jî vê mijara jêrîn ya wêjeyî bi baldarî bixwînin û mijarek weke wê bafirînin.

## MIN SEYÎDXAN ÇAWA NASKIR

Dawiya meha Gulan'ê, sala 1926'an ez gihabûm zindana Amad'ê . Hingê ew zindan ji şêxan, began, axan û bi mêrxazan dagirtîbû. Her roj girtî bir bir dibirin mehkema îstîqlalê. Mehkema tu kesî pitirî dû rojan dom nedikir. Girtiyên biçûna mehkemê yan bi dar ve dibûn yan jî hikim didanê. Kêm caran bê guneh berdidan. Dema girtî ji

mehkemê vedigeriyan, zindanî diçûn hemberî dergeh da bizanin kî dar ve dibi û kî hikim danê. Wê ez jî tevlî kesên kû li hember dergehê zindanê çavnêriya hatina xelkê mehkeme dikirin rawestayîbûm. Li pêşiya kesên ji mehkemê vedigeriyan xortekî dirêj û rûgeş derbazî hundirbû. Yekî ji çavdêran jê pirsî: “Seyîdxan ! Çend sal hikim dane te ?” Wî bi tinaz ve lê vegerand û got: “Bi gora bavê wan, min yazdeh ji wan kuştin. Wan deh sal dane min, peyakî wan belaş çû.”

Wilo min Seyîdxan dît, careke din min keyis nedît kû wî bibînim. Kesê hikim didanê zûka dişandin zindanên Tirkan heya ji bo girtiyên nû cih di zindanê de hebi. Piştî em dû salan di zindanên Tirkan de man û bi qanûna efuyê vegeriyan welatê xwe, çawa berê Seyîdxan ketiya tekoşinê nizanim? Lê gava berê xwe daye Sûryê, ez hingê li Hesek’ê bûm. Pirtirî her kesî li gel hevalê wî bendewar bûm. Bûyerên wê şevê baş tên bîra min. Wê gavê çawa ji min re hatiye gotin welê dinvîsim. Divê ev leheng her wekî hêja bû, di dîroka gelê Kurd de xwedî cih bi.

## TEST II

**1. Kesê axaftinekê guhdar diki, dinrxîne, ji van vebijarkên jêrîn kîjanî naki?**

**a.** Dixebiti kû axaftvanî nasbiki.
**b.** Ji pêşdarezandinê dûr, bi nêzîkatiyekî bê alî guhdar diki.
**c.** Ji bo axaftvan rexne biki, axaftinekî dirêj ya hember amade diki.
**ç.** Bi nêzîkatiyekî rexneker axaftinê heya dawî guhdar diki.
**d.** Di derbarê mijara axaftinê de ji destpêkê ve, agehdarî komkirin.

**2. Kîjan distûr ne yek ji wan distûrê di demê rexnekirina guhdarvan de tê bikaranîne?**

**a.** Pêwîste yê hember xwe nasbiki û wek heyî binirxînin.
**b.** Divê di destpêkê de em bipejirînin di her axaftinek ya kesê li hemberî me milekî wî yê bê rexnekirin heye.
**c.** Divê em bizanin rexnekirina kesê guhdar tê wateya rûmet dayîna wî.
**ç.** Ne axaftvan, divê em bihizirin milê mijarê yê rast û çewt heye.
**d.** Li gel aliyê erênî yê guhdarvan ,pêwîste aliyên wî yên nerênî jî deynin holê,li gor pîvanê rêzdariya yê pêre tê axaftin rexne bikin.

**3. Ji yên jêrîn kîjan ne distûra di derbarê hilbijartiyê ji guhdaran re ye?**

**a.** Wek heyî têbînîkirina hemû peyvên axaftvan.
**b.** Têbîniyê di demê axaftinê de, me girtî bi hevokên xwe re binvîsîn.
**c.** Dema em guhdarî axaftvan dikîn, bixebitîn, da hizira bingehîn û ya arîkar peyda bikîn.
**ç.** Bi derxistina plana axaftinê re, agehdariyek kurt ya axaftvan didi nasîn tê perwankirin.
**d.** Di derbarê axaftvan de agehî girtin.

**4.** Kîjan, **ji vebijêrkên jêrîn ji hibijartiyên ji axaftinê hatî girtin , di nava yê bi sûd de cih nagri?**

**a.** Agehdariyên nû tên girtin.
**b.** Vegotinên nivîskî û devokî tên pêşxistin.
**c.** Pêşdîtinek nû tê bi destxistin.
**ç.** Hestê baweriya kesî tê pêşxistin.
**d.** Di derbarê distûrên nivîsînê de kêrhatin tê zêde kirin.

**5. Bikaranîna bijartiyên di demê guhdarkirinê de hatî girtin, di gotin û nivîsînê de ji kesî re kîjan reftarî nadi qezenç kirin.**

**a.** Hêza vegotinê pêşdikevi.
**b.** Hestên bi xwe bawerbûnê zêde dibin .
**c.** Hest û hizirîn pêşdikevi.
**ç.** Derdikevi holê kû ji yê din bilindtire.
**d.** Zanîn û şarezayî zêde dibi

## BEŞA III
## AXAFTIN

1.Wateyên zarava û devokê
2.Zimanê nivîsînê (Zimanê çandê) çiye?
3.Hêza hevgirtinê ya zimanê nîvîsînê (Zimanê çandê)
4.Cih û girîngiya ziman di nivîsîna hûner, wêje û xebatên zanistî de (çand)
5. Bi zimanê nîvîsînê ( Zimanê çandê) axaftina bi amadekarî û bê amadekarî têkirin.
a . Axaftinên rojane yên di mijarên cor becor de.
b. Axaftinên hizrî yên kû di pileya yekem de civakê têkildar dikin.
c. Xebatên dramatizasyonê
ç. Xwendin û jiberkirina helbestan

## 1-Wateyên Zarava û Devokê:

**XEBATÊN AMADEKARÎ**

1. **Cûdabûna zaravayan bandorê li ser berhemên wêjeyî diki yan ne? Cure bikin.**
2. **Li derdora we kesên ji herêmên cûda yên welat hatî hene, cûdabûna di navbera peyvên xwe û yên wan hevalên xwe de bidin diyarkirin. Minakên balkêş yên we**

## DI KURDIYA WÊJEYÎ DE EM GIHIŞTINE KU DERÊ

Ji herêmê ber bi giştî ve, em dibînîın kû gelek nivîskarên mezin û bihadar, dema axaftinekê dikin di nava axaftinên xwe de peyvên herêma lêhatî dinê bikartînin. Ev dibi sedem kû di axaftinên wan de aliyê ne wêjeyî derkevin holê. ji bo kû em nekevin vê rewşê, neçarîn ji devokiya herêmî birevin.

Kurdiya wêjeyî ya kû li tevayî Kurd'an xweş tê, pêwiste bibi armanca me. Ger kesekî nexwenda yan gundî, ji şûna mal "ve" ji şûna axaftin "ştexilandin" ji şûna çi dikî "kudikî" bikarbîni asayî tê dîtin. Lêbelê ger rojnemevanek, spîkerek, wêjevanek van peyvan bikarbîni, cihê hizrîn û rexnekirinêye.

**PIRS:**

**1.** Li gorî nivîskar kesên rewşenbîr pêwiste çawebin?
**2.** Nêrîna nivîskar di derbarê gundiyekê de çiye?
**3.** Ji bo kû em xwe ji axaftina herêmî rizgar bikîn pêwiste çibikîn?

**1.ZARAVA:**

Îro Kurdiya me li gelek parzemîna belavbûye. Ji derveyî Kurdistan'ê Kurdî li Turkiye, Surî, Îran û İraq'ê, li hinek dewletên Sovyeta berê (Ermenistan, Azerbeycan, Kirgizistan, Kazakîstan) peyda dibin. Dîsa li hinek dewletên Awrupa yên weke: (Almanya, Fransa, İtalya, Îngiltere, Îsweç, Awusturalya) hene. Li milê din

Kurdî, li dewletên mîna(Amerîka, Çîn, Pakîstan, Avganîstan, Lûbnan û Hindistan'ê ) jî tê dîtin.

Zimanek li gor xaknîgariyên cor becor dibi bê guhartin. Ev bi pelgeyan bê diyarkirin. Ji wan cûdahiyên ziman yên bandorê li nivîsînê dikin re zarava têgotin.

**ZARAVEYÊN KURDÎ:**

**Zaravayên Kurdî :**

| Kurmanciya jorîn | Zazakî (dûmilî) | Kurmanciya jêrîn | Lorî |
|---|---|---|---|
| *Pismam* | *Ded-dedza* | *Amûza* | *Tata-dad* |
| *Tû têhn bûyî* | *Teyşanbî* | *To tênî bûyî* | *Toşan-tuşanambî* |
| *Ji bo çi hat* | *Seva çi oma* | *Leber çî hat* | *Sîçi omay hati* |
| *Pariyek nan bine.* | *Loqme nun biyarê* | *Parûwe nanêk bêne* | *Loqmenun yarê* |
| *cih* | *ca* | *Cêga- şiwên* | *ca* |
| *Bîne* | *bîyarê* | *bihêne* | *biyarê* |
| *Wê derê* | *uca* | *Le wê* | *Ucî* |
| *Nanê min heye* | *Nanê min esto* | *Nanî min heye* | *Min nanim dîrem* |
| *ziman* | *Ziwan* | *ziman* | *zevon* |
| *Nalkirin* | *nalkerden* | *nalkirdin* | *Nalkerdin-kirdinvir* |
| *Ya me nîne* | *Ma ênîme* | *Hî ê me nîye* | *Îma tîyeyîm* |

## DEVOKÎ

Li gor awayê axaftin, bihîstin û tevgerên cûda herêmên jiyanê, seqem û mercên borandina aborî, model, hewaskarî, (ozentî) dibin sedem kû di nava kesên bi yek zimanî daxivin de cûdabûn derkevi holê. Nimûne ciwanên îro devokiyek ji ya bapîrê xwe cûda bikartînin. Zimanê di herêman de tê axaftin li gorî cih, bajar, navçe heya gund peyvên wan, sazûmaniya hevokên wan cûda tên dîtin, ji vê cûdabûna bandorê li nivîsînê naki re devokî tên gotin. Nimûne devoka Rûha'yê, Amed, Botan, Serhed, Dêrsim, Koban, Efrîn, Cizîra binxetê, Behdînan, Hewlêr, Silêmanî, Sine, Kermanşah û Mihabadê ...

Gelek ji van devokan di axaftinê de bi Kurdiya wêjeyî re li hev nakin. Nimûne "îro baran dibari" li hinek herêman "îrhe baran dibari" li hinek herêman jî "emro baran dibarê" dîsa li hinek herêma "evro baran dibari" tê bikaranîn. Pergalên çapemeniyê yên weke (Tv, rojname, kovar, pirtûk) û xwendevanî bi awayekî giştî cûdabûna devokan kêm dikin, wekî îro Kurdiya RojTV weke Kurdiya  rast tê pejirandin. Ev Kurdî piranî rojnamevan nivîskî weke çavkanî dibînin.

**Kurdî xweşe zimanê min,**
**Ji bilî te nevê kes min.**
**Şev û rojê bi te dijîm,**
**Tûyî meqsûd û vîna min.**

Kesên baş perwede dîtî, zimanê wan yê axaftinê xweşe. Perweda baş bes di jiyê biçûk de ji malbat yan ji dibistanê dibi bigri, wek fêrbûnek xirab di jiyê mezin de sererastkirina ziman zehmete.

Di roja me ya îro de taybetmendiya herî lê tê gerandin axaftina rast û xweşe. Ji ber wê kors tên vekirin û gelek mirov ji bo şaşiyên xwe yên axaftinê rakin, tevlî van korsan dibin û di van korsan de perwedê dibînin.


Di serî de rêveber û mirovên kar, kesê dixwazin di karê xwe de serkeftî bin; dikin armanc kû zimanê xwe baş bikarbînin. Di axaftin û nivîsînê de hewldidi kû zimanê wî bigihi pileyek bijartî, di vê riyê de hewldana zêde dikin. Ji bo bi bandor, xweş, rast û durist baxivin,

divê bibin guhdarek baş; dibi kû heroj, di temaşekirina televizyonê de, di guhdarkirina radyoyê de, Kurdiya wêjeyî bê bihîstin. Guhdarek baldar kêmasiyên xwe yê peyvan dikari ji holê raki, di nava vê xebatê de li şûna peyvên rast bên bi cihkirin, li cihekî bê nivîsîn. Li hember neynikê, ev peyv bi dengek bilind bên xwendin.

Cûdabûna devokî bi gotinên di demên pir biçûk de ji axaftinên dê ,bav û mirovan girtî derdikevi holê, ji ber vê dema ew kesê ne weke me baxivin gunehbar bibînin, nêrînek pir şaşe.Tevgerên bi vî awayî, di têkiliyên me de rêzdariya beramber têxin metirsiyê û li hev xweş nêrînê ji holê radikin. Em nikarin tu kesî ji ber weke zimanê çandê naxivi şermezar bikin; lê kesê di vê mijarê de xizim yan heval pêwîste em arîkariyê jêre bikin.

**RAHÊNAN:**

Peyvên we ji dibistanê girtî temaşe bikin çawa cûda têne bikaranîn. Li gor şopandina xwe li ser vê rewşê nivîsînekî binvîsin û di refê de bixwînin.


Russia
Caspian Sea
Black Sea
Batumi
Georgia
T'BILISI
Samsun
Armenia
Azerbaijan
BAKU
Kars
YEREVAN
Erzurum
Sivas
Euphrates
Erzincan
Turkey
Caspian Sea
Kayseri
Elazig
Mus
Lake Van
Van
Qezel Deshlag
Khvoy
Malatya
Tabriz
Ardebil
Diyarbakir
Batman
Kurdish-inhabited area
Urmia
Kahramanmaras
Orumiyeh
Lake Urmia
Rasht
Gaziantep
Sanliurfa
Adana
Sirsenk
Marayqah South
Tall Kaye
Mahabad
Khaneh
Zanjan
Iskenderun
Aleppo
Al Hasakah
Mosul
Bashiqah
Bashur
Iran
Irbil
As Sulaymaniyah West
As Sulaymaniyah
Mediterranean Sea
K1
Sanandaj
Karkuk
Hamah
Syria
Dayr az Zawr
Euphrates
Tuz Khurmatu
Hamadan
Hims
Tigris
Tripoli
Bakhtaran
Lebanon
Al Qa'im
150 Kilometers
150 Miles
BEIRUT
Shahabad Highway Strip
Borujerd
Akāshāt
Iraq
DAMASCUS
BAGHDAD
Khorramabad
Israel
Al Taqaddum
Area of block diagram
Karbala
Al Hillah
Dezful
Irbid

2. **Zimanê nivîsînê(zimanê çandê) çiye?**
3. **Hêza hevgirtina zimanên nivîsînê(zimanên çandê)**
4. **Girîngî û cihê nivsîna(çand) ziman di pîşe, wêje û xebatên zanistî de**

**XEBATÊN AMADEKARÎ**

**1.”Zimanê mirov mergê mirove, zimanê biyaniyan bergê mirove.”Vê darezandinê şîrove bikin.**

**2. Li gorî we hêza mirovê hev neďîtî, hev nenaskirî, xwediyê heman hest, hizir, guman, heskirin, xemgînî yan jî hêza bawera kû wan li derdora xwe kom diki çiye?**

**3.Dema tê gotin zimanê çîrokê, zimanê romanê, zimanê helbestê, tu çi têdighî?Bi kurtî vekin.**

## ZIMAN

Zimanê hevpar girêdayî çand şaristaniya hevpare .Çand û şaristaniya derdor ya di nav de jiyan dikin ,endanê peyvên di zimankî de tên bikaranîn destnîşan dikin.Ji ber vê wek çanda kes , çanda koma û pîvanê şaristaniyê jî tên bikaranîn.Asta şaristaniya civakekî bi têgihîştina peyvan,ji çawaniya peyvan û hêjmara wan tê têgihîştin, lewra ziman eynika jiyanê ye.

Rola ziman di jiyana mirovan de ,zanînan ji yekî din re radigihîne,bi vî awayî digihin lihevhatinekê dewlet serê ziman mal

dibê mal,bi peyv û zanînê ji dibistan û kolanê girtî ,çanda malê derbaz dikê dikevê nava çandekî civakî.

Bi saya ziman bi sed sala zanînên xwe ji nifşekî derbazî nifşekî din dike,zimanê axaftinê ,bi gotinê xwe yê mezinan,mînandin,xaze...Gencîna çandî ya devokî ye. Jiber vê sedemê kesê kû nivîsandinê nezanin jî lê di hundirê xwe de ,çanda zimanê axaftinê girtî dighin pileyekê,gelê kurdê kû nivîsandinê nizanin jî ,ger dikarin li ser tiştekî axaftinekê bikin ji ber dewlemendiya divokiya zimanê kurdiye.

Lêbelê zimanê nivîsînê û pirtûkên girêdayî wê ji çanda devokî dewlemendtir û bi bawertire .Bi qasî zanînê kesekî pirtûk xwendî ,axaftina wî jî bi awayekî din çêdibe. Yê pirtûkê dixwînin ji pitûkê ji jiyanê re gelek peyv digrin ,welatek çandek wan ya pirtûkan dewlemend be axaftinê wan yê rojane jî dewlemendin ,kesê zana weke gundiyekî naxive û na hizire ,ziman û mejiyê wî li gor pirtûkên xwendî awa gitî,di vê çarçûveyê de kesê bes xwediyê çanda devokî di navbera wan û yê xwediyê çanda pirtûka de di axaftin û jiyanê de jî xwe diyar dike.

Li gor her peyvek di aliyê rewanî û heyberî ,naskirî yan sade û diyar de xwedî wateyekê ye,ger em bêjin kesê pir peyvan bizanibe pir tiştan zanê ne şaşe,kesê pir tiştan bizanibê di jiyana mirovan de digihê pileya jor ,lêbelê bes peyv zanîn ne bese. Ya girîng ewe kû girêdana di navbera peyv û wateyê de têbigihînin,wek nimûne ger kesek ji zimanekê gelek peyvan jiber bikê ji wî zimanî navê gelek tiştan fêr dibe lê nikarê bibê xwediyê çandek ya wî zimanî.

**PIRS:**

1. Li gor nivîskar erkê ziman di jiyana mirovan de çi ye?
2. Kesê xwedin û nivîsandinê nizanibe çawa dikare bighe pileyekî?
3. Taybetmendiya zimanê nivîsînê ji zimanê axaftinê cûda dike çi ye?
4. Li gor nivîskar çima zanyarek wek gundiyekî naxive?
5. Girêdan di navbera wate û peyvê de bidin diyarkirin?
6. Li gor nivîskar kengî mirov dikarê bibe mirovekî çandar?

## 2. ZIMANÊ NIVÎSÎNÊ (ZIMANÊ ÇANDÊ) ÇIYE?

Zimanek li gor awayî zimanê axaftinê yan jî zimanê nivîsînê tê bikaranîn.

Zimanê axaftinê ji bo têgihandinê bes sazûmaniya deng tê bikaranîn. zimanê nivîsînê jî xwe dipesêrê hêmayên kû em jêre dibêjin tîp.

Zimanê axaftinê jî zimanê nivîsînê jî endamek yê çanda gelekêne. Ev her dû endam; çandê ji nifşekî dikêşînin nifşekî din, lê belê zimanê nivîsînê, li gor zimanê axaftinê, hîn bêhtir mayînde û sazûmaniyekî hîn dagirtîtire.

Li milê din heya zimanê axaftinê derbazî nivîsînê nebi pêşketinê (derbaskirin) çênaki, lê zimanê nivîsînê zimanê dûhî yê îro û yê dahatoyêye.

Zimanê nivîsînê di wateya zimanê çandê de jî tê bikaranîn ,di heman demê de zimanê nivîsînê zimanê wêjeyiye, zimanê fermî jî tê binavkirin.

Zimanê nivîsînê neçare ji rêziman, rastnivîs û distûrên girêdayî hêmadanîn, xweşikbûna ziman, çanda giştî û çêkirina xebata zanîna zanistî re destdayîbi. Di zimanê Kurdî de jî zimanê wêjeyî bingeh tê girtin.

### 3. HÊZA HEVGIRTINA ZIMANÊ NIVÎSÎNÊ (ZIMANÊ ÇANDÊ )

Nirxên neteweyekî, yên ji kesan û civak, ji civakan, gelan, dafirînin hene. Di serî de bes agahdariyên di derbarê me de, heskirin, xem, tiştê di derbarê pêşerojê de nirxên weke hatî, girêdayî jiyanê bi hev re jiyanbûna wan di mercê tê xwestin de, bi demê re dibin nirxê civakê, ji vî nirxê hevpar re em dibêjin nirxê çandê.

Naskirina rûmetên xwe yên çandî, parastina wan û ji nifşekî kişandina wan ya nifşekî, nîşanek mezin ya netewbûnêye. Lê belê zimanê axaftinê, hejmarekî zêde mirov di çarçova vê rûmetê de digihin hevdu. Zimanê nivîsînê (zimanê çandê) jî nirxên me yên çandî ji mirov berbi mirov, ji çaxekî berbi çaxekî ve, ji zihniyetekî berbi zihniyetekî ve dikişîni, zimanê mayînde û hevgirtinêye. Ji saya serê nivîsînê, bûyer û rewşa, ji wan berhemên ji demê borî gihayîn roja me ya îro fêr dibîn.

Gelo ger zimanê nivîsînê neba, derfetên me yên kû em destana Ehmed'ê Xanî, dîwana Melayê Cizîrî, efsaneyên Feqê Teyran,

helbestên Eliyê Herîrî, derbû meseleyên Mûsa Enter bixwînîn, diket destê me?

Zimanê nivîsînê çanda me ya hevpar, zimanê me, dabûnerît (ûrf û adet) nîştimanperweriya me, gihandiye roja me ya îro.

Bi saya zimanê nivîsînê em nebes dilxweşiyên xwe yên borî fêr dibin, nirxê wê civaka em têde jiyan dikin têdigihîn, ji ketinên wan, şerên wan, serhidanên wan dersê dertêxîn. Li gorî vê zanînên xwe yê derbarê civakê de pêştêxin û ji bo demê pêş xwe amade dikin.

Zimanê nivîsînê girêdayî distûrane, ziman bi saya serê van distûran tê parastin û li hember bandorên ji derve bi hezarên salan weke pergalekî ya hevhatinê, rast bi tenduristî dimîni. Ger ev distûr neyên bikaranîn, her kes li gor zimanê herêma xwe binvîsi, zimanê çandê xiradibi û taybetmendiya ziman ya hevgirtinê winda dibi .

## 4.CIH Û GIRÎNGIYA ZIMAN Û NIVÎSÎNÊ DI PÎŞE,WÊJE Û XEBATÊN ZANISTÎ DE

Me dabû diyarkirin, ziman, çand û şaristaniyan ji nifşekî derbazî nifşekî dikin. Bermayiyê civakekî yên weke çand,wêne,peyker, mîmarî yên ku ji derveyî ziman dimînin jî dikşînê. Lêbelê van bermayiya weke pergalek ya pêkanîn û şandinê bikarnayînê .Jib ber vê sedemê nakevin şûna zimanê nivîsînê,nirxên çandî bi awayê herî baş ziman ji nifşekî derbazî nifşekî dikê.Tevahî nivîsînên wêjeyî bi saya zimanê nivîsînê dikeve destê gelek mirovan, bi demê re ji nifşan derbazî nifşan dibin. Îro pirtûkên çîrokên kevin û helbestan bi saya zimanê nivîsînê peyda dikin û bi saya ziman mane roja me ,dîsa bi saya zimanê nivîsînê pirtûkên me yên niha dê bimînin demê bi.

Çawa em malika helbesta Hezîn Kurdî ya kû dibêji:**“Heyfe mêr bimrê nebînê/ Sed birîn şer û ceng.”**Jiyan diki. Wilo berhemên me yên wêjeyî bi saya ziman dê tevlî karwanên nemiran bibin.

Di gel çand û pîşe zanîn û teknolojî jî bi zimanê nivîsînê pêşketinên ku mirovan şaş dikê nîşanî mirovan dikê,bi sayabelgeyên zanistî di sedsala bîstan de sê demên dîrokê hatine jiyankirin,îro weke em di nav de demê zanînê bi kişandina zimanê nivîsînê mûhra xwe li sedsala me daye.

Demê zanîn dikeve nivîsînê zêde dibe,her ku zêde dibe nûbûn tê dîtin.

Hûnera ziman, zanîn û teknoljî, hizirê mirov yên herî bi bandor û rêzdrarin. Ka çawa nivîsîn ji dema borî gihandine roja me ya îro, ya zanîsta îro jî bikişini dema bê.

**RAHÊNAN**

**1.** Axaftinekî kurt ya kû têde taybetmendiyê zimanê nivîsînê û zimanê axaftinê ji hevdû cûda diki heyî binvîsin.
**2.** Nivîsînekî kû rûmetê, zimanê nivîsînê di aliyê netew, bi hev re bûn û hebûnê didi diyarkirin amadebikin.
**3.**Bi mamostayekî di dibistana we de mamostayiya zimanê Kurdî û wêjeyê diki re, ji bo curekirina ziman di aliyê zaniest û pîşesaziyê de hevdîtinekî çêbikin. Li ser bersiv dayîna demê hevdîtinê nivîsandinekî binvîsin, bi riya rojnameya dîwar ya refê û rojnameya dibistanê nêrîna xwe ji hevalê xwe re ragihînin.

## GIRÎNGIYA PERWERDÊ

Di avakirina civak û netewan de rolek girîng û diyar ya perwerdê heye. Asta pêşketina her civakekê, di aliyên zanistî û beşên din de bi perwerdekirina wê ve girêdayiye.

Di Rojhilata navîn de her çiqas civak hatibi vekolînkirin jî lê li hember pirsgirêkên civak û kesayetê nebûye çareserî. Bi taybet di asta xwe naskirin û analîzikirina kesayet û civaka Kurd de lewaziyên jidil jiyan dikin.

Birêz Ebdulah Ocelan di lêkolîn û nirixandinên xwe de cihekî berfireh daye kesayet û civaka Kurd, Rojhilata Navîn pir baş vekolîn kiriye. Lêkolînên seretayî li ser kesayeta Kurd di malbat û sîstema kû têde hatiye perwerdekirin de, girtiye dest û analîz kiriye. Sîstem û desthilatdariyên paşverû yên kû Kurdistan dagirkirine, her yekî perwerdeyeke li gor xwe dane û kesayetek li gor xwe avakirine. Şopên binpêkirin û bişaftinê diyarbûn.

Dema mirov analîz û nirxandinên birêz Ocelan dixwîni, dibîni kû ewê dikari hêz bidi wê jina jara belengaz, zilamê bê çare, her wiha asta tevgera wî ya kû bandor li her çar parçeyên Kurdistan'ê kirî û yekîtiyek avakirî, bi hêsanî dibîni kû, ka asta perwedeya wî û nirxdayîna wî ya ji bo mirovan çawaye?

Bê gûman birêz Ocelan karî enerjiya di hundir ciwanan de biteqîni, hemû beşên civakê bi berpirsyariyên wan bidi pêhesîn, wan tevlî kar biki. Ev yek bi perwerdeyek tendurist pêkhatiye.

Birêz Ocelan di bîranînek xwe de wiha dibêje: "Rojekê li gund li ber siha zinarekê rastî kalemêrekî hatim, ez bi kalo re axivîm-axivîm li dawiyê kalo ji min re got "kurê min, tû vê dara hişka di zinarê de dibînî?" Min got belê. Kalo got : "Em weke vê dara hişkin." Ma gengaze kû careke din bigiyan bibi. Dîsa birêz Ocelan di axaftinekê de bi bîrtini û dibêji: Em bûn gulek di tehtê de şînbûyî.

Mirov dikari vê, encamê jê derxîni. Mirovê bê perwerde weke darek hişk, bê berheme. Her wiha bedewî û xweşikbûn jî bi perwerdê pêktê.Weke li jor jî me destnîşan kirî. Gel bi tevlîbûn û girêdana xwe, hîvî û bendewariyên xwe di rêberê rûmetê de dibîne.

**Munzur**

**PEYV:**

- **Diyar:**eşker
- **Vekolînkirin:**li ser mijaran hûrkolin
- **Analîz:**girtina hinek pirsgirêkan şîrovekirina wan
- **Paşverû:**zihniyeta desthilat
- **Rade:**pile
- **Jar:**perîşan
- **Enerjî:**hêz
- **Destnîşan:**dabû diyarkirin
- **Hîvî:**umûd
- **Bendewarî:**li benda tiştekî mayîn

**PIRS:**

**1.** Li gor we birêz Ocelan pirsgirêkên kesayet û civakê di kîjan xalan de analîz diki û dibi çareseriyê?
**2.** Asta bişaftinê, li ser civaka Kurd çiye?Vekin.
**3.** Li gor we derketina birêz Ocelan, çi guherîn û veguherînan di civaka Kurd de da çêkirin? Ger ew derneketibûya, rewşa gelê Kurd wê çawa ba? bidin beramberkirin.
**4.** Dara hişka di zinarê de çawa karî bibi gulek şîn bigiyan? Vekin.

**5.Bi zimanê nivîsînê axaftinên bê amadekarî û bi amadekarî**

**a. Di mijarên cor becor de axaftinên rojane.**
**b.Axaftinên hizirî yên kû têde mijarên di pileya yekem de civakê têkildar dikin.**
**c. Xebatên dramatizasyonê .**
**ç.Xwendin û jiberkirina helbestan.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1. **Di dibistana me de xebatên fêrkerên çêbûyîn hene, di demê wan xebatan de xebatên we kirî, di nava xebatekî yê we kirî de axaftinek we kirî bînin bîra xwe. Axaftina we di kîjan Milan de bi bandor û di kîjan milan de lewazbû.**
2. **Li ser şehîdên 18 gulanê axaftinekî kurt amade bikin. Axaftinekî hevalekî we amadekirî yan we ji Radyo Televizyonê guhdar kirî ,mile wî yê erênî û nerênî bibînin û li tênûsa xwe binvîsin. Di refê de cure bikin.**
3. **Tişta dramatizasyonê bi bandor dihêle çiye?**
4. **Hestên helbestekê lêkolîn bikin. Helbestekî li we xweş hatî peyda bikin aliyê wê yê hûn bandor kirî binvîsin.**
5. **Helbestekî we pir sepandî li tênûsa xwe binivîsin û jiber bikin. Xwe amade bikin da ku hûn di refê de yan li hember kesên xwe bixwînin.**

## 15'ê TEBAX`Ê

**Gelê kurd;**

Eve bîst û sê sale şerê azadiyê tê meşandin ji ber vê hûn vê rojê weke cejnê pîroz dikin.

**Cejna we pîroz bi**

Îro ez jî weke kesekî ji gelê Kurd ji berku gihame vê rojê ,ez xwe di nava dilşadî û xurûşek mezin de dibînim.

**Gelê nîştimanperwer;**

Di pêvajoyekî kin de me

gelek tişt bi destxistin. Ji van tiştan ya herî mezin lehengiya gelê Kurd xwedî derketina li çanda gelê Kurd û afirandina kesayetek azade .

Îro em deyîndarê gelê nîştimanperwer, şervanê azadiyê û bi hevrebûna gelê Kurdin.Lêbelê ev nebese jiber em neçarin karên hîn mezintir, zêdetir di demekî hîn kurtir de bikîn. Pêwîste em welatê xwe bighînin asta welatên herî pêşketî ,gelê xwe bighînin kêfxweşiyekê herî zêde ,bikin xwedî çavkaniyê jiyanê û serfiraziyê.Çanda xwe jî bigînin çanda gelê herî pêşketî .

Jiber vê jibo me dem bipîvane ,weke demê borî pêwîste em sist tev negerin.Neçarin li gor pêwîstiya demê me,yê îro bi zihniyetek pêşketî bilez tev bigerin.

Li gorî berê pêwîste em hîn zêdetir bixebitin, pêwîste em di demek kintir de karên mezintir bi serbixin.Bêguman emê serbikevin. Jiber êdî kesayeta Kurd azade. Gelê Kurd xebatkar bizêhne. Jiber ku gelê Kurd bi hevgirtina xwe zaniye tengasiyan derbasbike, gelê Kurd bi meşa azadiyê, bizanista “Serok APO” di jiyana xwe de guhartinên mezin çêkirine.

Divê ev jî neyê jibîrkirin, gelê Kurd’ê birûmet xwediyê çandekî birûmete. Jiber vê gelê me xwediyê kesayetiyekî bilind, xebatkariyekî bêwestan, hizrê pêşketî, girêdayî zanistê, ji hûnerê xweş hezikirî û nîştimanperweriyê ye.

Jibo avakirina welatekî demokratîk ji her demê zêdetir amadeye. Ev taybetmendiyên he şayanê gelê kurdin.

Ez bawerim gelê kurd karê di derbarê azadî ,serbilindî û keyfxweşiyê de tişta jê bêxwestin, bêguman biki. Guman nine ku gelê Kurd dê di tevahî xebatên xwed de serbikevi.

Beriya bîst û sê sala we ji rêxistina azadiyê gelek gotin dibihîstin , ez pir bextewerim ku tişetekî gel ji baweriyê dûr bêxi yan wan gotinên we bihîstî vala derêxi, çênebûn .

Îro biheman baweriyê ,bi awayekî bêguman ,carekî din dibêjim ,heya yekîtiya gelê Kurd, di hemû aliyan de çêbibê ,gelê Kurd di hemû aliyan de azad bibin û bigihê şaristaniya herî pêşketî ,berxwedana me wê berdewam bike.Di demekî kin de carek din emê mezinahiya gelê Kurd bi cihanê bidin nasîn . Gumanên min nînin niştmanperwerî û demokrasiya gelê Kurd, zanista Serok APO wê bibe roj li azmanê cîhanê bibriqe.

**Gelê Kurd;**

Daxwaza min ewe her sala ku derbaz bibe ,cejna we vî gelê birûmet, dê bi şerefekî hîn mezintir ,bi dilxweşiyekî hîn zêdetir di nava li hevhatin û keyfxweşiyê de bêpîroz kirin .

**Azadî rûmeta jiyanê ye .**

**PEYV:**

- **Niştiman:welat**
- **Pêvajo:qonax**
- **Afrandin:xûluqandin**
- **Deyndar:kesê di bin deynan de**
- **Hevrebûn:tifaq**
- **Neçar:mecbûr**
- **Ast:pile**
- **Zêhn: zeka**

**PIRS:**

**1.** Şerê azadiyê kengê destpêkir?
**2.** Nivîskar ev axaftin (nutuq) kengêkir? Û çi daxwiyanî dan.
Hûn jî li ser rojekî pîroz nivîsînekê binivîsin.
Jibo gelê kurd bigihî asteke bilind ,pêwîstiya wan biçi heye?

**1.BI ZIMANÊ NIVÎSÎNÊ (ZIMANÊ ÇANDÊ) AXAFTINÊN BI AMADEKARÎ Û BÊ AMADERÎ**

Axaftinên bi amadekarî û bê amadekarî beriya niha hûn fêr bibûn.Axaftina ku di refê de mamosta di derbarê mijarekê de ji we bixwazê, axaftinek bê amadekariye.Di civînên hûn tevlî dibin de her axaftin û curekirinê tên kirin yên bê amadekarî dikevin vî curê axaftinan. Li hemberî vê axaftinê di refê de yên berê mijara wan hatî diyarkirin ,axaftin ,konferans,rûniştinên vekirî ,panel ,form, sempozyom ,gotinên piştî hizirê yên weke van corê ragihandina devokî weke axaftinên bi amadekarî tên binavkirin.

**Axaftinanan di çar beşan de lêkolîn bikin.**

**a.** Di mijarên cor becor de axaftinên rojane.
**b.** Axaftinên hizirî yên kû mijarên civakê têkildar diki têde heyî.
**c.** Xebatên dramatîzasyonê
**ç.** Xwendin û jiberkirina helbestê

**A. Di mijarên cor becor de axaftinên rojane.**

Ji bo di nava mirovan de, li hevhatinê çêbiki, bê kû pêwîstî bi amadekariyê bibînin axaftinê dikin. Ev corê axaftinan dikevi beşê axaftinên rojane de.

Di axaftinên rojane de, em dixwazin daxwaz, armanc, hest û hizirê xwe ji yê li hember xwe re ragihînin. Di axaftinên bi vî awayî de li gor distûrên rêzimanê nikarîn bihizirîn.

Axaftinên rojane yên kû em bi hevalê xwe re dikîn, yê serlêdana axaftinên di civîna malbatê de tên kirin demê tû ji yêkî biyanî re rê nîşa dikî, axaftinên di wî demî de tên kirin, dikevin beşê bê amadekarî de. Di axaftinên bi vî awayî de ji ber şarazayiyên borî em amade tên hesibandin. Distûr û planên ji bo axaftinên bi amadekarî tên kirin, ji bo axaftinên rojane nepêwîstin.

Di axaftinên bê amadekarî de mijar berê nayê amadekirin. Di van axaftinan de mijar li gor rewşa pêre rû birû dimîni bixwe derdikevi hole. Em jî vê bi awayekî baş baxivîn.

## DI NAVA CIVAKÊ DE CIHÊ JINA KURD

Di nava civakê de cihê jina kurd bi rûmet û bilind e. " Divê neyê ji bîrkirin li se rûyê vê cîhanê her tişta tê dîtin berhemê jinê ye. Weke rêberê gel kud jî dibêje: Jina kû heya roja îro heyîna gelê kurd parastî,niha jî hêzek mezin yê azadiyê ye,jina kû xwediya vê pliya bilind erkê wan jî evin:

Weke di nava tevaya gelên heyî de,jinên gelê kurd jî parêzvanên gelê kurd in,ger gelê Kurd li hemberî evqas tevkujî,kariye xwe biparêze,xwe bide jiyankirin,di gelek qadan de li hember neyaran serî hildi bi saya jina Kurde ,ji van zêdetir jin afrînera lehenga ye. Yanî lehengê weke Selehdînê Eyyûbî,Xanê Dimbim,Rûstemê Zal,Bedrxan beg,Gêwê Guhderz,Leya Qasim ,Mezlûm Doxan ,Egîd ,Bêrîtan ,Zîlan …"

Jibo gelê Kurd afirandina rêber APO rûmetek mezin ya jinê ye,ji van zêdetir di her qada jiyanê de jin bi zilamê kurd re tevlî jiyanê bûye û her demê role sereke di jiyanê de leyîstiye. Lê dema em vê dibêjin,pêwîste rola kesê jina Kurd pêşxistî zana kirî û kirî pêşenga azadiyê neyê ji bîrkirin.

**M.Şîrîn**

## RAHÊNAN

1. Gotinek ya mezinan li ser jinê peyda bikin û di refê de bixwînin.
2. Li ser mafê jinê axaftinekî binvîsin.

**B.Axaftinên hizirî, yên kû mijarên civakê têkildar diki têde heyî**

Di her civakekî de gelek pirsgirêkên li benda çareseriyê hene, azadiya mirov pirsgirêka li benda çareseriyê ya herî li pêşe. Di dewletên demokartîk de ev pirsgirêk hîn li pêşe.

Ji hezê (erozyon) heya çûnhatinê (trafîk), ji hawîrdor heya teknolojî, ji serxweşbûnê heya rêkûpêkiya malbatê, ji pîşesaziyê heya ramyariyê, ji perwerdê heya aboriyê, di hemû qadan de, em neçarîn hêzê bidîn hizirê û jiyana demokratîk peyda bikin. Bi mejiyê " Min dengek heye, ezê bidim û biborim "Tû nikarî hêzê bidî demokarsiyê. Taybetmendiya civakên pêşketî, di her mijarê de, di demekî kurt de raya giştî pêktînin.

Lê belê dema tû derbarê mijarekî de baxivî, pêwîste di derbarê wê mijarê de xwedî agahdariyê besbî. Ji bo em di mijarekî de bibin xwedî agahdarî, mercê nivîsandinê di derbarê wê mijarê de bixwînin û axaftinên di derbarê wê de guhdar bikîn. Mijarên di derbarê civakê de ,weke her kesî pêwîste xwendevan jî balê bikişînin ser û nivîsîna wê bişopînin. Her xwendevan bê merc neçare nivîsînên pirsgirêkên civakê rave dikin, yên weke mamik, taqîkirin, axaftin, nivîsînên hevpeyvînê, yên di rojnameyan de hatî nivîsîn, bixwînin. Bi taybet kesên nivîsînên aliyê wan yê hizirê li pêş, yên weke mamik taqîkirin û gotaran, bi awayek baş lêkolîn bikin, di pêkanîna axaftinekî aliyê wê yê hizrî li pêş de tengav nabin.

Ji bo em heskirin û rêzdariya civakekê qezenc bikîn, bêhtir di cih deye kû em nêrîn û hizirên xwe kurt û komkirî bînin ziman. Lê belê dema em vê dikin, pêwîste em nêrîn û hizirên xwe di demek beraqil de, bi zimanek ji aliyê her kesî ve bê têgihandin bikîn. Ji bo em di mijarên di pileya yekem de civakê têkildar dikin de bi bandor û xweşik baxivin.Pêwîste em xwe baş nasbikin û li xwe bawebin.

Li gel vê, pêwîste em ji yê li hember xwe re rêzê bigirîn û li gor distûrên ziman tevbigerin.

**C. Xebatên dramatîzasyonê**

**Dramatîzasyon:**Awayek yê têgihandinê ye kû bigiştî, giraniya wê **tevger** bi pîlan tê çêkirin di xebatê de tê bi karanîne.

**Dramatize kirin:** Tê wateyadana axaftina mijar yan jî kesan Piraniya xwe ji leyîstokên tên nivîsandin yên jibo li ser dike bên lehîstandin re **drama** têgotin.

Peyv di xebatên dramatîzasyonê de,ji aliyê zimanê bedenê ve tê destekirin. Bi mijarê re li hevkirî tevgerên dest, mil ,rû, dev, birh û çav hêza têgihandinê xurtir dikin.

Di bingeh de herkes di jiyana rojane de di nava dramatîzasyonekî de ye. Di serê mijarê de axaftinên rojane yên me dayî diyarkirin, ji dervey dramatîzasyonê netiştekin. Lêbelê dramatîzasyona biplan,xebat û têgihandinê zor diki û têgihandina mijarê asayî dikê .Di xebatên bi vî awayî, heya dawî bi bandor de rojên me di dramatîzasyonê de rol leyîstî û di wê rojê de leyîstikên me leyîstî emê tu caran ji bîr nekin .

Agahdariyên di mijara dramatîzasyonê de fêrbûyîn ,dikarin di xwendina helbestê de jî bikarbînin. Bi mercê kû bituxûb, di helbestê de jî dema cihê wê were ,dikarin ji jest û mîmikan sûd bigrin. Lêdan û gîranî, endamên serekî yên dramatîzasyon û helbestêne.

**Ç. Xwendin û jiberkirina helbestê.**

Helbest, nivîsîna bi hestyar û plan ya herî bi hêze.

Helbestên hemasî (dahasî şiîr) “helbestên Kevin yên li ser lehengiyên mezin hatine amadekirin.” Di core nivîsandinên dîn de “We çi da têgihandin” Di helbestê de jî “We çi û çawa da têgihandin” girînge.

Em tev ji zaroktiyê ve helbestê nasdikin.Gelek ji me, ji beriya kû dest bi dibistanê bikin, çend helbest jiberkirine. Helbest nebes; dengê li guhê me xweş tê; dengê hatî dawerivandin, li hevkirî, têrkirin bi hestê xwe yê watedar, me efsûn diki .

Ji bo helbestê “gotina rewan **”** û “ Gotina **çengdar”** tê bikaranîn.

Helbest ava safî ya hest û hizirînê jî tê gotin. Helbestên xweş me pir zû bandor dikin. Dixwazin wan jiberbikin, jiberkirina helbestan; me ber bi çavlêkirinê ve dibi.Weke dibêjin helbest pîvaneke hizirînê ya bi tixûbe, ev nêrîn me girênadi. Ji ber helbest ne wek nivîsîna pexşanêye. Nivîsîna pexşan, tişta dixwazi ragihînî, vekirî datîne holê

û dixwazi yê dixwîni bipesinîni. Helbest berhemek yê pîşeyêye. Şîrovê ji xwendevanan re dihêli. **Helbesta nivîskar ya bi navê çîçeka binefşî bixwînin.**

### Çîçeka Binefşî

**Tû çîçeka binefşînî,**
**Hişîn bûyî li Botanê.**
**Te azad kir Bana û Gabar**
**Te xemla da Cîhanê.**
**Evîndara welatê xwe,**
**Şehîda Kurdistan'ê.**

Helbestên bi vî awayî xwendevanan têxin nava hizirînê. Hinek mirov bi çend peyvan helbestê bi vî awayî şîrove dikin. Lê hinek dikarin bi sedan rûpel li ser mijarek bi vî awayî şîrove bikin. Jiberkirina helbestan, cîhana me ya hest û hizirînê pêştêxin, hêza me ya hundirîn zêde dikin,bêzariyê radikin, di hundirê me de çiqas helbest hebin, hest û hizir jî ewqas xwe asayî rave dikîn. Kesê nikari bi xwe rave biki, di nava bêgêwilî û xemgîniyê deye. Kesê bi vî awayî li şûna bi ziman xwe bi parêzi, serî li hêza stûrbûnê didi, yan jî dibi kesekî di hudirê xwe de girtî. Ji ber vê di jiyê ciwaniyê de pêwîste bi helbestên xweş bê xwedîkirin, bigihi asta pêhesîna ruhî. Helbesta em jiberdikîn, beriya her tiştî pêwîste em bipesinîn û jê hesbikîn. Jiberkirina helbestekî me nepesinandî ka çawa jiberkirina wê zore, ewqas xwendina wan jî bê bandore. Helbesta me bijartî, piştî em deng û wateya honandî fêrbibîn, pêwîste beş beş jiberbikîn, helbesta me jiberkirî, li hemberî neynikekî mezin, pêwîste bi dengekî bilind bixwînin. Fêrbûna xwendina li hember neynikê, ji me re hem bi pîvanbûna tevgerê qezenc diki, hem jî xurûşa bilind diki.

Xwendina helbestê, li pêşberî komekê bi zewqe, lêbelê berpirsyariya pîvanê tê xwestin kû karekî zehmete. Lê belê kesê ji xwe re rêzdar, ji xwe bawer, ji yê hember re rêzdar, ji bo kesên bi vî awayî xwendina helbestê yan jî kirina axaftinekî heya dawî xwezayî û asayiye.

**Dema tû li hemberî komekî helbestekê bixwînî, divê tû li gorî van distûran tevbigerî:**

**1.** Pêwîste helbestên me pesinandî bixwînin.
**2.** Helbesta me bijartî, pêwîste bi cih û yê guhdar diki re li hevhatî bi.
**3.** Nivîsîna helbestê dibi kû em, li ser kursî yan mêzeyekê deynîn. Lê belê pêwîste em kaxezê nedin dest xwe. Bê xwestin dikarîn dibin dûvkê çavê xwe re li helbestê binêrîn û bê kû bi şûnde bimînin xwendina xwe berdewam bikîn.
**4.** Beriya xwendina helbestê, dibi kû axaftinekî kurt di derbarê helbestê de bê kirin. Lê bi destpêkirina helbestê re pêwîste navê helbestê neyê xwendin, ne wisa bi bandora destpêkê ya helbestê li ser guhdar lewaz dibi.
**5.** Di helbestê lêdan, giranî, tevgerê dest û rû, têgihandinê bi bandor diki. Lê belê di vê mijarê de, divê em derbazî zêdekirinê nebîn. Axaftina zêde giraniya helbestê radiki.
Xwendevana têxi di nava rewşa tirane pêkirinê de û guhdaran teng diki.
**6.** Pêwîste helbest qet bi qîra neyê xwendin. Di cihên bi gengeş û yên rêkûpêkiya mikrûfonê negirtî de pêwîste ji xwendina helbestê birevîn.
**7.** Xurûş endamekî girîng ya hevsegkirina helbestêye. Li gor tê xwestin xurûş, helbestê bi coş diki. Xurûşa zêde bandora helbestê belav diki, xwendevan têxi nava telaşê, rê li ber jibîrkirina helbestê vediki. Dema milekekî helbestê tê jibîrkirin, pêwîste bi lez derbazî malika piştî wê bibi yan beşa herî dawî bixwîni. Di helbestê beşa destpêk û ya dawî gelekî girîngin. Helbestvan giraniyê didi destpêk û dawiya helbestê. Di van beşan de peyvên herî bi bandor, bihîstiyên herî xweş û sembolîk cih digrin. Ji ber vê sedemê pêwîste beşa destpêka helbestê û ya dawiya wê baş bê jiberkirin.
**8.** Bi dawîkirina helbestê re, bikaranîna "evqas, dawî, hewbû" û peyvên weke wan ji bo yê dibêjê re pilayekî ya nerêniye. Pêwîste dawîbûna helbestê bi awayê xwendinê diyar bibi.
**9.** Helbestên hatî jiberkirin car car bi dengekî bilind bixwînin, bi vî awayî di dil û zihnê xwe de zindî bihêlin.

**RAHÊNAN**

**1.** Di axaftinên rojane de, cih bidin axaftinekî hemberî û li deftera xwe binivîsin.

**2.** Axaftinekî kurt ya kû mijarekî nû têdigihîni, amade bikin û di refa xwe de bixwînin.

**3.** Helbesta di dawiya vê mijarê de ji hevalê xwe re bi awayekî dramatize bixwînin.

**4.** Helbesta di dawiya vê beşê de cih girtî lêkolîn bikin, ji heval û mirovên xwe re bixwînin, yên we pesandî jiberbikin. Hûn jî helbestekî bibijêrin û li tênûsa xwe binivîsin.

## EHMED`Ê XANÎ

**Xanî ji kemalê bê kemalî**
**Meydanî kemal dît xalî**
**Yanî ne ji qabil û xebîrî**
**Belkî bi te'esûb û eşîrî**

**Hasil ji înad eger ji bêdad**
**Ev bidete kir xîlafê muted**
**Safî şemirand vexwar derdî**
**Manend deriyê lîsanê kurdî**

**Ey nayê nîzam û intîzamê**
**kêşeye cefa ji boyî amî**
**Da xelq nebêjtin ku Ekrad**
**Bê me`erîfetin bê esil û binyad**

**Enwayî melel xwedan kitêbin**
**Kurmanc tenê dibê hesêbin**
**Hem ehlê nezer nebên ku kurmanc**
**Eşqek nekirin jibo xwe amanc.**

**Têkda neditalibin ne metlûb**
**Vêkra ne mûhibin û ne mehbûb**
**Bê behrene ew ji eşqbazî**
**Farix ji heqîqî û mecazî**

**Kurmanc ne pir dibê kemalin**
**Ema di yetîm û bê mecalin**
**Fîlcumle ne cahîl û nezanin**
**Belkî di sîfîl û bêxwendin**

## DILBER

**Eger dil dilbere, dilber kudume,**
**Eger dilber dile, dil re çi nûme,**
**Dil û dilber bi hev avêtewî**
**Nezanim dil kêyew dilber kudume.**

**Bi derya binêrim ,derya te wînim,**
**Be sehra binêrim,sehra te wînim,**
**Bi her ca binêrim,kuh û der û deşt,**
**Nîşan le qameta re'ena te wînim.**

**Aşiqê an bî dayîm le belabî,**
**Eyyûb asa bi kirman,mûbtelabî,**
**Hesen asa bi nûşî camî zehrî,**
**Hûseyîn asa şehîdî kerbelabî.**

**Be goristan guzer kerdim sebahî,**
**Şeneftim nalew û efxan û ahî,**
**Şenftim keleyî be xak mîgoft,**
**Ke în dunya nemî erzed be kahî.**

**Zi destî dîdew û dil herdu feryad,**
**Ke her çî dîde bîned ,dil konedyad,**
**Wesazim xencerî nîşeş ze polad,**
**Zenem ber dîde ta dil gerded azad.**

**Be goristan guzer kirdim kem û bîş.**
**Bidîdem qebrî dewletmend û derwîş,**
**Ne derwîşî bî kefen der xak xofte,**
**Ne dewletmend burdê zi yek kefen bîş.**

**Amed bi soraxim her sê yek bar,**
**Xerîbî û esîrî û xemî yar,**
**Xerîbî û esîrî care dare,**
**Xemê yarim, xemê yarim, xemî yar.**

**Derdedarim bîcanim kerdê rîşe,**
**Be dergahî xweda nalem hemîşe,**
**Refîqan qedrî hemdîger bizanin,**
**Ecel sengest ademî meslî şîş.**

**Baba Tahir'ê Hemedanî**

## EZ GORIYA BANGA TE ME

**Hawar hawarî kurde**
**Deng û gazî welate**
**Mizgîniya xwe nasîne**
**Hatin be dengê Hawar**
**Qîz û kur pîr û ciwan**

**Hawar hate çiyayan**
**Deşt û gund pê lerizan**
**Bangî azadî kurdan**
**Yekbûnî weşî dilan**
**Kewte naw mal û xêzan**

**Herdem be demî Hawar**
**Pêk dekoşin û hawar**
**Huşyar debina welat**
**Ladeban şîn a welat**
**Ez goriyê bangê teme**

**Mamosta**
**Akrî 8.hezêran 1932**

## WA MILETÊ KURDÎ

**Pêşkevin em ,serfirazin miletê kurdî.**
**Yan mirin dê bibînin yan jîna kurdî.**
**Wa miletê kurdî**
**Bi xwendevan,xwendegehan,bi al û leşker.**
**Dê bijîn ,paşê dikarin rêçê bibin ser.**
**Wa miletê Kurdî**
**Heta kengê em bimînin bi destê dijmin.**
**Geh bi kuştin ,geh bi sotin,tim tê bîra min.**
**Wa miletê Kurdî**
**Kurdistan êdî menale ,lawên te hatin.**
**Xwendevanin,xwînfiroşên axa welatin.**
**Wa miletê Kurdî**
**Mal ,can û dil bi carek bo te fida kin.**
**Xwînên xwe ên paqij direjin bendeyê nakin.**
**Wa miletê Kurdî**
**Ala rengîn bo te dayînin ger ser bi derdin.**
**Ger nekim vê tû bizanê kî ez ne Kurdim.**
**Wa miletê kurdî**

**Ehemd Namî**

## SIYA PÛŞ

**Dilberek min dî bi çavan**
**Agir berda hinavan**

**Şem û ruhniya zulamê**
**Zulf û xalên temamê**
**Şerbeta şîrîn kelamê**
**Sed şikir îro selamê**
**Şerh û teqrîr îslamê**
**Reng û elwanê di camê**

**Min qebûle hikmê rindan**
**Lê çi bêjin qewl û bendan**
**Zehmetek wan pur bi min dan**
**Dil hedef kir tîr li min dan**
**Bê 'eded cewher bi min da**
**Xemzeyê pur mekr û fendan**

**Lê li min berda girînge**
**Bê sebeb ketme nivînê**
**Lê ji ber hisna şirînê**
**Kanî Hurê serzemîne**
**Ew bi xwe halim bibînê**
**Zulf xal û xemrevînê**

**Zulf û xal ûmest û naze**
**Gerdenê gerdenfiraze**
**Cerdd ikim ehlê mecaze**
**Xef dibin esrar û raze**
**Ez çi kim sewm û nemaze**
**Min di dest tembûr û saze**

**Dil 'ebîr û nest û mîrê**
**Da li min derbek bi tîre**
**Kirme hubba zemherîrê**
**Kanê Melayê Cizîrê**

**Ka Xanî şêxê beşerê**
**Baba Tahir û ‘Eliyê Herîrê**

**Şev dikim nalîn û zarî**
**Ey siyahpûş tu xumarî**
**Çend siyahpûş tu sutarî**
**Dur û yaqut û mirarî**
**Hespê şahê şehsiwar î**
**Ji ‘işqê tu bi eh û zar î**

Parçeyek xwendina serbest

## AXAFTIN

Berê terbiye bi peyvek yek kite ji aliyê fermandarekî ve dihat dayîn:

_ Hiş…

Zarokên me demê kû ji lendikê rizgar dibûn,peyva destpêkê dibihîstin ev peyv bû:

_ Hiş

Ji devê û bava bi awayekî hişk derketina vê peyvê ,heya jiyê mirov heye nikarê jê rizgar bibin. Ma mifta di dibistanê de herçiqas hinek peyvên xweş digotin jî di encam de peyva herî zêde bi hêrs bikardanîn :

_ Hiş

Di malê de dema kesek dixwest baxivê ji wî dîsa ev peyv dihat bihîstin:

_ Hiş

Mezinê me ,gunehek qet nedibexşandin: Axaftin!

Devê kû jibo axaftinê vedibû,di çapemeniyê de dihat astengkirin(sansorkirin) di kolanan de jî bi çekan dihat bê dengkirin ! Bi sala me ji gotina dibêjin “ Ger axaftin zîv bi ne axaftin zêre ” bawer kir û bê deng man .

Ger ev têgiha dê û bavê me rastba,niha emê gelê herî dewlemendê Cîhanê bana. Niha em tim daxivin,weke lehiyê bihara ,gotin li pey hev xwe tavêjin…

Bi maf daxivin ,bê maf daxivin ,tehl daxivin, şîrîn daxivin,baş daxivin ,xirab daxivin…

Xem nakê. Her kû zingara salê tiralê dimihlê zimanê me vedibê weke gotina dibêjin hesinê dişûxûlê zinger nagrê,gumanên me nînin kû bi vî awayî tevgerkirin,di vê riyê de meşîn,dê me bibê rastiyê.

## TEST III

**1.Ji yên jêrîn kîjan ne devoka zimanê kurdiye?**

**a.** Devoka Botanê **b.** Devoka Ruhayê
**c.** Devoka **Amedê** **ç.** Devoka Hewlêr
**d.** Devoka Finik

**2.Ji yên jêrîn kîjan ne taybetmendiya zimanê çandê ye ?**

**a.** Cûdabûna devokan heye**.** **b.** Endamê hevgirtina netewî ye**.**
**c.** Hilgerê çandê ye. **ç.** Ziman girêdayî distûra ye
**d.** Di kesan de zanîna ziman pêktîne.

**3.Ji yên jêrîn kîjan ne taybetmendiyê zimanê axaftinê ye?**

**a.** Di nava kesan de pergala ragihandinê ye.
**b.** Di derbarê peyv û tevgerê de ye.
**c.** Ji zimanê nivîsînê hîn zêdetir mayînde ye.
**ç.** Pergalek belav ya li hevhatinê ye.
**d.** Girêdayî pîvanê rêzdariya yê daxivê ye.

**4.Ji yê jêrîn kîjan ne kêrhatina kesê daxivê ye?**

**a.** Guhdara ji nêzîk ve nasdiki.
**b.** Ji guhdaran re rêz digre.
**c.** Bi rêzê ve bi awayek hişmendî daxivi.
**ç.** Bi xwe bawere.
**d.** Li gor pleya guhdara hevokan sazdiki.

**5.Ji yên jêrîn kîjan ne ji kêrhatinê axaftina bi amadekariye?**

**a.** Komkirina zanînê pêwîst diki.
**b.** Di nava planekî de didi.
**c.** Hişyarî û balkêşiyê didi pêwîstkirin.
**ç.** Amadekariyê pêşî pêwîst naki.
**d.** Pêwîst diki kû distûrê ziman baş bizanibe.

**6.Ji yên jêrîn kîjan di pileya yekem de civakê têkildar naki?**

**a.** Aborî **b.** Konevanî
**c.** Dîrok **ç.** Moda
**d.** Perwerde

**7.Kîjan şahî di pileya têgihandinê de riya herî baş ya fêrbûnê ye?**

**a.** Xwendin **b.** Dramatîzasyon
**c.** Guhdarkirin **ç.** Nivîsîn
**d.** Axaftin

**8.Kîjan ji yên jêrîn ne distûra helbest gotina li hember gele?**

**a.** Tim binêri û bixwîni.
**b.** Giranî,lêdan
**c.** Helbest li gorî civakê bi.
**ç.** Li gor mijara helbestê gotin.
**d.** Bi pîvan karanîna tevgerên dest û rû .

# BEŞA ÇARÊ 4
# NIVÎSÎN

1. Xebatên nivîsînê
2. Plan çiye?
3. Xebatên plan çêkirinê.
4. Xebatên plana nivîsînê.
5. Hûkolînên nivîsînê.

**1.Xebatên nivîsînê**
**a. Keşifkirina mijarê.( têgeh, girêftarî )**
**b. Tixûbkirina mijarê ( kîjan milê girêftariyê dikari çareser biki.)**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. **Ger mijar û awa serbest bê berdan jî gelek xwendevan asayî nikarin dariştinê binivîsin.Hûn vê bi çi ve girêdidin?**
2. **Girêdana di navbera mijar û sergotara nivîsîna quncikê rojnamê de lêkolîn bikin , di vê mijarê de nêrîna xwe bidin diyarkirin.**
3. **Di navber çareserkirina tevahî girêftariyê û hesek vê**

## ÇANDA HÊZÊ Û HÊZA ÇANDÊ

Dema welatek tê dagirkirin û ji bo hêzek metinger dibi metingeh, ev hêz dixwazi bi hemû şêwaz û rêbazan gelê wî welatî kedî bike û bihelîne. Ji bo pêkanîna vê mebestê destpêkê destê xwe davêji çanda wî gelî, didize yan diki ya xwe, yan jî xirab û winda diki. Eger nikaribi van tiştan pêkbîne, bi zora hêza agir û hesin qedexe diki, ji ber kû xala yekem ya mirov bi axa welatê xwe ve girêdide çande. Lewma çanda hest, bîr û ramana netewî şiyar û gur diki, nasnama netewî diparêzi.

Lewma em dibînin bandora çanda metingerên Îngilîz li ser zimanê gelên Hindî û Başûrê Afrîqayê heye. Çawa çanda Hindiyên sor, Bakurê Amerîka qir kir, her wiha metingehên Ispanyol û Portekîz jî zimanê xwe li başurê Amerîka belavkirin, li Cezayîrê jî Fransiyan wisa kirirn.

Di şêweyên metingehên klasîk de, ev kiryar bi zor û eşkere dihat kirin. Lê piştî pêşketinên, metodên ragihandin û şoreşa teknolojî ya

kû jê re dibêjin “globalîzm”, metîngeriyê jî qalikê xwe guhart û naveroka xwe parast. Yanî metingeriyek bi armanc û ramana xwe ya Kevin, di şêwe û metodên xwe de nû, kû çekên wê ragihandin, çapemenî û teknolojiye. Aboriyek xurt û mezin jê re bingehe.

Armanca vî çekî ewe kû bi rengekî zirav û pir nazik xwe bigihîni mejiyê civakê, pê bileyîzi û li gor xwe biguherîne. Ji ber kû eger mejiyê civakê bindestbû, civak jî bindest dibi.

Ev hêza kû piştî di şerê sar de derketî, dixwazi ne tenê welatek yê parzemînekî bindest biki, belkû tevahiya cîhanê ji xwe re kiriye armac û daye ber alavên çanda xwe. Ji bo kû mirov li hemû deverên Cîhanê, welat, çand, netew û kesayetiya xwe ji bîr biki û li gor şêweyên jiyana mirovê Amerîka bijî, yan kû Cîhan û mirovahî bi tevayî bibi metingehek Amerîkî, kiriye armanca çanda hêzê.

Li hember lehiya çanda hêzê ya hemû Cihanê daye ber pêlên xwe û dixwaze wê binav biki, hêza çandê jî radiwste û li hember derdikevi. Ev hêz tê wateya dewlemendbûn, rengînbûn û kevnariya çandê kû kokên xwe kûr û dûr berdaye dîrokê û di avakirina şaristaniyan de rolek navendî û girîng leyîstiye û hebûna gelê xwe parastiye.

Çeka gelên kû dixwazin li hemberî dagirkirina çandî ya globalîzmê rawestin, li ber xwe didin û xwe biparêzin, windabûn û tunebûna hêza çanda wane. Çiqas bi çanda xwe ve girêdayî bin, ewqas dikari li ser rûyê Cîhanê bijîn. Ev qet nayê wê wateyê kû gel di hundirê xwe de girtî bimîni, bibi dîlê kevnetora xwe û dûrî pêşektinên zanistî, ramyarî bi. Dîsa di hemû aliyan de, li ser hemû astan bikevi. Lê ji tiştên globalîzmê yên erênî sûd bigiri û di warê kiryarî de bikarbîni, tiştên nerênî jî nepejirîni û negiri.

Bi vî rengî netenê temaşevan bi , belkû hebûna xwe biparêzi û rolekê çalek di lê xwedî bûnê de bileyîzi, bikêr û bi bandorbi. Ev pêvajo bi lez û bez dimeşi, her tiştê lewaz û bêkêr radiki û dihêri. Em dikarîn vê pêvajoya weke kêferata di navbera çanda hêzê de û hêza çand de bi nav bikîn

**Ji belga konferasa çand û huner ya Lubnan hatî girtin**

**PIRS:**

**1.** Li gor nivîskar dema dagirkerek dikeve welatekî çi diki?

**2.** Çekên gelên li hemberî dagirkeriyê diparêzin çi ne?

**3.** Gelo bi karanîna sergotara bi nave çanda hêzê û hêza çandê jib o vê mijarê hûn di cih de dibînin? Gelo jibo vê mijarê kîjan serotar ji bilî vê serotarê tê bikaranîn?

**4.** Dabaşa vê mijarê diyar bikin.

## 1.XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Hinek dîrokzan bi şaristaniyê ve nivîsandin destpêdiki, pêvajoya beriya nivîsînê tariye.Wêne, peyker, tiştên girêdayî mîmariyê, bermayî jî di derbarê şaristaniya kevin de agehdariyê didin. Lê belê yek ji van jî cihê nivîsînê nagirin. Bi nivîsînê, mirov rasterast dikari xwe rave biki û bi vî awayî li ser hizirînê, hizirîn, li ser zanînê zanîn tê zêdekirin. Ji ber vê şaristaniya îro bingehê wê nivîsîne.

Nivîsîn riya herî xurt û mayîndeye. Ji ber sîstema nivîsînê bi xwe rêkûpêkiya hudirîne û distûrên wê hene. Taybetmendiya bingehîn ya kû nivîsînê ji xwendinê cûda diki jî eve.

**Nivîsîn**, pêdiviyeke dest ji nayê berdan, ya kesê perwerde dîtî û hemdeme. Di demê xwendekariyê de, ev pêdiviyeke, em neçarîn fêrî vê pêdiviyê bibîn. Ji derveyî vê, bav û bapîran, li ser kesê nexwenda yan xwendî tênegihîştî dibêjin: “xwendevan” em jî dê bikevin vê rewşê.

Nivîsîn sazûmaniyek ya nîşanên ji tîp û hêmadanînê pêkhatiye. Endama herî girîng ya nivîsînekî mijar û hizira bingehîne.

**Mijar**, di nivîsandinekî de tişta tê xwestin bê têgihandine. Çi hizirê bê bîra mirov, hest, bûyer, rewş, heyîn û tişt dibi kû bibin mijar. Dîtina mijara nivîsînekî nezehmete. “ Di vê nivîsînê de bi taybet li ser çi tê rawestandin” bersiva vê mijara nivîsînê dertêxi holê.

**a. Kifşkirina mijarê ( wate, girêftarî)**

Kifşkirina mijara nivîsînê pêvajoya destpêkê ya nivîsînêye.Vê mijarê yan emê hilbijêrîn, yan jî amade peyda bikin.

Dema em mijarê bibijêrîn, dixwazîn nivîsîna derbarê vê mijarê bê pesinandin, ji ber vê mijara kû em li ser binvîsin, divê li gor kêrhatin û zanîna me bê û ji bo pêşketinê vekirîbi.

Mînak:Mijarê derbarê çekên nûkler, aboriya civakî, derûnasiya civakî, di derbarê wan de agehdariyên me yên pêwîst tûnebin, emê nikaribin li ser wan nivîsandinekî serkeftî binvîsîn. Piştî em mijarekê

baş têgihîştin, di derbarê vê mijarê de, em dikarîn nêrînên xwe raxin ber çavan. Ger di derbarê mijarekî de em xwe têr nebînin, di derbarê mijarê de pêwîste em agehiyan kom bikîn û piştre dest bi nivîsîna xwe bikîn.

**Mijara tê lêkolînkirin pêwîste xwediyê van taybetmendiyan bi:**

**1.** Pêwîste mijar li gor astê bi.
**2.** Divê mijar ji bo pêşketinê vekirîbi.
**3.** Divê ne li dijî hiş, hişmendî û hoyên giştî bi.
**4.** Mijar pêwîste balkêş bi û zewqa xwendinê bê şiyarkirin.
**5.** Neçare mijara bikaribi bi rêbaza, ji hindikahiyê berbi piraniyê ve, ji piraniyê berbi hindikahiyê ve bikarbîn were dayîn.
**6.** Pêwîste mijar bi awayekî di cih de bê bi tixûbkirin.
**7.** Bingehê di derbarê bikaranîna mijarê de, pêwîste bê diyarkirin û nivîsîn, li gor van bingehan nivîsandin bê nivîsîn.

Bi kurtayî ev bingeh; komkirina agêhiyê, çêkirina plana nivîsînê, hilbijartina awa, li gor plana nivîsînê, ne derketina ji derveyî mijarê, diyarkirina cihê nêrîna bingehîn, tevgera li gor distûrê nivsîn û hêma danînê, pêwîste girêdayî teknîk, rêgez û awayê têgihandinê pêwîst dibîni, bimîni.

**b. Xurtkirina mijarê( kîjan milê grêftariyê dikarim çareser bikim )**

Dibi kû di tevayî mijara li ser hatî hizirandin de, rêbazek darezandin û watekirinê ya ji giştî berbi taybet, ji taybet berbi giştî ve bê bikaranîn. Mînak: “ dar “ mijarek giştî ye. Em dikarin vê bi awayê heyînên zindî û şînatiyên hîn bêhtir firehtir bikîn. Heman mijar “ cihê dara spîndarê di karxana kaxezê de” Bi vî awayî dikarin bikin taybet, ev mijara kû me taybet kirî, dikarîn bi awayî “ cihê dara spîndarên li Botan û Behdînan” hişîn dibin, di karxana kaxezê de bê bi tixûbkirin .

Armanca bi tixubkirina mijarekî ewe kû mijar ji aliyê xwendevanên xwe ve baş bê têgihandin. Bi vê riyê nirxandina mijarê, ji bo afirandina armancên lêkolînê , **pêwîste em li bersiva van pirsan bigerîn:**

**1.** Mijar li gor asta xwendevane? ( Xwendevan vê mijarê têdigihi ?)
**2.** Xwendevan mijarê bi baldarî pêşwazî diki ?
**3.** Dirêjiya mijarê li gor asta xwendevane? ( Pêwîste nivîsîn, xwendevanan teng neki, divê xwendevan tevayî nivîsînê bixwînî. Ji ber vê mijar ne zêde dirêj bi, pêwîste bi awayekî kurt gihayî armanca xwe bê nivîsîn .)
**4.** Agahiyên me yên di derbarê mijarê de besin, çavkaniyên me yên di derbarê mijarê hene?
**5.** Pêwîste kîjan mile mijarê bi taybet bê eşkerekirin?
**6.** Ev mijar di demê hatî diyarkirin de tê nivîsîn?
**7.** Mijar, bi têgihandinek çawa hatiye hilbijartin, tê nivîsîn?

Ya bingehîn, di nivîsîna ji bo bi xwendevanê xwe, hizirînekî bidi heskirin yan jî xwendevanê xwe li derdora hest û hizirînekî kom biki, tê nivîsîn de dan bawerkirine. Ger mijara tê hilbijartin, ji bo armancek bi vî awayî bi, dibi kû mirov ji cavkaniya sûd bigri û ger cihê çavkaniya diyar bi baştire.

Em mînakekî ya kû mijara giştî berbi taybet ve hatî tixûbkirin, bidin. Mijara giştî bila “ **civak**” bi .

**a.** civak .
**b.** Saziyên civakê çêdikin.
**c.** Malbata sîsika civakê.
**ç.** Di malbatê de erkê kesan .
**d.** Di malbatê de erkê dayîkê.

Di vê rêzkirinê de (d) weke pêpilka dawî ya rêzkirina vê mijarê hatî diyarkirin.

**RAHÊNAN**

**1.**Hûn jî, ji mijarên giştî yên li jêr hatî nivîsîn, sergotara mijara rêza siyê peyda bikin.

**Xweza, dostayî, rexne, perwerde, tenduristî, wêje, mîzik, spor**

**2.**Di derbarê jiyana me ya rojane de, mijarekê diyar bikin û li ser pêpilka dawî ya tixûbê vê mijarê axaftinekê amadebikin.

c. Kifşkirina ramana bingehîn.
ç. Kifşkirina ka kîjan dê bê bikaranîn di riya pêşxistina ramana bingehîn de.

**XEBATÊN AMADEKARÎ**

1. **Ji belavoka bingehîn ya nivîsînekê, armanca resen, ji peyvên darizandina giştî hûn çi têdigihînin.?**
2. **Mijarek ya dariştinê hûn çawa şîrove dikin?**
3. **Hûn girêdanek çawa di navbera mijara nivîsînekî û awayê ji xwendevan re tê ragihadin de cêdikin.**

## ÇAVNEBARIYA ZIVISTANÊ

Tu ji ronahiya rojê jî çavnebar dibî,te parceyek ji asîman dagirkir,rengê xwe pêda veda. Tarîtî û reşahî li ser mêzeyekê civiyan . Plansaziya werzê danîn ,biryar dan kû, hertim bibin serdestê demê,ferman dan kû hertim bibin neyarê Ahora,di vê navberê de, şerê ewr û rokê , ba û xunavê ,li dar bû. Car li ser car li bin rokê xwe nîşan dida. Tîrêjên xwe tî û rast dida erdê ,hemû candar û zîdeweran parên xwe jê digirtin. Kal û pîran li berberojkan serboriyên xwe bi xweşî taliya xwe ve vegotin dikirin. Lê çavnebariyê ne dihêla ,

Ya sertextê demê **,** lehî rakirin,gijlokan kirasên giya çirandin,lotkeyên çiyan bi şaşika spî hatin girêdan,berbi singa zozanan ve xwe berda, her çû xwe berda, ta xwe li tevahiya zemînê pêça ,qîr û hawara bedenên daran dihat. Av bi lat û ziraran de dadiwerivî, dilop dilop zembelîkên qeşayê çêdikirin,rêz bi rêz ,bi xwe bawer , mîna tîrên amadekirî jibo şer û cengan .Lê çi sûde,dema kû roj ji bin ewran derdiket zembilîkên ;qeşayê yên mîna tîran ,stû xwehr dikirin ,xwêdan didan ,qîr û hawara xwe digihandin zivistan û jêre diçûn secdeyê .

Baskên firindeyan şkestîbû,dibin lep lepa berfê de ,bi lingan be jî ,li debara jiyanê xwe digeriyan kû bikaribin xwe rizgar bikin.Li hember mezinahiya rojê bûkên berfê biçûk dibûn,her diçû bi çûk dibûn .ta bi erdê re dibûn yek. Di bin tevizîna jiyanê de xelkê belengaz hawara xwe digihandin agir. Serdestiya xwe li her derê dikir,guh ne dida qêrîn û hawaran ,ne xizanî dinasî û ne jî dewlemendî ,tenê hêz û desthilatiya xwe dizanî.

Lê divê neyê jibîrkirin kû çerxa felekê digere,sertextê dema îro nabe yê sibê.

**Munzur**

**PIRS**

**1.** Nivîskar ev mijar jibo destekdayîna kîjan nêrînê têgihandiye?
**2.** Nivîskar dema xwestî ramana xwe rayêxe ber çavan ji kîjan mînakan sûd girtiye?
**3.** Ramana bingehîn û ya alîkarê vê mijarê bidin diyarkirin.

**c.Kifşkirina ramana bingehîn. ( Ji bo çareserkirina girêftariya hevoka hizira bingehîn) kîjane?**

Her sê pêvajoyên destpêkê ya nivîsîna nivîsînekê evin:

**a.** Hilbijartina mijarê.
**b.** Bi tixûbkirina mijarê.
**c.** Diyarkirina qiraç û nêrîna mijarê.

Ji van her sê pêvajoyan, me herdu yên destpêkê di mijarên beriya vê de dîtibûn. Qeraça nêrîna mijarekî bi tixûbkirina wê mijarê re derdikeve holê, beriya em derbazî qiraça nêrînê bibin, mada benda bingehîn ya mijarê tê peyda kirin . **Benda bingehîn** rastiya hizira bingehîne.Mînak : "Hevalê xwe ji min re bêje, ezê ji te re bêjim tû kîyî" Benda bingehîn ya vê penda pêşiya **hevaltî** ye. Ev penda bingehîn dibê ku bi qiraça nêrînekî ve bêgirêdan û tixûbkirin. Di Sûdê hevaltyê de dikari ev pêşdîtin derkevin holê; dibi kû hevalê te, te bikêşi nava xirabiyekê, jiber hevalê xwe yê zarokatiyê jibîrnaki û serheveçûna hoyê hevaltiyê h.w.d.

Lê belê mijara me di nava tixubê vê penda pêşiyan ya li jor de, pewîste bê destgirtin, jiber vê di penda pêşiya ya ku dibêjin :" ji min re hevalê xwe bêje, ezê ji te re bêjim tu kîyî " de "**Mirov ji hevalê xwe bandor dibi**"Girêdayî vê darezandanêye. Ji vê darezandinê em bikevin rê, encama bigehînî eve : Mirov ji hevalê xwe bandor dibe, ji

ber wê di hilbijatina hevalan de pêwîste pir baldarbi, pêwîste bi kesê re hevaltiyê bikin kû ziyanê nedi me.

**Hizira bingehîn (ramana bingehîn)**

Pêwîste hizira bingehîn di hevokekê de bê komkirin. Li gor vê mijara me li jor dayî, hizira wî ya bingehîn dibi, bi vî awayî bi:

**Pêwîste di hilbijartina hevalan de pir baldarbîn, bi mirovê baş re hevaltiyê bikîn.** Piştî van daxuyaniyan, em dikarin hizira bingehîn ka çiye, bi kurtayî rave bikin:

Dema kû tû mijarekî bixwazê bidî xwendekaran, ji hizira wê re dibêjin ramana bingehîn. Ji bo em bikaribin hizira bingehîn ya mijarkê peyda bikîn, pêwîste vê pirsê bikin:

-Nivîskar di vê mijarê de, dixwazê kîjan şîret, peyam û darezandinê bidi xwendekar?

Pêwîste hizira bingehîn bi mijrê re neyê tevlîhevkirin .

Ji bo peydakirina mijarê :

Ev pirs; di vê nivîsînê de dabaşa çi tê kirin û li ser çi tê rawestandin? tê kirin

Bersiva bê girtin: Mode, hoy, xweşborandin,....Bi peyvek bi vî awayî tê diyarkirin. Hizira bingehîn jî, neçare bi hevokek ya darezandinê ve bê girêdan.

Mînak: "Pêwîste ,moda mirovan berbi xweşikbûnê ve,ne berbi çavlêkirinê ve bibi. Mirovê bes xwe bihiziri , mirovekî bihoy nayê pesinandin. Hevoka hizira bingehîn pêwîste van taybetmendiyan bikşîni:

**1.** Pêwîste kurt û bi cewher bi.
**2.** Pêwîste darezandinekî giştî bigri nava xwe.
**3.** Divê ne berûvajiyê mijarê bi.
**4.** Têgihandinekî xaze, nabi hevoka ramana bingehîn. Hevoka ramana bingehîn neçare hevokek vekirî û têgihayî bi.
**5.** Kirina hevoka bingehîn, bi awayekî giştî kirina dema fireh, yan raweya tê xwestine, di hevokên saloxî de pêveka kesê sêyemîne.
**Mînak :** Mirov di ciwaniyê de bêhtir fêrî nivîsînê dibi.
Pirtûk, pergala herî bi sûd ya perwedêye.
**6.** Pêwîste hevoka bingehîn peyamekî, şîretekê û hizirekî bi sûd bidi têgihiandin, ji bo cîhana kesî ya hizirînê bibi arîkar.

**ç. Diyarkirina di riya pêşxistina hizirê bingehîn de ka kîjan dê bê bikaranîn (çavnêrî, taqîkirin, ji yekî din girtin, ji tevayî hatin, çûna tevayî )**

Ramana bingehîn, mijarê bi darezandinekî giştî ve girêdidi, lê belê darezandina arîkariyê didi ramana bingehîn jî girînge. Mijarek, bi ramana arîkar ya kû li derdora ramana bingehîn peyda dibi û ji bo ramana bingehîn dibi arîkar û dibi yek binvîse

**Riyên ramana bingehîn pêştêxin evin:**

**Îstatîstîk**
**Çavnêr**
**Taqîkirin**
**Ji yek din girtin**
**Ji tevayî hatin**
**Çûna tevayî**

**Îstatîstîk**

Îstatîstîk, di pêşxistina hizirînê de pêgirê (delîlê ) Îstatîstîkiye. Di gotar, yên weke rexne, milê hizirînê zêde, ji bo awayê nivîsîna kû hizira em diparêzîn lêkolîn diki, ji bo bawer bi, pêwîste em ji Îstatîstîkan sûd bigrîn.

Dema kû em sûdê ji Îstatîstîkê digirîn, divê van distûran li ber çavan bigrîn.

**a.** Îstatîstîk, divê di derbarê mijarê de xebatên dawîbin. Îstatîstîk ne rojane bi nirxê zanista wê nîni.
**b.** Divê ji aliyê pisporê Îstatîstîkê ve, hatibi çêkirin.
**c.** Pêwîste Îstatîstîk ji çavkaniyekî bi bawer hatibi girtin.
**ç.** Zanînên Îstatîstîkê, bi awayek di kesî de rê li xapandinê veneki, bê bi rêkûpêkirin. Pêwîste zanîn vekirî û têgihayî bin.
**d.** Giştîbûnên xwe napesêrin pêgiran (delîl) weke zanînên Îstatîstîkê neyên bikaranîn.

**Çavnêr**

Şarezayiya bi riya **Çavnêr**ê tê bi destxistin, ramana bingehîn pêştêxi, zanînên zindî, bi bandor û pîşkar ( oznel )in.

Têgihandinek bi çavnêriyê nehatî xwedîkirin, ramana bingehîn nadi pêhesadin. Ji ber vê çendê çavnêr, riyek ya komkirina zanîn û pêşxistina hizira bingehîn ya dest jê nayê berdane. Lê belê çavnêr ne

“ lê nêrîn “ e. “hûrkolîn” e. Kesê kû çavnêriyê diki, di derbarê mijarê de, divê xwediyê pêşzanînan bi.

Di demê çavnêriyê de, divê cûdayiyên wê bên diyarkirin, têbîniyên pêwîst bên girtin û pêwîste bi ramanê re bên girêdan û nirxandin.

Kesê kû bixwazi di berbarê bandora fotbolê ya li ser ciwanan de nivîsandinekî binvîsi, di mal de, bi remaşekirina televizyonê çavnêriyê biki, bi bawer nayê. Ji beriya kû nivîsandinekî wiha bê nivîsandin, pêwîste biçi çend leyîstokên fotbolê û bûyeran çavnêr biki û têbîniyan bigri.

Çavnêr “çavnêriyaa hundirîn ” “çavnêriya ji derve” her wiha dû awayên çavnêriyê hene: Demê mirov hest, hizir û tevgera xwe lêkolîn biki jêre çavnêriya hundirîn tê gotin. Ger çavnêriya di derbarê hinek ji derveyî me de bi, weke çavnêriya ji derve tê hejmartin.

Berhemên nivîsînê yê kû ji aliyê çavnêrek baş ve hatî destek kirin, di anîna cem hev ya nivîskar û xwendevanan de rolekî girîng dileyîzi. Ji ber vê yekê nirxek mezin didin nivîskarên leyîstoka roman, çîrok û helbestvanan. Core nivîsînên girîngiyê didi bûyeran yên weke roman û şano, dîsa nivîsînên kû giraniyê didi hizir yên weke gotar û mamikan tev ji çavnêriyê sûdê digrin.

**Taqîkirin**

Taqîkirin, rêbazek ya zanîn girtinêye. Ji ber vê taqîkirin, ji çavnêriyê hîn rastir hîn bi bawertire. Taqîkirin, bi awayekî giştî di nivîsînên zanistî de tên bikaranîn, rêbazek ya pêşxistina ramana bingehîne, lê belê bê xwestin di nivîsandinên din de, weke di nivîsînên wêjeyî de jî dikarin bikarbînin.

Mamostayek ji bo xwendevanek di waneya wî de, ketî, rewşa wî têbigihi û sedemê wê lêkolîn biki, ji xwendevan hin pirs dipirsi. Mamosteyên bi vî awayî asta têgihandina xwendevan têdigihi, li gor vê dikari waneyan amade biki û dê xwendevan bibi serkeftinê. Di vê mijarê de mamosta di gotarek ya amadekirî de, taqîkirina tê bikaranîn dê di pêşxistina ramana bingehîn de rol bileyîzi.

Wek nimûne mamosta, di nivîsandinek ya têgihandinê de, bi riya pêşxistina ramana bingehîn, bi mînaka bila têbigihi û bila ji xwendevan bixwazi kû ew jî di gotarekî de van tiştan bikarbîni. Di encam de xwendekar van delîlan bîni gel hev, bikar ne anîna wan

bibîni, li ser vê mamosta, ji nû ve têbigihîni, ev helwesta mamosta taqîkirineke .

**Ji yek din girtin**

Ji bo di gelek aliyan de, ji nivîsîna me re bibi arîkar nêrîna me xurt biki û têgihandina hizira me asayî biki, em ji gelek çavkaniyan sûd werdigrîn, bi taybet di nivîsînên weke hûrkolîn, rapor, gotaran de, vê riyê dihilbijêrîn.

Ji bo em hizirê xwe pêşbêxîn û xurtbikîn, em ji çavkaniyên cor becor zanistên taybet digrîn, ji vê core nivîsînê re em dibêjin girtin. Bermayî mijarê bi bawer dikin, lê belê nivîsînek bi girtiya bê dagirtin bi tirsnake, ji ber kû her nivîsînek nasnama nivîskarê xwe hildigri. Li mile din her nivîsînek ya nû tê çêkirin, pêwîste ji nivîsînên beriya xwe hîn zêdetir nêrîn û hizirînekî bîni. Zanînek nû ji xwendevanî re ragihîni. Ger nedi, di vê mijarê de nivîsîna nivîsadinekî bê wateye.

Girtin ne bes ji çavkaniyên nivîskî tê girtin, ji her core çavkaniyên kû zanîn têde heyî tê girtin. Li gor cihê xwe divê kû şerîtek ya deng, nexşe, bernameyên Radyo û Televizyonê, fîlmên sînamayê, konferans, rûniştina vekirî û gotara nûtûq bibin jêdera girtinê.

Girtin yan rasterast ji nivîskar yan çavkaniyê tê girtin yan bi hevokên xwe, girtinekî hizirî pêktînin. Di girtinê de diyarkirina çavkaniyê, hem neçariyek zagoniye, hem li gor heskirin û rêzdariyê pêwîste. Di girtina rasterast de ger sadekirin bê xwestin dikari bibi. Pêwîste girtinên rasterast di nava neynokê de bê nivîsîn. Dibi kû girtinek rasterast neyê têgihandin, bê şîrovekirin di rewşa xwe ya taybet de bê bikaranîn, di girtinên bi vî awayî de çavkaniyên wê yan di nava têgihandinê de yan weke têbîniyek li dawiya rûpelê tê diyarkirin.

Hin gotinên kû ji aliyê her kesî ve tê zanîn û tê pejirandin, piştî di nava neynokê de bê danîn, pêwîst naki kû xwediyê wê bê diyarkirin.

wek tê gotin“ kesê min fêrî tîpekî biki, ezê çil salî jêre bibim kole.” Ev gotina mezinan dikari wek xwe bimîni. Lê belê ji bo rêzdayîna xwediyê wê, bi vî awayî xurtkirin û têgihandina wê ger xwediyê gotina mezinan bi, diyarkirin wê baş bi.

**Ji tevayî hatin**

Ji tevayî bal parçeyê ve, ji giştî bal taybet ve, ji distûra rasterast çûna berbi mînakan ve têgihandina bi vî awayî tê kirin, awayê **ji tevayî ber bi parçê ve** ye.

Dema ramana bineghîn tê pêşxistin, hertim serî li vê riyê tê dayîn. Bi taybet di nivîsînên zanistî de, rûmet ji vê rêbazê re tê dayîn. Lê belê li her cihî, di her rewşê de, li hemberî her kesê tû pê re daxivî, pêkanîna heman rêgezê ne raste. Li gor vê awayî têgihandinê asayî diki, kîjan bi, çi bi divê ew bê hilbijartin.

**Mînak:**

Her heyber dema têhn digre fireh dibi.

Hesin jî heybereke, dema têhn digri diwerime.

**Çûna tevayiye.**

**Ç**ûna tevayî, berûvajîyê ji tevahî berbi giştî ve ye, têgihandina ji parçe ber bi tevahî ve, ji yek jimar berbi komê ve, ji taybet ber bi gîştî veye.

Nivîsandina bi vî şêwazî hatî nivîsîn, destpêkê mînak tên dayîn, piştre digihi darezandinê.

**Mînak:**

Zindî ,dizên, jiyan dikin û dimirin.

Mirov jî zindiyeke

Mirov jî dizê, jiyan diki û dimiri. Di wê rewşê de nexwe tevayî zindî bi mirinin.

**RAHÊNAN**

**1.** Gotarên di rojnameyên rojane de cih digrin, yêkî bala te herî kêşandî bibijêre.

**2.** Gotara we bijartî bixwînin, ramana bingehîn bibînin.

**3.** Di gotara we xwendî de, we serî li kîjan riyên hizirê, pêştêxi dane ? Diyar bikin.

**d. Awênê vegotinkirinê û diyarkirina corê di cih de.**

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

1. **Di xebatên darîştinê de, hûn ji kûdera mijarekî hatî dayîn sûd digirin, çawa rave dikîn?**
2. **Hûn dikarin girêdanek çawa di navbera mijara nivîsînê û awayê wê ji xwendevan re tê ragihandin de bibînin.**

## KOÇBERIYA DI TARÎTIYÊ DE

Di sala 1974`ê de xaniyek yê me hebû, çend rojek bû, me ew xanî kirîbû û xirtûpirtên xwe anîbûyê. Xaniyek dû ode û ji boy me teng bû, lê me got xem nake, eger tenahiyek kete dunyayê , erdê me zehfe emê fireh bikin. Li pêşiya xanî, zeviyek berfireh kû dawiya wê digihişt lêvên robarî, hebû. Heman robarê kû pirek hesin bi rengê zer herdû aliyên wê bi hev ve girêdida, lewma jê re digotin Pira Zer. Li milê din yê robarî, qasî kîlometrek dûr, niwalek ne zêde kûr hebû . Di niwalê de meqerek yê hêzên pêşmerge hebû. Pêvajoya şer bû, lewma jî dîtina çeperên şerî û hêzên çekdar li her cihekê, tiştekê xwezayî bû.

Dû meh bû şer hatibû destpêkirin. Piştî derbazbûna nêzîk bi çar salan li ser pêvajoya agirbestê , dewleta Îraq'ê dest bi şerekê giran û berfireh kir. Dixwest bizava rizgarîxwaza gelê Kurd bi carekê bitemirîni. Ji bo vê jî bi êrişên zemînî û esmanî her cih û her der bombebaran dikir. Tevayî deverên di bin parastina Kurdan de ketibûn ber gef û tirsa lêdanê. Bi taybetî êrişên firokeyan berdewam bûn. Her tiştek zindî û ne zindî ji dar , ber û avan ta mirov û teba û şînatiyan bê rehmane, diketin ber êrişa bombeyan .

Lê sexmeratî vê hemû rewşa giran, dîsa jiyan berdewam bû. Ji bo xweparastinê hindek tebîrên mendenî hatibûn girtin; her ajoyek pêwîst bû, cam û derdorên trombêla xwe bi heriyê siwax biki da kû nebriqe û ji aliyê firokeyan ve neyê dîtin û bi şev jî li gelek riyên stratîjîk, pêxistina gulopên trombêla qedexe bû, her wiha pêxistina her core lempe û ronahiyekê kû şewqa wê ji derî û pencereyên malan bidin derve, qedexebû.

Êvarekê me dît dû firokeyên corên Mîgê Rûsî hatin û li ser devera em lê geriyan, lê bêy kû êrişekê li darbêxin vegeriyan. Xuyabû ji bo lêgerînê hatibûn. Dû roj piştre demjimêr nehê şevê bû, em di mal de , me karê razanê dikir, ji nişke ve girêna firokeyan destpêkir. Baş nizanim dû yan çar firoke bûn. Piştî herîq berdan û ronahiyek mezin, me hin dît xanî recifî û camên derî û pencereyan bi ser me de hûrheraşê bûn. Bombaranê qasî pênc deqîqeyan dom kir. Piştre her tişt bê deng bû. Me karê revê kir û berbi binerdên kû berê li ser lêva robarî çêkiribûn, ve bezîn. Me şêwaza bombarana esmanî ya dijmin nasdikir. Piştî lêdana cihekî bi çend deqîqeyan, êrişa dûwem ji bo derdorê dihat destpêkirin, dakû pêşî li rizgarkirina birîndaran û komkirina kuştiyan bigrin. Êrişa dûwem bi taybetî dihate ser xestexaneyê nêzîkî wê deverê.

Piştî derbazbûna demjimêrekê, me dît tiştek tuneye. Em ji binerdê derketîn hatîn malê û bi qasî pêdiviyên kesî cil û nan amade kir û em û dû malbatên cîran bi trobêla me di tarîtiya şevê de, berbi sînorê welatek cîran ve bi rêketin, lê çi cîranek! Na, berbi dagîrkerekî dîtir yê welatê me ve ! Ev gotina bav û kala hate bîra min " ji ber baranê çûne ber şirûtankê"

Belê koçberiyek di şevek tarî de ber bi çarenûsek tarî kû encama wê peymana Cezayirê û destpêkirina qonaxa dûwem ya koçberiya malbatê û bihayê wê bîst sal penaberiya dûrî welat!

**M.Îsmet**

**PEYV:**
**Xirtûpirt:** kelûpel
**Meqer:** karakul
**Sexmerat:** ruxmî
**PIRS:**
**1.** Di vê serpêhatiya kurt de,nivîskar bûyer çawa nirxandiye?

**2.** Dema nivîskar serpêhatiyê dinivîsînî ,bi we re çi hest pêşdikevin?
**3.** Gelo li gor we ,dema nivîskar dibêje bizava azadîxwaza gelê Kurd dabaşa kîjan rêxistinê diki?

**d. Diyarkirina awênê vegotin û corê di cih de : Serpêhatî çêkirin (serpêhatiyên kurt, serpêhatiyên dirêj, roman); mukur û diyar ( civat, gotar, mamik, taqîkirin, rexnekirin ,bîranîn, geryan ) " wêneyî û çareserkirin (tahlîlkirin) " ( vegotina endamên bedenî (fîzîkî) )**

Nivîsandina nivîsînê ewe kû em bi peyv û hevokan vegotin dikîn, axaftina her kesî bi wî ve girêdayî ye.Eger tu weke mirovekî zana baxivî pêkenoke ,heta dibê ku em bikevin rewşekî tengezar jî nivîsînên me divê yên me bin,kêrhatinên me diyar dikin, ev rewş ji bo me û guhdarvan rêzdarî ye, hem ji bo pêşxistina kesayeta me pir girînge.

Her corek awayek wî yê ravekirinê heye, nivîsîn bi nivîsandinekî hestê bingehîn yan ramana bingehîn bikaribi wate biki tê nivîsîn.

Hest, raman û şopandin, li gor distûrê rêziman di çarçûva armancekî de, diyarkirina wan, **awayê ravekirinê** yan jî awayê têgihandinê tê gotin. Awayê ravekirinê, awayê wî yê gihandina xwendevan girînge. " Di vê mijarê de, bi sala min mejiyê xwe westand, enîşkên xwe qerimandin, ez çawa fêr bûbim, bila ew jî fêrî xwendinê bibin" Nivîsandinek bi vî awayî ya nivîskarekî, destpêka ne serkeftina wiye. Mewlana di gotinek ya xwe de wiha dibêje:

**Tû çiqas bizanibî bizane, zanînên te, bi qasî têgihandina yê tû pêre daxiviye.**

Bi rastî jî, ger nivîsînek yan jî axaftinek neyê têgihandin, nagihi armanca xwe. Awayê vegotinê bi giştî dibin sê sergotaran de komdibin:

**Serpêhatî çêkirin**
**Mukur û diyar**
**Wêneyî û çareserkirin**

**Çêkirina serpêhatiyan ( serpêhatiyên kurt, serpêhatiyên dirêj, roman )**

Di çêkirina serpêhatiyê de endamê bingehîn bûyere. Hizir, hest û peyam di nava bûyerê re tên pêhesîn. Bûyerên dibin mijara serpêhatiyên weke çawa kû dibi rast bin, wisa dibi kû wek rast hatibi nivîsandin.

**Serpêhatî li ser sê endaman tê avakirin:**

**a. Bûyer**

**b. kes**

**c.cih û dem**

**a. Bûyer**

Serpêhatî li derdora bûyerekê yan çend bûyeran pêşdikevi. serpêhatiya li derdora bûyrekî pêşdikevi û encam digri re **serpêhatiya kurt** tê gotin.

Serpêhatî, bi beşên weke destpêk, naverok û encamê pêktê.

**Destpêk:** Beşa bûyeran dertêxê holê, kesî didi nasîn, dem û cih diyar diki. Di beşê destpêkê de xwendevan ji bo bûyerê tê amadekirin. Beşê destpêkê, divê ewqas balkêş bi kû xwendevanan bi serpêhatiyê ve girêbidin. Ger di beşa destpêka serpêhatiyê de, pêkanîna wêneyîkirina(teswîrî) encamê bidi hesandin, ne raste. Têgihandinên bi vî awayî pêwîste ji naverokê re bê hiştin. Beşê destpêkê ji paragrafekî yan jî ji çend paragrafên kurt pêktê. Ev tixûb, nivîskarê serpêhatiyê diyar diki. Ya bingehîn destpêk li gor encamê hinek dirêjtir, li gor naverokê kurtir bi.

**Naverok:**Naverok, beşa herî dirêj ya serpêhatiyêye**.** Di vê beşê de xwendevan çûna bûyeran dişopîni, encama dihizirê, ji kesan yekî bi xwe re beramberdiki, bûyeran bi awayekî agahiyên xwendevan zêde biki rave diki. Di cihê buyer baş hatî girêdan de asta mereqa xwendevan digihi pileya herî bilind . Ev xala serpêhatiyê dawiya naverokê, destpêka beşa encamêye.

**Encam :** Ev beş, serpêhatiyê bi dawî diki. Di vê beşê de xwendevan, merezê (sir)ê bûyer yan bûyeran fêr dibi. Ger xwendevan di xiyalên xwe de hatibi xapandin, xweşiyê dibhîse. Xurûş cihê xwe ji dilxweşiyê re dihêli. Heya di xiyalên xwe de hatibi xapandin jî, ji vê xurûş û dilxweşiyê tam digiri. Lewra vê carê, xurûşek ya ji şaqisbûyînek, ji encamek em ne li bendê çêbûyî, jiyan diki.

Pêwîste beşê encamê ne dirêj bi. Lewra xwendevanê gihayî dawî, vekirina ziraviya (ayrinti) bala wî nakşêni, wan naxwîni, nexwendina xwendevan ya paragrafekî, nîşana lewaziya nivîskare.

**b. Kes**

Di serpêhatiyan de, bûyer li ser kesan re derbaz dibin. Ev kes Qehremanê serpêhatiyêne, di serpêhatiyê de, tîpa bi peyvan hatî diyarkirin, pêwîste li gor rastiyê bê diyarkirin. Kesê kû tê zindî kirin, pêwîste milê wê yên bi bûyerê ve bê girêdan derkevin pêş. Ji ber vê sedemê ne tevahî taybetmendiyên kes, aliyên wî yê diyar têne destgirtin. Wêneyîkirina beden (fîzîkî) û mergî ya kes diyardiki. Ger bê xwestin li gor mijar û bûyerê bi devek cûda tê axaftin.

Di serpêhatiyên kurt de, tenê tevgerên kesî tên wêneyîkirin, sedemê tevgera bi awayekî giştî lêkolîn naki. Ji vî corê wêneyekirinê re dahorandin jî tê gotin. Dahorandin( tehlîl ) piranîn di romanê de tê bikaranîn.

**c. Cih û dem**

Bûyer di nava demek kû cihek diyar re derbaz dibi. Weke di jiyana rastî de, her bûyerek hatî holê cih û demek ya wê heye. Cih û dem di beşê destpêkê de tê diyarkirin. Di nava vekirina bûyerê de, bi tevgerê kes ve cih û dem jî tê guhartin.

Odeyek, darek, darîn, gund, derya, cihê xişîna berfê, şemendefir (tirên), çiya û yê weke van her tişta tê bîra me, dibi kû bibi cih. Têgeha dem, di serpêhatiyê de nayê wateya diyarkirina dîrokê. Weke tê xwestin werzek, demek; heya ji derveyî demê bê, dibi kû raweyek bibi demê bingehîn yê serpêhatiyê.

**Gotûbêja Di Serpêhatiyê de**

Di çêkirina serpêhatiyê de bûyer, ji derveyî kesê jiyan kirî (kesê yekem ) " çûm, hatin, ketim," yan ji derveyî kesê siyem yê bûyerê dişopîni "çû, hat, ket", bi vî awayî tê ravekirin. Ji van re navê gotûbêja serpêhatiyê jî tê gotin .

**RAHÊNAN**

Serpêhatiya bi navê nasnama mûçeyê ( ratib ) bixwînin, endamên kû serpêhatî çêkirî diyar bikin.

**Mînaka serpêhatiyê**

## NASNAMA MÛÇEYÊ

Egîd beg dema bi hola Beyazîd'ê re derbaz dibû, herdû destên xwe li kaba xwe dida, rasterast rawestiyî; wax wax! nasnama mûçeyê xwe li cihekî ji bîr kiriye. Wax li kûderê jibîr kiriye, bi tû awayan nayê bîrê. Wax, ger dema kû kirîn firotin kirî hiştibi li cem firoşgehekî, kesekî ne di cih de girtibi û biribi wê çawabi? Wax yê bigeri bigeri nebînî, yanî ji bo derxistina nasnamê, heya van mijûl bibi û rawesti? Wisaye, yan divê destpêkê ji rojnamê re agahdarî bê dayîn, piştre emê kaxeza navnasiyê ya taxê derixîn; hêj heye di kîsikê cûzdanê de kaxeza dawî anîna leşkeriyê jî heye, ya rebî ! ya xweda bigihîne destê xweyî ev, tev yê nû derkevin ax ax ....

Bê hiş, carek din kulm li serê xwe dan: Xwe dîtî heya niha ji tengbûnê rizgar nebûye. Çûbû kû yan kopalê xwe yan sîwana xwe yan jî berçavkên xwe jibîrkirine, dema êvarî dizivirî malê, ji jina xwe Xezalê gelek gotinên kirêtê pêkhatî dixwarin. Guneha jina wî, heya niha ma hindik daye qîra, hindik arîkarî ji zilamê xwe yê teng re kir? Wax wax, ger pîreka wî Xezal, vê bibihîsi wê herdû destên xwe bêxi kêleka xwe, çavên wê yên girovir yê wek hêkekê biwerimi. Belkî wî darê tenûrê yê di destê xwe de, li serê zilamê xwe bidi.

Hizirî :wey mejiyê vale, wey beredayî, wey beredayiyê mejî ne avdayî, te li quncika kîjan dojehê kîsikê nasname ji bîrkir? Li kîjan dojehê? Di çayxana taxê de? Li koperetîfê? Li cem çiyayê Qehwevan yan di bazara Misrê de, te hêla li cem Hesen Elî ? Li kû ? Li kû?

Niha di serî de tê xwestin heya bazara Misrê, Egîd beg bi lez û bez bêhn veşirî heya wê derê bi rêve çû. Li ber firoşgeha biçûk ya Hesenê Elî rawesta.

-Merheba birêz Hesen, dema vê sibê min ji vê derê zeytûn kirî, min tûrbeyek li vir jibîrkiribû?

Hesen'ê Elî bi wan diranên xwe yê spî beşişî bi awayekî tecwîdî bi Erebî bersiv da:

- Te li vê derê tûrbeyek ji bîrkir ... Ax ax ...
- Neke birêz Hesen, li van deran binêre, pir pêwîste ....

_ Egîd begê tû bi xwe binêre... Tûrbe li vir nîne ....

Hesen begê dest bi kenekî kir, kû bazara Misrê bi xwe re xerîk kir.Taxa Egîd begê li deriyê Mêrdîn'ê bû. Li Seyran Tepe gelek li benda tirampêlê ma, di nava qerqeşeyek ewqas xirab de bû kû hestiyê mirov dişkîni, heya bi deriyê Mêrdînê hat. Li kaşa hespan siwar bû nebûyî, gihişt derê firoşgehê:

-Merheba bira... Min nasnama xwe ya mûçe, kaxeza dawîkirina leşkeriyê winda kiriye. Ez hatime van deran lê bigerim. Beyanî min li vê derê nehêlabû ?

- Tû çi dibêjî Egîd beg? Ger te nasnama mûçeya xwe winda kiribi, vê mihê tûyê çawa mûçe bigrî?

-Belê bi xatirê te...

Egîd beg, rûyê wî hat guhartin, tengbû, ket çayxaneya li koşa dikanê. Li wir Ebas'ê Îranî girt:

-Erê… Ebas'ê bira, min beyanî cuzdan û nasnama mûçeya xwe li vir ji bîrkiribû?

_ Egîd beg … Ji sibê heya niha, min gişî gêrmîş, cihmîş! Men ne bîlem? Li wê derê dû pimpelêderê pala xwe dayî dîwêr û karavata di stûyê wan de xwehr bûyî, li Egîd begê dinêrin û dikenin:

-Îşev wê şerek mezin di navbera Egîd beg û Xezal xanimê de derkevi û belkî bigihi rewşa ben qetandinê! Egîd beg baş bêzar bibû. Li hember tinazkirina derdor nikarî li ber xwe bidi, kerbê girt, serê xwe zivirand da ber qîra:

-Xwîna min bi serê min de nerêjînin. Ji pimpe lêderan, pimpelêderê esmer kenek pir zêde kir:

- Eman nehilbeyî …Ji xwe têlek serê te kême, weke rûyê hinarê sor dibi!

-Heywan, devê xwe xira neke!

Lê belê zêde dom nekir. Pimpelêder pêlava xwe ji lingê xwe derxist û bi tundî li erzinga wî da.

Dû diranên Egîd begê firîn û xwîn ji devê wî herikî.

Mirovê belengaz, dema ji bo erzinga xwe girêbidi dizivirî malê, dihizirî kû şerê wî û Xezal xanimê jî wê çêbibi, ji ber wê gir gir direcifi .

Bi destekî çena xwe girtî, bi destekî jî li zîla malê da.

Pîreka derî vekirî; hêj Egîd beg di nava xwînê de dîtî nedîtî, da ber qîra:

-Mejî hişk ev çi rewşe? Ev çi rûyê tevliheve? Tû dibin ereba ga de mayî? Te ji zarokên taxê lêdan xwariye? Erzinga te kelişiye? Çavê te derketiye? Ka bikeve hundir temaşe bikim.

Egîd beg ji tirsa serê xwe kêşayî nav mile xwe, dikevi hundir. Xezal xanimê bi pêsîra zilamê xwe girtibû, weke dara tûyê dihejand:

-Dewarê Xwedê! Roja mûçe standinê, cuzdanê bihêle malê û bi xwe jî firde kolanê! Tû kor bibî, di van rojê xwedê de hişê te li kûye?

**Mukir û Diyar ( Îdîa û Îsbat )**

Piştî nêrîn, raman yan jî darezandinekî rayêxîn ber çavan, di riya pêşxistina ramana bingehîn de, sûdê digrîn û dixebitîn bidîn eşkerekirin. Ji bo vê armancê, ji corên bên hilbijartin, gotar ya herî di cih de ye. Lê belê gotûbêj, mamik, taqîkirin, rexnekirin, nivîsîna raman, nêrîn û darezandinekî diparêzin. Di beşê guhdarkirin û xwendinê de peyva mijara gotinê, konferans, panel, rûniştinên vekirî yê weke van, axaftinên bi amade têne çêkirin, bi vî awayî, bi armanca vegotinê mukur û diyar tên bikaranîn. Her yek taybetmendiyên wî yên taybet hene, emê van coran cuda cuda hûrkolîn bikîn, mînakên wan bibînin.

**Civat ( Suhbet )**

Carna nivîskar her wekû guhdarê wî heyî têgihandinek ji hundir û zindî dihilbijêri; pirsa diki rasterast bersiv didi, henekan diki, ji biwêjan sûd werdigiri; armanc, bala xwendevan zindî biki.

Ji rabûn rûniştinê heya rêveberiya welat, bikaranîna tirampêlê, heya çêkirin gemiyê, her tiştê kû tê bîra me dibi kû bibi mijara guftûgoyê.

Nivîskarê gotûbêja taybetmendiyê gelan, rewşa mergî, nêrîna wan yan li Cîhanê, awayê jiyana wan baş dizani. Nivîsînên xwe li gor vê dinivîsi, hostayê zimanê pê daxivi, ragihandinên herî baş yê hûnerêye. Ji ber vê sedemê xwendevan, ji nivîskarî gotûbêjê pir hesdiki.

Nivîskarek nêrîna xwe ya kesî, ji hundir bê kû bikevi nava vekirinekî, bi têgihandinekî xwezayî, her wekû bi xwendevanê xwe re gotûbêj diki. Nivîsînên bi vî awayî tê nivîsîn re em dibêjin gotûbêj.

## RAHÊNAN

Hûnê li jêr nivîsînek gotûbêjî bixwînin.

Sûdê ji tişta ji vê mijarê fêrbûyîn bigrin, gotûbêja kû hûn bixwînin bi taybetmendiyên sereke bi bendan li deftera xwe binvîsin.

**MÎNAKA GOTÛBJÊ ( soyleşi )**

## NEKAMÎ (DEDIKODU)

“ Ma nekamiyê kî napejirîni... Ez bes bi gotina jê hes dikim, ranawestim, ji kesê nekamiyê neki hesnakim. Kesê nekamiyê neki çi daxivin? Bi carekî mirov dema di axaftinê de zêde dabaşa xwe biki şerme, li hember derketina xalekê kû te nepesinandî, asteng diki. Dabaşa mirovê wî nas biki û mirovê di civînê de amade naki, hûnê pirsa rewşa wî bikin, tiştekî tû bixwazi fêrbibi hebi, tûyê bipirsî, piştre tûyê derbazî tiştek din bibî, lê gelo kesên bi wî awayî bizani baxivi mane? Dema çar pênc kes tên cem hev, hema dinêri yek pesna yekî diki, ji bo dixwazin bê pesindan, ji bo wê, pesnê hevdû didin. Ez rast dibêjim, beramberî min kesek pesnê min bidi, kî dibi bila bibi, bê aramiyê hîs dikim, durist nedurist heya nahizirim jî, nizanim çi bêjim, hewldidim mijarê biguherim.

Ji bo fêrkirinê carna guhdarkirina axaftvan baş dibi: Ji we re dadmendiya cihê we nedîtî têdigihîni, di derbarê pirtûka we xwendî de nêrînê didi, eger bêyî xwe mezin biki, bêjin, bi awayekî şîrîn guhdarkirina wan şayane, lê belê ew jî herdem nayên kêşan. Mirov di dawiyê de, dixwazi tiştê dizani yan gotinê kesê dizani veki. Emê ne bes bibin guhdarvanê wêne û konferansê, belkî emê bibin axaftvan.

Hûnê bêjin gelo ma nabi kesê em nasbikîn bê kişandina vir de wê de, bes milên wî yên rast bêjin? Erê nabi! Ka biceribînin, ji kesekî baş re hûnê bêjin başe, belkî hûn çend gotinên din jî peyda bikin, lê piştre hûnê rawestin. Lê belê dema hûn dabaşa nebaşî, gêjayî, bê hizirîbûyîna kesekî dikîn, gotin gotinê vediki yê li hember te jî gotina dixwazin bêjin peyda dikin. Hûn dixwazin dostên we dema we nebînin dabaşa we bikin, we bi bîrbînin? Ji wan re hinek kêmasiyên xwe diyar bikin, li cem wan ji hin kêmasiyên biçûk nerevin, ne wisan bi, ger hûn were bîra wan jî boneya dabaşa te bikin nabînin.

Nekamî hunerek giranbihaye. Mercê wê yê destpêkê pêwîstî pê dîtine. Ji bo meremekî kesê bixwazi xirab nekamiya yekî biki, ne şayanê nekamîkirinêye. Min wisa pir dîtin .Yek hebû navê wî ne pêwîste, min ji wî mirovî hes dikir; min dizanî ne kesekî pir bi hişe, tiştên li bingehê hevdû dida, her wekû tiştekî dizanî dikir. Lê min digot mirovek başe, şevekê kesekî erkdar li wir bû, di civînê de nehêla kes devê xwe veki, ez dibêjim dû demjmêr sê demjimêr ji vî erkdarî re dabaşa hevalê xwe yê karker dikir, dixwest tim xirabiyê bi wan ve biki. Em tev bêgêwilbûn. Lê elhemdulelah rûmet ji gotinên wî re nehat dayîn, ji ber kû heya hingê min jê heskirî, min ji xwe şerm kir; niha ez jê direvim, ez ditirsim rastî wî werim, ji ber ez nikarim durûtiyê bikim û heskirina berê nîşan bidim.

Li milekî din, li ser hoyê taybet, namûs, durûtiya kesekî naxwazim nekamiyê bikim. Dibi kû kesek ji malbat yan jî mirovê kesekî xwe tevlî namûsiya wî bikin; ne ji mafê kesekî dine kû xwe tevlî biki. Em dikarîn ji kesê pê re daxivin, ger di axaftinên wî de kêmasî derkevin, di tevgera wî de tiştên ne di cih de derkevin yan jî di karê wî de kêmasî derkevin, dikarin jêre bêjin; ji ber ev girêdayî jiyana wî ya gîştiye. Heya di derbarê hoyê kesekî de ez dibêjim hoyê tê fêmkirin çiye? Eger pir girtî bin, nikarin tevlî bibin; me çi jêye? wisan li xweşiya wî tê wilo diki. Lêbelê hûnê bêjin:

" Em jî dixwazin li ser hoyê mirovan nekamiyê bikîn, ji ber em jî, ji wê hesdikîn" Birastî zêde bersivê jê re nabînim. Lê çima ez derewan bikim, li hemberî we dilê min lê didi, bi rastî ji we hes nakim."

**GOTAR**

Nivîsîna herî girîng ya core vegotinên mukur û diyar yê armanc digri gotare. Gotar di rojaname û kovaran de tê weşandin. Gotara bi mijarên nû di destpêka rojnamê de cih digri. Ji vê gotarê re, gotara sereke tê gotin. Di kovaran de jî gotar tên weşandin. Lê belê gotarên di kovaran de tên weşandin, li ser mijara giştî û civakê têkildar dibin.

Armanca gotaran, bi mijarên aliyê wan yê zanistî li pêş, xwendevanên xwe ronî diki û raya giştî pêktîne. Armanca bingehîn ya gotarê perwerdekirina xwendevane.

Erkê herî girîng yê gotarê, bandorkirin, berdan (yonlendirme), perwerde û gihandina xwendevane. Ji ber wê, pêwîste nivîskarê gotarê, zimanek pir baş bikarbîne. Pêwîste nirxê civaka kû di nav de jiyan diki, baş bizanibi, ya bingehîn bi şêweyên zanistî ve girêdayî bimîni û binvîsi. Bi taybet gotarên di rojnamayan de cih digrin, dema mijar tevayî civakê têkildar diki, nivîskar divê hin bi hestyartir tevbigeri. Li milê din, di mijara gotarê de divê nivîskar pispor bi; ne pispor jî bi, divê di wê mijarê de lêkolînek baş biki, ji bo ne xapandina xwendevan ev pir girînge .

Neçare gotar hişk û hişk bi distûrên ziman ve girêdayî bi, têgihandinek girîng bidi. Di gotarê de, ji bo kû ramana bingehîn bê hawêjkirin (benimseme), gotina didi pêş, pêgirên davêji holê, mînakê didi, pêwîste heya dawî vekirî, bên têgihîştin û bawer kirin. Xala kû gotar jê derdikevi, heya cihê digihi jî, pêwîste “ rast ” bi.

Gotara xwe nepesêre rastiyê, ji derveyî nêçîrvaniya gel (demogoji) ne tişteke. Ji ber vê gotara hûn bixwînin, temaşe bikin, xwe dipesêre çavkaniyek bi tendurist. Li gor wê pêwîste em biçin darezandinekî.

**RAHÊNAN**

Mijara li jêr ,ji gotarekê hatiye girtin. Di vê mijarê de taybetmendiyên kîjan gotarê tên dîtin?

## CIVAKA ŞARISTANÎ Û KURD

Civaka çînî bajaran pêktîni, bi bajarî re nîvîs, huner û zanist zû pêşdikevi. Damezirandina dewlwetê, qewareya (kapasîteya) raman û çalakiyê pir pêş de dibi. Bi hatin û derketina aboriyê re şîniyên zêde, dikarin bi hev re bijîn. Kurd ne kû kêrnehatîbûn, berûvajî ji ber kû kêrhatîbûn, di welatê xwe de mukurê jiyanek azad bûn, belkî ji vê yekê, ew ji derveyî pêşketina sîstema şaristaniyê mane û bûne kole. Lê bi saya berxwedana azadiyê hebûna xwe parastine.

Pêşketinê wek azadî destnîşan bikin ,belkî jî kurd di dîrokê de ,gel û koma etnîka herî pêşketiye. Di şaristaniyên navenda Mezoptamya de ku berî zayînê heta sale 330 tên ,statyoya eşîrên kurd li herêmê xwedî cihekî payberze,xwedî taybetmendiyê welê ye, li têkiliyên pêre tê gerîn. Jibo vê yekê çavkaniya herî baş çîroka Heredot e. Wexta Heredot tim û tim behsa Medan dike, îşaret bi hin meylan

dikê ,ku wê demê civaka pêşketî ya Grek bi hevkariya Medan guneh bar dikin ,Kurdên wê demê Med van taybetiyên xwe deyndarê nasnameya xwe ya azadin.

Dînê Zerdûşt ji aliyê exlaqê azad ve dînê herî xurte , di warê têkiliyên jin û mêran de nêzî sîstema wekheviyê ye. Nîzameke wekheviyê ya îdîal salox dike,jin û mêrîtiyek baş wek fazîleteke neqane dihesibîni. Qîmetê didê mezinkirina zarokan û rastî, wek pîvana yekemîna perwerdê ye. Pir girînge ku mirov derewan neke . Di nav dînan de yê herî zêde balê dikşînê ser parastina teba û hewîrdorê ,di xurtbûna malbata kurd de bandora zerdûştiyê eşkere ye ,hê jî ev kevneşopiyên mîna yên zerdûştiyê li cem Êzîdî û Elewiyên kurd geş û zindî ne.

**Ji paraznama gelekî ya A.Ocelan**

**Fikra**

Fikreya ku weke nivîsîna rojname û kovarê, cûrekî yê nivîsînê ,ya kû mijarekî tavêje holê ,wê diparêzê lê ,ji xwendevanê xwe re,diyar (îsbat) naki ye . Awayê misoger ya kû di gotarê de tê dîtin ,di fikreyê de ,ne di plana yekemîn de ye . Nivîskarê fikrê jî dixwazi ,nêrîna wî bê pejirandin,lê ne neçare kû ,nêrîna xwe bipesêrê rastiyên zanistî. Fikre,mijarekî bala me dikşêni ,rojeneya wî digri ,dixwazi em binirixînin ,dibi arîkar kû em jiyana xwe li gor vê ber bindinê. Wek mirov bêje ,nivîskarekî yê fikrê ,ji beriya her kesî ,di derbarê ezmûna zankoyê de,nirxandinekî diki,di derbarê wê mijarê de dibê ku ji xwendevanên xwe re serbena bidi .ger em ji rojanameyên rojane re demekî veqetînin, herî kêm yek, didu, nivîsînên quncikan, bixwînin pêwîstiyek dest jê nayê berdane.

**RAHÊNAN**

Fikreya li jêr bixwînin û hewlbidin kû ramana bingehîn bibînin . Mînaka fikreyê

**LEKLEK**

Salekî min lekek ne didîtin,heya kêm hatina, vê firendeya gerok ,bala gelê Botan'ê kêşandibû. Piştre em fêrbûn kû gelê Misrê ,nizanim ,ji ber çi sedemê ,van firindeyên giran biha ,bi tamikên jehirkirî dikujin.

Roja borî di kolanê de ,di demekî, ez li ber tava rojê, bayê êvarê ,li min dida,diborîm. Bi carekî bi dengê leklekê ya ji serban hatî ,ez rawestiyam.

Guhê min yê kû ji dengê dosta xwe xerîb mayî, bi dilxweşî di nava beşişînê de bûn pêl.

Leklek ne firindeya havînê ye ,bixwe havîne.Tikir tikira wê bi nikilê sor,wek germiya tîrmehê ,ya bûyî denge. Li ser bixîriyê awênê lekekê li aso ya ezmên dixuyê,li ser hêza me ya xiyalî çi zêde naki: Ezmanekî bê dawî yê di nava şînatiyê wî de mirov bê hiş dibi ... Bajarek biçûk yê spî û bi minare yê di geliyê şîn de hatiye veşatin ,şevekî kesk ya cihê xwendina kundoka ya tê de darên spîndar guliya xwe dihejînin....Şevek germ ya sahî... yê pala xwe dayîn dîwêr veşartî daxivin û li benda derketina heyvê ne,jinên bisk reş,lêv sor ,yên xwedî gerdeniyê zêr û mircan .... Li ezmanî şevek ketî,rijandina stêrên mezin...Di nava tevayî van stêran de hizirîna leklek û dengê wê ...

Bê guman leklek firindeyeke wênekêş ,helbestvan ya jibo pêkanîna gelek karan ,hizirîna gelek tiştan ,hatî afirandine,ji ber wê Misriyên gundî ,yên potperest ,bawer dikin ku ev firinde ji ber pir xweşike kêr wan nayi , jiber wê diwêrin vê firindeya xweşik bikujin .

**TAQÎKIRIN ( deneme )**

Taqîkirin ,core nivîsîneke di sedsala XVI an de di bin rêveberya nivîskarê Firansî Montaigne ( Monteyîn ) de derketiye holê .

Nivîskarê taqîkirinê ,ramanê xwe yê derbarê mijara avêtî holê de ,dema hestê xwe tîne ziman nêrînên xwe napesêrê mukerekî , nakeve xema nebawerkirinê jî ,serbixwebûna kesî, taybetmendiya girîng ya taqîkirinê ye. Nivîskar di corên taqîkirinê de ,di corê taqîkirinê de têgiha“ Ez çawa cûdame ,nivîsîna min ,nêrîna min ,zimanê min jî cûdaye ;ger bipesinînê bila bixwînî.”şaşe. Lêbelê ev nêrîneke, nayê wê wateyê kû di nava ziman û têgiha taqîkirinê de pirin. Berevajî wê taqîker neçare zimanê xwe baş bikarabîne .Jiberkû di taqîkirin de pêwîste ziman bi bandor ,tîgihandin zindî be.

Xwendevanê taqîkirinê di nava demê de,hişmendiyekî fenûfît bi destdixê , rêvebirina bi hiş,derxistina encamê; mirov ,xweza ,civak,polîtîka corenivîsînên weke pîşesazî, agahiyên giştî didin .

Her kû diçê dibi kesekî xwediyê çandê . Li gor karanîna xwe nivîsînê bi hostayê û bi taqîkirinê bixwînin û li ser bihizirin.

**RAHÊNAN**

Mînaka taqîkirina jêr bixwînin ,li gor agahiyên we girtî taybetmendiyên vê core nivîsînê diyar bikin.

**MÎNAKA TAQÎKIRINÊ**

## LI SER GUMANÊ

“ Pyonîstvanek dema derdikeve ser sehneyê,ji ber xurûşê ewe namire,lê dema dest bi lêdanê diki, şopa xurûşê jî namîne ,çi wate ji vê re tê dayîn?

Hûnê bêjin ;wê demê êdî dema wî ya tirsê bihizrê nîne . Raste, lê ez bawerim, **tevgerê tiliyê** hozanvanekî ,tirsê ji holê radikin û tavêjin ,li gor min ev nêrîn rastire . Ji ber di laşê me de ,her tişt bi hev ve girêdayî ye. Dema kû dil vehêsayî nebe tilî jî vehêsayî nabi,weke hişkbûnê ,sistbûn jî laşê me hemûyî digrê nava xwe, ev awa eger laşek baş û bi rêkûpêk ,bê birêvebirin ,cih ji fikaran re namîni. **Dema nexweşiyek me bigire ,tişta me ji vê nexweşiyê rizgar bike ne hizirîn ,tevgere.** Bihizirîn ,weke em dixwazin ,ger tevgerên me tiştên em fêrbûyîbin,tevgerên em dixwazin emê bikin.

Demê kû em teng bûbin hewldana darizandina tu kesî nekîn,lewra darizandina me dê derkeve hemberî me ;bes hewldana bi tevgera bedenî bikîn;encam wê,dê me matmayî bihêle . **Bi vî awayî mamostayê me yê rêberî (rehberlik) yê me rê bike cem mamostayê werzîşê** .

Ajoyek yê balefirê (pilot)têdigihînê ;demê kû li benda belavbûna mijê bûm ,du demjimêran li pey hev li ser zirçik razayî ,ketibûm nava fikarê ,li hember tirsnakekî ne di dest mirov de ,min tirsnak yek yek di ber çavan re derbas dikirin ,piştre derbazî ser firokê dibûm, diçûm hewa ,şopa wê tirsnakê nemabû. Demê kû laşê me ferman nedigirt ,qumanda dida destê xwe;lê wilo bûbû kû di heman demê de ,min nikarê bikevim du rewşan ,destek dibê kû vekirî be ,hizra tengbûyî firîbê cûbê. Lê destê xwe bişdîne ,hemû tirsnakê we di singa xwe de veşartî winda dibi . Ger hûn bihizirin em vê hilbeyîn ,yan ne holbeyînin hûn dikarin pêşiyê bigrin? Na lêbelê hûn dê

bikari bin ,nerimbûnê bi serbixin. pêşî li îskilokan bigrin . Tevgerek bedenî dermanê herî xurt li hember xurûş û tirsnakê ye. ”

**PEYV:**

**Pyonîst:** kesê li amêra piano yê didê
**Vehêsayî:** rihet
**Zirçik:** çîm
**Fikar:** dudilî
**Tirsnak:** tehlîke
**Qumanda:** amêra pêxistina pergalekî
**Hilbeyîn:** hilbizîn
**Îskilok:** di şona peyva sersorman de hatiye bi karanîn

**REXNEKIRIN**

Berhemên pîşeyî û wêjeyî ,her kes di her demî de bikaribi kurahiya wan têbighê,şîrove biki, ne gengaze. Berhemên bi vî awayî tenê kesê, di mijaran de pispor dikarin şîrove bikin. Her demê kesên bermayên wêjeyî û pîşeyî dinirxînin, rexnekerin . Xwendevan dema nivîsînê rexneker dixwînin ,di derbarê vî bermayî de dibin xwediyê agahdariyên hîn firehtir. Xwendevanên kû di derbarê mijarê de xwedî agahdariyên fireh , ji wê berhema dixwînin, hîn bêhtir tamê distînin ,bi demê re tişta xwendî ,datîne ser zanînên xwe yên heyî ,hêrsa asayî fireh diki. Kêrhatinên wî yê têgihandina tişta xwendî şîrovekirina wê zêdetir dibi.

Nivîsîna bermayekî wêjeyî û pîşeyî ,hûrkolîn dike dinirixînê re **rexne** tê gotin. Di rexnekirinê de berhem tên nasîn ,di aliyê wêjeyî û dîroka pîşeyî de, rûmetê datînin holê ,milê wê yê serkeftî û binkeftî diyar dikê .

Di wateya îro de mînaka rexnekirinê cara yekê ,di nava sedsala XVII `an de li Firansa derketiye holê .

**RAHÊNAN**

1.Rexneya li jêr bixwîne ,lêkolîn bike. Raman çawa hatine parastin ?Bidin diyarkirin.

MÎNAKA REXNÊ

## BERSIVA PIRSÊ

" Dema ez dibêjim: " min girt kew" Hûn vî awayê binçînekirina min napesnînin ,hûn dibêjin; ev li dijî çêbûna zimane. Hûn tînin bîra min kû hinek zagonên ziman hene, pêwîste neyên tengavkirin. Hûn dibêjin: "Di hevokekî de têgir li pêş ,li pey wê kirek ,lêker û dawî jî kirine " Yanî divê em ji qalibî ,dernekevin . Mînak : Divê em nebêjin ,"Ji Amed'ê doh Egîd hat. Divê em nebêjin Egîd doh ji Amedê hat. Ger vêca em bêjin. Egîd hat doh ji Amedê ." Hûnê ji binî destûrê nedin ,bikaranîna bi vî awayî. Divê ileh em bêjin " Doh Egîd ji Amed'ê hat." Têgir ,piştre kirek piştre lêker herî dawî jî kirin" Em wilo bihizirin, ev her çar binçîneyên li jor ne yek in.Ez wilo dihizirim, emê bipejirînin ku zimanê me ,hatiye zindankirin .

Minê ji we re bigota "Di şeqam ,bazaar û di malên me de, weke min nivîsî tê axaftin " Lê hûn bûn asteng ." Di hin cihên nivîsînê we de ,dema bi gel re daxivin carna tû dibînî kirin destpêkê ,piştre lêker tînin. Dema kû hûn dibêjin gelê çewt daxivin,ez bawerim hûn behsa van nivîskaran nakin. " Keremkin, ger hûn bêjin ,kesê kirinê li pêşiya kirekê bikarbîne, çewt daxivin, pêwîst nake…Hûn vê darizandinê ji kû tînin? ,Lê di hin cihan de kirin li pêşiya lêkeran tê. Ez vê jî tênagihim ,hûn ji kû tînin. " Ji mêj ve Egîd gihaye cihê biçiyê " Dema wilo bê gotin ,ma şayane ku em bêjin çewte ? Li gor min ne wilo ye. Di vê mijarê de cûdabûnekî ev çewt daxivin ev baş daxivin nikarin çêbikin ,li gor min di zimanê gel de, ev distûrên hûn dibêjin nînin. Firansiyekî nasê min hebû ,li Amed'ê mamostayî dikir ,rojekê ji min re got : Hûn evê guhartinxwaz dernakevin nav gel ,hûn li trimbêlê siwar nabin ,mûawin ,bang dike, hene yên bêne Batman'ê, ma em vî mûawinî şaş binirxînin yan jî dema dibêjê hene yên peya bibin şaşe ?

Gelek awa hene di zimanê gel de ji tirsa tişta kû em pê daxivin em newêrin di nivîsandinên xwe de ,dema em tişta dixwazin bikarnyînin em zimanê nivîsînê bê tam dikin. Jiber gotina em dibêjin gelê çewt daxin, vê dikin .

**BIRANÎN**

Bîranîna kû di nava cûre nivîsînê wêjeyî de ya heya dawî belave,bûyerên balkêş yê demê borî ,kes ,rewş û têgihandina cih jî pêwîst dibîni.

Ji nivîsînê tişta bi serê nivîskarekî de hatî yan jî nivîskar bixwe bûye şahidê bûyerê radigihînê re **bîranîn** tê gotin. Bîranîn, pêwîste xwe bipesêri rastiyê. Zimanê wê sade, têgihandina wê ya bi bandor, bîranînên hêza kişandinê heyîn ji aliyê gelek kesan ve bi zewq tên xwendin .

Nivîsandina bîranînê , ne bûyerên berbazbûyî tenê ,tînin ziman. Pêvaoya nivîsînê di aliyê ramyarî ,civakî, aborî heta taybetmandiyên çandî jî datîne holê,jiber vê ,core nivîsîna bîranînan,corek yê ji dîrok re jî roniyê digrê ye.

Li gor tê zanîn ,bîranîna herî Kevin berhemekî yê çarsed sal berî zayînê ye. Di sedsala XVII an ,ev berhem hatiye pêşxistin ,di heman dîrokê de roman jî hatiye nivîsîn ,berhema herî girîng ya bîranînê ,di sedsala XV an de berhema bi navê **Babûrname** Ev corê nivîsînê berhemekî destpêkê ya herî girînge.

Piştî wê gelek bîranînên pêşketî derketine holê.

**RAHÊNAN**

Bîranîna li jêr lêkolîn û hûrkolîn bikin.

**MÎNAKA BÎRANÎNÊ**

## BIRYARA HEVAL

Rojek ya zivistanê dinya sarbû, bayekî pir dijwar dihat ,carekê min dît dingê kesekê hat. Ji nişkave derî vebû . Bi vebûna derî re ,ciwanekî rûken, bi rext pêçayî ket hundir. Piştî xêrhatinê, em rûniştin, min jê pirsî, tû kî yî , tû ji ku ve têyî ,tû wê çi bikî? Got :“Ez ji aliyê hevalê Bahoz ve hatime şandin, ji Cûdî têm . Navê min Biryar e ,jibo karê mamostayî yê bikim hatime.” Ez pir şabûm ,jiber beriya hingê, min ji hevalê Bahoz daxwaza hevalekî di karê mamostayî de pispor kiribû. Ji ber dibisatanên me nû vedibûn ,em bixwe jî di hunerê mamostayî de ne têr bûn . Her çiqas dibistana me ,refa yekê ya seretayî jî bû;hijmara xwendevanên me derdora bîst kesan bû jî;lê jiber yekemîn dibistan bû ,rêvebirina wê bargiraniyek çêdikir. Bi hatina vî hevalî min xwe di nava vehesandinekê de dît. Pirştî derbaskirina şevê .Sibê di demjimêr 8 `an em çûn dibistanê, piştî venêrînê hevalê Biryar dest bi dersa peyvnasiyê kir .

Li milekî rûgeşiya heval ;li milê din jî nûhatina wî bala xwedekaran dikêşa,tevayî xwendevanan bi baldarî li waneyê guhdar dikirin. Di nava axaftinê xwe de ,carekî min dît, pirsa navê deriyê ji

derve kir. Hinek xwendekaran gotin deriyê ji derve ,hineka deriyê salonê ,hinekan jî deriyê eywanê digotin. Lê mamosta Biryar bersiva yekî jî nedipejirand ,weke bersiva rast dîşqapî dida ragihandin ,piştî wê zîla bihindanê lêdida ,xwendekar derdiketin ji derve . ez dikaniyam. Li ser kenîna min heval dipirsî:“ Ma şaşîtiyek hebû?”

-Na ,lê ez bawerim çend gotinên neyaran nekarî biguherin ,emê biguherin jiber rast deriyê ji derve bû .We weke dîşqapî da nîşandan ji ber wê ez kenîm. Min got peyvekî Turkiye. Piştî pêhesînê, heval jî dikenî û digot: “ Çawa bandora Turkan hat gel me,ez ji bandore Ereban ditirsiyam ,min xwe ji wê diparast ,lê min ne dizanî kû bandora Turkan dê xwe li herêma me jî nîşan bike.”

Demjimêra duwê jî destpêdikir ,di demjimêra duwê de mamosta Biyar dixwest xwendekaran nasbikê,yek yek bi rêzê ve ji wan daxwaza xwe nasandinê kir. Piştî xwendevanan xwe da nasandin ,wane bi dawî dibû, em dizivirîn malê. Di zivirandinê de ava ji serê dehla diherikî û di nava gunde dibû du çiq riya me dibirî ,heval xwe li ser coya avê re avêt, û wiha digot: “ Ez bawerim dê mamostayî hinek zor were ,jiber demek dirêje ,em ji zarokan dûr mane ,her çiqas bi zarokan re jiyankirin xweş bi jî ;ewqas jî zore.”

Piştî zivirîna malê, mamosta Biryar ji ber kesekî durist, bê goman û girêdayî riya azadiyê bû,rewşa xwe ya borî ,zoriyên xwe yê derbazbûyî, tanî ziman,lê dema dabaşa zoriya kêşayî dikir ,şûna xemgîniyê ,bi rûkenî axaftinên xwe didomandin ,axaftinên wî hêzekî mezin dida derdor ,bi vî rengî demekî dirêj ,em bi hev re man. Di aliyê rewanî de ,hêzekî mezin dida. Bi wî hevalî re me dikarî di nava bê derfetiyê de ,dibin gulebarana topa ,avêtina qazanan ji firokan dihatin de karê xwe bimeşînin.

**M.Şîrîn**

## GERYAN

Mirovên dixwazin li cih ,bajar, herêm û welatê ji derveyî yê xwe bigerin û bibînin. Berê di guhertina cih de dilxweşî hebû ,jiber wê hatiye gotin cihê we di demê geryanê de nedîtî, di geryanameyan de di derbarê wan de bixwînin û fêrbibin. Pirtûkên geryanê (seyahetname)bermayiyeke pir ji Kevin ve bi baldarî hatî xwendine. Bi taybet nivîsînê kû di derbarê cihê em nikarin bigihênê wek:

“cemser” yan di derbarê welatên dûr de agahiyê didin ,xwendina wan xurûşê didê me.

Ji wan cure nivîsînên cihê geryaiyî û dîtî ,agahiyên komkirî, tiştê hîskirî , radighînê re **geryaname** tê gotin.

Nivîskarê hosta ,agahî û hestên di derbarê cihê geryayî û dîtî de ,bi zimanekî balkêş têdigihînin.

Di dîrokê de yekemîm geryaname piştî zayînê di sedsala V an de derketiye. Berhemê ( Priskos ya ji Atîla re hatî şandin ) Berhemên girîngê destpêkê yê corên geryanama di sedsala XIII û XIV an de ji aliyê Venedik Marko Polo û gerokê Ereb Ibin Betota ve hatine nivîsîn.

Gelek wêjevan yên kû bi eslê xwe Kurdin yên weke Ewliya Çelebî….Di berhemên geryan nameyê de rolekî mezin leyîstine . Lê mixabin ji ber bindestiyê bi zimanê wan yê zikmakî berhemên wan nayên dîtin .

**RAHÊNAN**

Geryanamaya li jêr lêkolîn bikin ,taybetmendiyê corê wê diyar bikin.

## KELA FINIK

Kela finik bermayekî dîrokî yê Kurdistanê ye. Li pêşiya wê Dîcle ,li pişta wê çiyayên bilind ,serê xwe bi ser Dicle de xûl dikin,dengê avê ,kewa ,şalûl û bilbila rengê xwezaya ji darên fêkî bedewiya kela Finik ,zêdetir dikin.

Dema mirov ji cihê Memo û Zînê ji Cizîra Botan li ser pirê re berbi Şernex ve derdikeve rê ,digihê stûwê qesirikê ,li wê derê pir geryanvana dibînî, li milê çepê dizivirê di nava Dîcle û çiyayê Dêran re dikevi rê, li ber keva rê bermayê Berqertal`ê ya ji Kurdan re paytextî kirî tên dîtin. Ji wir jî diborê, dikevê binê dêran dema tû li ser xwe re li dêran dinêrî, di rewşa wê de mirov dikarê qirkirina Filehan bi awên biki.

Lê rêwîtî dewam diki ,piştî çend xulekan, dikevin nava dehlan ,ji nav dehlan derdikevin ser kela Finê ,dema tû li ser kelhê dirûnê di ser xwe re ,li cihê Egîdan Gabarê temaşe dikî ,di bin te re Dîcle wêneyê Feqê Teyran dema helbesta xwe ya bi navê hey av û av

dibêjê tê ber cavê te . Li rexê te cihê lêdana mencenîqan li ser tehta şayîk ,berxwedaniya vê kelhê ratêxe ber çavan . Li hemberî te ,dîtina xendekê êrîşên neyaran yên li ser vê kelha pîroz rave diki ,li ser Dîcle hatina kelekan jî rengê bazirganiya kevnar ,ji me re şîrove diki. Li milê rastê li ser serê Binerdiya zilamekî rûniştî peyzûka bi navê Seydiko dibêji ,peyzûka wî wêneyê Mela'yê Cizîrî dema helbesta xwe ya bi navê ey **Mela namê te ye xemse eşer** dibêjê tine bîra me .

Dema tû li nava kelê digeri li bermayiyê wê temaşe dikî, awayê rêvebirina kurda dikarî baş têbigî.

**M.Şîrîn**

**WÊNEYÎKIRIN Û VEKIRIN** ( tesvir ve tahlil )

Wêneyîkirin û vekirin ne awayek serbixwe yê vegotinê ye. Ev awayê vegotinê di serpêhatiyê de tê bikaranîn.. Wêneyîkirin,kesê dîtî, vekirin jî awayê nêrînê têdigihînî. Hê zelaltir wêneyîkirin di bûyerekî de dîtina ,heyîn ,rewş,kes,teba wilo ratêxi her wekû me wêneyê wan kêşayî têdigihê .Vekirin jî nêrîna nivîskar, bi awayê şîrovekirin ya li bûyer, kes, rewş û tebayan e. Mînak dîtina zarokekî gengaze kû bi riya wêneyîkirinê bê têgihandin.Lê belê li hemberî bûyerê ya kû dibe sedema nerazîbûnê û hestê ne wêneyîkirine.bi riya vekirinê em dikarin danin holê.

Di wêneyîkirin û vekirinê de ,endama nivîskar dibê serkeftinê ,çavnêriya baş e. Çavnêrî;bi zanistî nêrîn ,hûrkolîn ,lêkolîn û helwesta şopandinê ye. Bi çavnêriyê re kuhnebûn di wêneyîkirin û vekirinê de cihekî girîng digri. Çavdêrekî xwedî taqîkirin, taybetmendiyê pêwîst ji destbernadê,nakevi nava belaviya bê wate jî ,li milê din ji rêbaza ji tevahî hatin rêbaza herî bi bandor ya wêneyîkirinê ye. Wêneyîkirina kesî jê re portre tê gotin. Portre yên dîtina ji derve têdigihînin,portreya bedenî ;ji portraya hoy, danûstandin û taybetmandiyê derûnasiyê têdigihênin re portreya **rewanî** tê gotin.

**RAHÊNAN**

Endamê wêneyîkirinê yên di mînaka wêneyîkirin û vekirina jêr de heyî bibînin.

MÎNAKA WÊNEYÎKIRINÊ

## KELA NEBÎ HÛRÎ

Kela Nebî Hûrî ,li Başûrê Rojavayê Kurdistanê herêma Efrînê ye. Li ser dîroka vê kelê, wekû tê xuyakirin di her serdemek ya dîrokê de navên cûda lê hatine kirin. Yek ji wan “ Nebî Hûrî “ tê gotin . Navê Nebî Hûrî ji Ûrya kur’ê Henan hatiye,kû ew bi xwe jî yek ji hevalên peyxember Dawûd bû.

Di sala hezarî B.Z de Ûrya Henan di şerekî de li wê derdorê hatibû kuştin,piştre li wir hatiye binaxkirin,lewma ew nav lê hatibû kirin. Navê din wekû tê zanîn Hûrî yek ji gelên kevin kû li çiyanên Zagros û Torosan jiyandikir,wekû di dîrokê de jî bi bîr tê ,Hûrî ji beriya zayînê bi 3000 sal li ser vê axê bûn û gelê kû bi navê Kurd tê naskirin berdewamiya Hûriyane. Niha jî gelek şkeft û şûnemayên kû navê Hûrî hildirin li çiyayê kurmênc tên dîtin.

Nêrîna din girîng ya kû dibêje Hûrî şiklê eksenekê ji nave xwedayê “ Ahora Mazda” girtiye. Gotina peyxeber jî ji peyva xwedayê herdû çeman ( Nebû ) hatiye . Li gor vê nav bi vî awayî ye ;xweda ( Ahora Mazda ) bi vî rengî em têigihin ku serdema bajêr ji Hûriyan hatiye.

Lê bajarê nû hatiye avakirin navê wê Sîros e ,navê xwe ji Seloqis Nîkatûr girtiye û ew yek ji fermandarên Yewnan’ê ,damezrînerê dewleta Seloqî li Rojhilat di salên 312-280 B.Z . Ji bermayên kevnare yên bajêrê Sîros şanogeheke kû eşkêla wê 112 m û ji 24 rêze pêpilkan pêktê,dika ( sehna) şanogehê ji 48.m pêktê. Dîroka avakirina wê divegere sedsala 12-13’an Z

Ji şopên bajêr şeqameke ya sereke ,serşo û avahiyên kû di asteke herî pêşketî û afrîner hatine çêkirin .Li binê şeqemê milê jêr, gora fermadarê Yewnanî tê dîtin, li ser gorê avahiyeke bilind bi şiklê qubeyeke şeşgoşeyî hatiye avakirin û ta niha jî tevahiya qirqodeya qubê xwe parastiye. Bajar bi dîwarekî dorpêçkiriye. Niha jî di hewşa qubê de mizgeftek heye ,li pêş mizgeftê bîrek avê heye,li milê şanogehê berbi jêr de li ser zemînek çal çend rêze kanî û dar hene,ji ava van kaniyan re ava Germkê tê gotin. Wekû ji navê wê jî diyare ,ava wan kaniyan havîn û zivistan germe. Bi têkilbûna ava wan kaniya robarek pêktê û ev av tevlî çemê sabûnê dibe . çemê sabûnê jêdera ava wê ji bakurê Kurdistan tê ,li kenarên Nebî Hûrî re derbaz dibe û di nava bajarê Efrînê re diherike.

Li aliyê bajarê Sîros an jî Nebî Hûrî li milê rojhilat ,pireke kevin li ser çemê sabûnê bi navê pira Roma tê dîtin. Niha jî ev dever weke şûnema bermayên dîrokî ne,bala gerokên (tûrîst) biyanî dikşîne, xelkê herêmê jî havînan bihindana xwe bi keyfxweşî li vê gerangehê derbaz dikin.

**Munzur**

1. **Plan çi ye?**
   a. **Girîngiya çêkirina planê.**
   b. **Di vegotinên nivîskî de corên planan**

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

1. **We karkerên dîwarê xaniyê kû banê wî,dona wî ,dergehê wî hatî çêkirin yanî xaniyekî nû yê kû her tiştê wê hatî tekûzkirin,jibo bi cihkirina zerika (qazana) kalyoferê heraftî dîtine? Jibo heman armancê, dîwarê hatî heraftin,ji pêwîstiyê zêdetire hatî firehkirin hûn rastî hatin,dema we rewşên bi awayî dîtî, hûn çi hizirîn ,tê bîra we?Ger hûn endezyarê vî xaniyî bana we yê çi bikira?**
2. **Xwendekarê piştî mijara dariştinê ji mamosta bigirê nizanibe çawa û çi binivîsê,bi vî awayî nikaribe biryara xwe bide ,jibo nekeve vê rewşê pêwîste çi bike?**
3. **Hûn bernameya waneyên xwe yên heftane ,çawa çêdikin? Xebatên bi plan sûdên wê çi ne?**
4. **Hûnê gotina mezina ya kû dibêje“ bila rê bê ,bila dûr bê “ wata wê bihizin ,û sûda planê di jiyanê de çi ye? bêjin.**

## SPARDE YA CIWANÊN KURD

Gelê bi rûmet,karê me yê dibistanê bi sala zarokên we dan xerîkirin,di dawiyê de, ev dem derbaz bû ,ji berk û em di nava zoriyên şoreşê de bûn. Jiber wê sûda dihat xwestin me nedikarî bidîn,lê ji ber kû bi vê perwerdê zarokên we gihandin pleyên jor û bûn hêviya pêşerojê ,em xwe pir bextyar dibîn.

Gelê bi rûmet ,êdî ev dibastanên me dîrokin,di demê azadiyê de ,dê li ser awayê wane dayîna van dibistanan û zoriyên wane bên

amadekirin. Ev dibistan bi çi awayî gihane vê pleyê dê bê têgihandin.

Îro encamê me girtî,berhemê keda kesên li hemberî qirkirinên hezarê salan rawestayî û keda xwîna sor ya kû li ber her deviyek ya Kurdistanê hatî rijandine.

Ji îro û pêde, azadiya hatî bi destxistin sparde(emanate) yê ciwanê Kurd e.

**M.Mele Şîrîn**

**PIRS:**

1. Bi pragrafa destpêkê bikevin rê,mijara nivîsînê diyar bikin.
2. Di pragrafa duwemîn de armanca nûtiqê hatiye dayîn. Bi hevokekî vê armacê vekin.
3. Çima girînge em hest û hizirînên xwe li gor rêzekî bi hişmedî rêz bikîn.
4. Plan çi ye?

Mijara derbazbûyî ya kû ji aliyê nivîskar ve hatî nivîsîn bi awayekî rêkûpêk li ser rewşa dibistanan ya borî ya niha û ya bê rawestaye.

Nivîsîna derbazbûyî ya kû mirov dikarê di çarûveya wê de bi demjimêran baxivê bi çar paragrafên kurt bi awayek plan kirî hatî nivîsîn.

Di sere vê ûnîteyê de ta niha ,li gor daxwaziya xebata nivîsînê,diyarkirina mijar û bi tuxûb kirina wê ,diyarkirina ramana bingehîn û riyê vekirinê,awayê ravekirin û diyarkirina corê di cih de bi zanîn di derbarê van de rûbirû mabûn. Aramaca dayîna van agahiyan,ew bû kû mijar bê plankirin û nivîsîn.

Dema xwedevanê vê mijarê wateya wê bi awayekî zelal têdighê û axaftinên li pey hev rêzkirî dibîni ,rastiya planê fêr dibi.

Bi mijarek tuxûbkirî,agahî û zanînên di derbarê wê de ,bi awayekî kurt,bi hişmendî xistina nava rêzekî,di darîştinê de dibêjin **plan**.

**a. Girîngiya çêkirina planê.**

Berjewendiyên çêkirina planê, em dikarin bi vî awayî rêz bikin:

1. Wilo çêdikê kû em bi hev re agahiyên derbarê mijarê de bigrin,me ji belavbûnê rêzgar diki,nahêle em bikevin nava vekirina bê wate.

2. Pêşî li derketina ji derveyî mijarê digrê û di mijarê de yekîtiyê pêktîne.
3. Gengaziya kû agahî bên ji bîrkirin ji holê radike.
4. Jibo têgihandina mijarê di pleya yekemîn de dibe arîkar.
5. Ji bê biryarbûna kû di serê mijarê de derdikeve holê rizgar dibi.
6. Pêşî li windakirina demê digri .
7. Dibi arîkar kû ramana bingehîn û ya arîkar derkeve holê.( plan ,qerqodeya nivîsînê ye.)
8. Plan bandorê li ser hêsanî nivîsîn ,xweşik axaftin,rast hizirîn û pskoljîka mirov baş rave diki di mijara bingehîn de, rê li ber qezeckirina kêrahitinê vediki , di milê erênî de ,pêşxistna me di sosyolojîk û çandê de pêktîni .
9. Plan, ne bes di têgihandina devokî û nivîskî de ,di jiyana rojane de jî, cihekî girîng digiri. Mirovê bi plan kar dike ,demê xwe baş bi kartîne ,ji bê biryarbûn û belavbûnê rizgar dibi,bi rêkûpêk tê xwedîkirin û têkiliyên bi tendurist avadiki.

**B. Di xwevegotinkirina nivîskî de corên planan**

**Di nivîsandinê de plan**

Li gor corên mijarên tên bikaranîn cûda dibin. Bûyer ,hest û hizirîn ,sê pergalên bingehîn yê têgihandinê ne.

Ji van endaman em bikevin rê ,sê corên planan tê çêkirin.

1. **Palana gianiya wê tevger.**
2. **Plana giraniya wê hest.**
3. **Plana giraniya wê raman.**

**1.**Plana giraniya wê tevger ( plana bûyeran )

Di plana giraniya wê tevger de ,rêzkirina bûyerên çêdibin dişopîne. Demê jî li gor bûyeran plan diki. Bi vê riyê berdewam bala xwendevan û guhdaran zindî dihêli. Ev balkêşan her diçe dibi xemgînî ,dikeve rewşa şûndemyînê de . Di dawiya planek bi vî awayî de ,her kû diçe xemgîniya xwendevan dibi ,vehêsanbûnê pêktîne.

Planên giraniya wan tevger ,di nava xwe de li sê beşan tê cûdakirin: Destpêk ,naverok encam.

Di planên giraniya wan tevger de ,rêzkirina bûyer û demê carna bi zanebûn ji aliyê nivîskar ve tê guhartin. Bi vê riyê , armanc ewe kû bala xwendevan û guhdarvanan berdewam zindî bihêle.

Di planên giraniya wan tevger de ,piştî bûyerê endama herî sûd jê tê girtin şopandine. Dema şopandina tê kirin nivîskar dû riyan bikartîni,yek tê şopandin ya din dişopîne. Di şopandina tê şopandin de ,nivîskar xwe di plana dûyem de digri : Ji awayê nivîsî, dikevê rê ,bûyerê li gor taybetmendiyê wê radigihîni. Dema kû şopandina ji derve encamê diguhêri, cih nadê hest ,raman û daxuyaniyan .

Di şopandina dişopînê de ,nivîskar lehengê bûyerê ye. Li bûyer û kesan li gor çarçûva xwe temaşe dike. Şîrove û nirixandinên xwe li gor vê dikê. Şopandina dişopîne hinek core şopandinên hindirînin.

Di pêkanîna giraniya wê tevger de ,sûd ji teknîka weke dahorand(tehlîl) û sentezê digirê.

Plana giraniya wê tevger ,di serpêhatî ,roman,tîatro(leystin) di coreyên bi vî awayî de tê bikaranîn.

**RAHÊNAN**

## TÊKÎLIYA MIROV BI HEZKIRINÊ RE

Diyare kû mirov bûnewerek civakî ye. Ev civakîbûna mirov jî ,jiber hindek sedem ango ji lewaziyên wî tê. Jiber kû mirovek bi tenê nikare tevahî pêdiviyên madî û manawiyên jiyana xwe pêkbînê,lewma jî tenê kom dikari van pêdiviyan bi arîkariya hevdû pêkbîne,bersiv bide û têr bike. Yek ji van pêdiviyên manewî jana mirovan jî hezkirine.

Bingehê jiyana mirovan li ser hezkirinê hatî avakirin. Di dîroka mirovahiyê de hezkirin wekû hêzek serekî bûye ,jibo guhartin ,pêşketina kar û xebat û koşîşa(hewldan) mirovan ,jibo xwe parastin li hember her core gef û tirsandin û êrişan.

Hezkirina navbera dayîk û bav û zarokan dibê sedemê parastina bingehê malbatê. Hezkirina giştî di navbera endamên civakê de dibi sedemê danûstanên,bi hev re karkirin û di encamê de bi hev re jiyankirina yekîne û komên civakê. Hezkirina mirov ji ax û welatê xwe ,dibi sedemê hevgirtina civakî û berxwedana wana,jibo parastina cih û warê welatê xwe ,hezkirina mirov ya kû ji encama karekî baş û serkeftî tê dest ,dibi sedem kû mirov hertim jibo pêkanîna karên baş û arîkirina bi mirovan re di nava hewldanê de bi.

Wekû hat gotin ,jiber girîngiya hezkirinê di jiyana mirovan de ,di ziman û wêjeya her neteweyekê de jî ,ev peyv xwedî cihekî taybete û bi şêwe û rengên cûda cûda di jiyana rojane û wêjeyê de pê tê

axaftin. Di zimanê kurdî de jî ,ev peyv bi gelek awayan tê bikaranîn;hezkirin ,dildarî,evîndarî ,yarînî,dostînî,evînî,xoşewîstî ,xoştivî û... h.w.d

Li hember peyva hezkirinê di zimanê kurdî de peyvên kerb,kîn ,nefret,neyarî nevînî û ... tên bi karanîn kû berûvajiyê hezkirinê ,aliyê jiyanê yê reş ,ne xweş ,kuştin ,girtin,dizî,talan û malwêraniyê di navbera tak û komên civak û gelan de têxi berçav kû ev yek jî tenê jibo parastina hindek berjewendiyane ne hêjayî dû perane .

Jibo cîgîrkirin, bihêzkirin û parastina hezkirinê di jiyanê de ,di qonaxên cûda yên dîrokê de ,peyambir û fîlosof û zanayên mirov dost derketine kû hemû jiyan û tenê xwe di riya bi cihkirina hezkirinê de kirine qurbanî. Kesayetiyên wekû h.z Îsa ,Gandî û Ocalan ,stêrên geşinên vê rêbazê ne.

Wekû hat gotin ,hezkirin hingivînê jiyanê ye. Jiyan bi hezkirinê xweş û şêrîn dibe ,mirov bi hezkirinê lêvken û spehî dibi ,civak bi hezkirinê hevdû digiri û bi cêgîrbûna hezkirinê ye kû tevahî kerb , kîn , nexweşî ,diltengî û neyartî ji nava mirovan di jiyanê de radibi û xweşî û aramî û lihevdûtêgihîştin tê rûniştandin.

Vêca ka em hemû mirov,bêyî berçavgirtina nejad,netew ,ol,reng û ziman,werin em vê bexşîşa pîroza Yezdanî kû hîç zehmet û mezaxtineka wê jî nîne, bi awayek herî baş di jiyanê de bi karbînin û tama xweşa jiyanê nasbikin.

**M. Îsmet**

**2.Plana giraniya wê hest ( wêneyîkirin û vekirin )**

Planên giraniya wan hest,hûnandî û pexşan( bi awayê nivîsandina rast ) ji core nivîsînê weke helbest ,serpêhatî û romana pêktê. Ev core nivîsîn xwendekarî dibi hestek bingehîn û sojeyekî.

Keyfxweşî,tirs,hezkirin ,evîndarî ,nifret ,xemgînî ,bêrîkirin ,guman ,xurûş...

Ev hinek ji hestê me ne. Ger em hastên xwe têbigihin ,em hîs dikin kû tenduristiya mergê me di cih de ye û dilşa dibin. Hest dema bi devokî yan nivîskî tên têgihandin ,ji wêneyîkirin û vekirinê sûd digiri. Şopandin û sentez ,endamên arîkar yên têgihandina plana giraniya wan heste.

Ev teknîkên di têkgihadina hestan de tên bikaranîn bi awayên corbecor tên rêzkirin. Ji tevahî hatin û çûna bal tevahî- ve, ji van

riyan sûdgirtin,ji hundir berbi derve ve, ji derve berbi hundir ve rêzirin,ji girîng berbi ne girîng ve û ji ne girîng berbi girîngî ve ,teknîkên bi vî awayî her kû diçin hinek ji vane radigihînin. Wek tê gotin .

**Ey dewlmendê serbilind**
**Ma te çiman ser daye xew**
**Pir mal û zêr û milk û gund**
**Bo çi dixwî her nan û dew**

Di vê hûnadiyê de helbestvan ji erêniyê berbi nerêniyê ve nivîsandiye. Jiber destpêkê dabaşa serbilindiya kesê dewlemend dike ,piştre re di xew de mayîn û kunujiya wî tîne ziman.

**Carek li Ewropa binêr**
**Herçî xudan milyonê zer**
**Gava ko tê roja welat**
**Zêran didin merdane ew**

**Celadet Elî Bedirxan**

**RAHÊNAN**

Di sirûd me ya netewî de ,endamên hest tertêxin ,bi awayê bend binivîsin.

**3.Plana giraniya wê raman ( vegotina di riya mukur û diyar )**

Gotar ,fikra ,taqîkirin û yên weke van xwe dipesêrin hizirînê ,planên giraniya wan ramanîne. Di planên giraniya wan raman de ,ji rêbazên ne ji mijarê raveya bi riya mukur û diyaririnê dîtîn sûd digiri. Di nivîsînê mukur û diyarkirinê de armanc ,ramana bingehîn pejirandin, sepandin ,hîskirin yan jî danîna holê ye. Her yek ji van armancan bi core nivîsînên cûda pêktên.

Planên giraniya wan raman ,ji destpêk ,naverok û encamê pêktên . Di beşê destpêkê de girêftarî mukurî ,mijarê datîne holê. Di beşê naverokê ,de çareserkirina girêftariyê yan jî diyarkirina mukurbûnê û bi vê ve girêdayî ramana arîkar weke paragrafekî tê bi cih kirin. Di beşê encamê de girêftariya hatî çareserkirin pêşniyar, yan jî diyar diki,mukurbûna di dawiyê de tê dîtin bi awayekî kurt datîne holê.

Di plana giraniya wê raman de ,dema di cih de bê dîtin ,di çêkirina serpêhatiyê de ,dikarê sûd ji riyên wêneyîkirinê bigire. Awayê rêzkirina di plana hestyar de hatî bikaranîn di plana giraniya

wê raman de cih digirê. Ji van sedem- encam,encam-sedem ji zanîn berbi nezanbûnê ,rêzkirina bi vî awayî di plana giraniya wê raman de hîn belavtir tê bikaranîn.

**RAHÊNAN**

Hezkirina ji mirovan xebata jibo mirovan ya kesekî girêdayî rêbaza serok APO

di planek giraniya wê raman de diyar bikin.

**3. Xebatên çêkirina planê.**

- **a. Çêkirina plana serpêhatiyekî kurt.**
- **b. Nivîsîna serpêhatiyekî kurt.**
- **c. Bi plana giraniya tevger cûrên tên nivîsîn.**
- **ç. Nivîsandina jîname,jînama xwe bi xwe,nivîsînê rojane.**
- **d. Çêkirina planên ramanî**
- **e. Bi planên ramanî corên tên nivîsandin.**
- **ê. Nivîsîna raman û taqîkirinê.**
- **f. Nivîsîna name, tilgraf,vexwendin.**

**XEBATÊN AMADERÎ**

1. **Ji beriya têgihandina rewşekî yan bûyerekî di hizir de hizirînek çawa çêdibe?**
2. **Ger bûyerên jiyana rojane em binivîsin sûdê wê yên çawa hene?**
3. **Kesê bala me dikşêne,agahdariyên di derbarê jiyana wî de ji me re çi dide qezenckirin?**
4. **Xwendina nivîsîna ramyarî ,pêşveçûnên me, di kîjan aliyê de bandor diki?**
5. **Ji pergala ragihandinê yê kû di jiyana me ya rojane de tên bikaranîn,name,daxwazname,vexwendname herî zêde hûn kîjan ji van bikartînin ?çima?**

## HEZKIRIYÊ XWENDINÊ

Ger berf ,baran ,serma û teyrok bibariya jî hertim demjimêrê çar û nîvan ji xew radibû ,di nava zarokan de dileyîst,piştî wê pirtûk û pênûsê xwe tanî û dixwend.

Demekî danê çûyîna wî ya dibistanê hat guhartin,bi guhartina danî re ,her wekû her tiştê wî tevlîhev bibû,êdî danê xwe yê berê û yê nû herdû li dibistanê derbazdikirin.

Rojekê hinekî nesax bû ,me rêkir nexweşxanê,piştî ji nexweşxanê hat,bi lez bezî xwarin xwar,di xwarin xwrinê de pir lez kir,dema me pirsî çima bi lez xwarinê dixî? Ji me re got: “ Da kû bigihim wana xwe” piştî wê derket.

Bi derketinê re got : “ Weke par dîsa dibim yekemînê refê”
Berbi êvarî min destnimêj digirt,min kite ya gora xwe êxistibû ya din hîn di lingê min de bû,ji nişkeve dengek dihat guhê min.
_ Bavo !
Bi deng re derketim derê malê.
_ Xêre kurê min !
_ Zarokan got: “ Pênûsa Tofanê ket qirika wî , dilê wî jê çû û rakirin nexweşxanê.”
Bi gotinên wî re cavê min bi pêlava ya di destê wî de ket,bezîm nexweşxaneya hevalan ,li nexweşxanê dinêrim tû kes nayê dîtin,ji milê din ve hevalek pir şîrîn berbi min ve tê û dipirsê : “ Tû bavê Tofanî?”
_ Belê
Rûyê wê qermiçî ,hêsira da çavan “ Tofan birin Mexmûr”
Bi lez ketim rê ji wir ve teksiya hevalan ya Tofan birî tixtor dihat, ji dûr ve dîtina wan hêviyek dida min lê hêviya min zû bi dawî,digotin: “ Here Mexmûr cem texture File”
_ Tofan çawa ye?
Wek xwe ye.
Bi lez min xwe gihand Mexmûr, Tofan li ser cih re dirêjkirî bû ,rûyê wî bi kefiyek reş hatibû nixumandin,dixtorê File hewldida ji cihê xwe dexê,taybetmendiyê tixtoriyê yan yê mirovahiyê nîşan nedikir,asayîş Mexmûr`ê dixwest em jibo raporê bibin Hewlêr`ê ,lê dema min got ez li tû kesî ne dewecîme cinaze didan û me anî amlê,

Piştî me anî di laşê wî de hinek hejandin çêbû.me goman kir saxe,carek din em zivirîn ,me berê xwe da nexweşxaneya Mexmûr`ê,dema em çûn nexweşxanê li wir jî dîsa rastî tixtorê File hatin,min ji hevalê xwe digot pêre herin guman çêdibû,ger saxbê jî jibo xwe firker derneyêxê dê bikujê,lê bi rastî jiyana xwe ji dest dabû ,roja xatir xwestinê bû.

**M.Mele Şîrîn**

**PIRS:**

1. Di pragrafa despêkê de ,nivîskar dabaşa çi diki?
2. Kesê serpêhatiyê dinvîsê,kesê çendê ye? Hûn vê ji kû dera mijarê fêrdibin?
3. Aliyê bûyerê ya kû we bandor diki kîjane?

**4.** Taybetmendiyê xwendevan yê kû we pir bandor diki kîjane?
**5.** Beşa dawî ya serpêhatiyê bi kîjan hevokê dawî lê hatî?
**6.** Tişta serpêhatiyê nêzîkî me diki çi ye?
**7.** Ramana bingehîn ya vê serpêhatiyê diyar bikin.
**8.** Dema plana serpêhatiya bi nave hezkiriyê xwendinê digrin dest ,em dikarin bale bikêşin ser van xalan:
  **a.** Bûyer li kû destpêdiki?
  **b.** Bûyerê bi kîjan demî têdigihîni?
  **c.** Bûyer di kîjan beşê demê de destpêdikê?
  **ç.** Di derbarê cih de agahiyê bidin.
  **d.** Bûyerê bi paragrafekî kurt bînin ziman.
  **e.** Encamê diyar bikin.

**3.XEBATA ÇÊKIRINA PLANÊ**

**a. Çêkirina plana serpêhatiyekî kurt**

Me planek ji serpêhatiya kurt ya bi navê **hezkiriyê xwendinê** derxist ,di planê de endamên wê dan diyarkirin. Ev plan qerqodê vê serpêhatiyê dide nîşandan.

Bi awayekî giştî , di çarçûveyeke teng de bûyerk bi ser çend kesan de hatî ,bê kû em bikevin nava vekirinek zêde ;ji hundir zindî bi bandor û hostayî ,bi vî awayî serpêhatî têne têgihandin “serpêhatiyên kurt” tên gotin.

Dema jibo çêkirina serpêhatiyekî kurt planê çêdikîn,pêwîste em van pîvanan bînin ber çavan:

**a.Bûyer balkêşe?**

1. Mijara hatî hilbijartin,mijarek hêjayî nivîsînê ye?
2. Mijara hatî hilbijartin rojane ye?
3. Mirovan di hemû temenan de têkildar diki?

**a. Bûyer çawa hatiye li ser zanînên te.**

1. Bûyerek bi ser we de hatiye ?
2. Hevalekî yê we ,têgihandiye?
3. Di encama şopandinekî de ,hûn fêrbûne?
4. Bûyerek pêkhatiye ,lê gelo ev bûyer weke bûyerk çêbûyî bihadare? Gelo we bûyer li gor rastiyê pêşnûnekiriye?

**b.Di têgihandina bûyerê de armanca we çi ye?**

**ç. Gelo hemû aliyê bûyerê danîne holê?**

**1.** Kesê di bûyerê de yan kesên di bûyerê de kî ne, taybetmendiyên van yên diyarker çi ne?
**2.** Kes dê çi û çawa baxivin?
**3.** Derdor kî dere,di vê derdorê de çi heye?
**4.** Dema bûyer têde çêbûyî diyar bikin.
**5.** Tiştê pêwîste di cih de hebin ,têbînî bigrin.
**6.** Çarûva nêrîna xwe danin holê.
**7.** Hestê xwe yê di derbarê bûyerê de diyar bikin.
**8.** Ramana bingehîn û ramanên alîkar bikin biryar.
**9.** Jibo li serpêhatiya we ,tamek taybet zêde biki,jibo nehêli bê jibîrkirin ,tevgerekî pir balkêş ,yên weke jest,gotin û rewşê peyda bikin.

**d. planê li gorî berhemên di benda (b) yê de ( têgihandinekî)hilbijêrin.**

Bûyer weke di serê we re derbazbûyî ,yan bi yekî din re ,di dema borî yê bihîstî de ,di demê niha de ,hûnê têbigihînin?

Jibo nivîsîna serpêhatiyekî kurt xebatên li pêşiyê tên kirin pergalên we ne. Ji van pergalan yê ji we re bibinji bo veqetînin dikarin hilbijartinekî çêbikin. Bi vî awayî dikarin plana serpêhatiya xwe ji vekirinên bê wate rizgar bikin.

Tevgerên beriya niha hûn fêrbûyîn ,giranî li gor beşa planê ,plana nivîskî çêbikin.

**B. Nivîsandina serpêhatiyekî kurt**

Weke girêdayî xebatên li jor dikarin amadekariya nivîsîna serpêhatiyekî kurt bikin. Jiber vê, rêzkirina jêr bişopînin:

**1.** Pergalên me komkirî ,emê çawa li vî beşî beramber bikin. Ger pêwîst biki, bi çêkirina hin guhertina,dikarin awênê dawî yê planê bidinê.
**2.** Hûnê plane, ji vekirina hûn di cih de nabînin, rizgar bikin.
**3.** Hûn dikarin dest bi nivîsîna serpêhatiya xwe bikin. Di xebatên nivîsandinê de, dikarin hevoka xwe ya destpêkê awêj(bi’ecibînin) bikin,bi demê re ,hûnê destpêkirinê bedew çêbikin.
**4.** Di her têkîlî û her cûdahiyan de (ayrinti) paragrafê çêkin. Lêbelê divê em hevokê di aliyê wateyê de bi hev ve girêdayî di paragrafekî de kom bikin.
**5.** Hevokên dirêj qet saznekin .

**6.** Hewlbidin kû têgihandina we xwezayî be û li awêna we xîzkirî were.
**7.** Di goftûgoyan de pêwîste ,temen ,perwerde ,çand, jiyana çînî ,taybetmendiyên herêmî yên kesan, li ber çavan bêngirtin.
**8.** Cihê wê bi wêneyêkirinekî bi bandor çêkin. Jiber vê ji berjeng,têgir û kirina sûd bigirin.
**9.** Lehengê xwe yê serpêhatiyê herdem di rewşekî balkêş de bigirin. Li gor hûn bawer dikin serpêhatî dê bikevi rewşeke balkêş, gotinên taybet,rewş tevger, yan jestê ,jibo bilindkirina têkiliyê li cihê dixwazin bi cih bikin.
**10.** Hewlbidin kû destpêk ,naverok,encam ji aliyê xwendevan ve bê hîskirin.
**11.** Dema we pêşnûmeya(taslaq) ya destpêkê temam kir,carekê bixwînin û berdin. Bila demek di ser re derbaz bibi. Di vê navberê de hûnê li ser serpêhatiya xwe bihizirin. Piştre hûnê serpêhatiya xwe di cih de bigirin dest ,rêkûpêkiyên pêwîst bikin.
**12.** Weke hemû nivîsandinên xwe serpêhatiyê xwe jî di aliyê ziman,têgihandin, destûrê rastnivîsê û hêma danînê de,bi baldarî li berçav re derbazbikin,baxin rewşa herî baş.
**13.** Serpêhatiya we ya di rewşa reşepel de,li gor distûrên nivîsîna xweşik bikşînin paqijiyê.
**14.** Weke di serê pirtûka me de cih girtî,mijara ji xwe re rêzgirtin,armanca berdana nivîsandina berhemekî, bi vî awayî dikşînê.Jibo ji xwe re rêzgirtin û li xwebawerbûnê serpêhatiya xwe ya kurt di serî de li rojnameya xwe ya dibistanê binivîsin ,ji derfetên derdor jî sûd bigirin ,hewlbidin kû serpêhatiya xwe bi hinek din bidin xwendin.
**15.** Rexneyê erênî yê tên serpêhatiya we binirixînin ,nivîsîna xwe berdewam bikin;rexneyên hûn nerênî dibînin jî binirxînin, serpêhatiyê hîn xweşiktir dikarin binivîsin.

**c. Core nivîsînên bi plana giraniya wê tevger hatî nivîsîn .**

Em fêrbûbûn kû corê serpêhatiyê ,bi plana giraniya wê tevger hatiya nivîsîn. Roman,tîatro,metelok(fabil),geryaname,bîranîn,çîrok ,destan ,fikra bi xal,nivîsîna rojane ,jîname,jînama xwe bixwe,seneryo ,name û cûrên weke van bi plana giraniya wê teger tên nivîsîn.

**RAHÊNAN**

Ji şarezayiyên xwe sûd bigirin û serpêhatiya xwe bi awayekî leyîstik binvîsin.

## GELÊ MEZIN MIROVÊ MEZIN DAFIRÎNIN

Wekek tê zanîn di nava civakên mezin de kesên mezin peyda dibin ,peydabûna mirovên mezin pirtirînê xwe ji nava gelên xudan dîrokên kevnar ,serpêhatiyên mezin û perîşanbûyînê derdikevin.

Di rastiya civakbûna mirovan de, gelan bi hinek şêwaz û bi riya kesan, demê xwe yê borî rêverbirine ,ew kes bûne senteza wê civakê ,ew civak bi wan kesan mezinbûne û pêşketine. Lê kesên mijara gotinê,her çendî bi nav û deng û dibin peyrewên civakan, lê di demê têkoşîna xwe de herdem perîşan ,girtî,kuştî û dîlbûyîne. Lê piştî çûyîna wan ji civakan re bûne çavkanî û rêberên mirovahiyê. Bo nimûne ,derketina Îsa û darvekirina wî Promatus'ê Yunanî,...

Mînaka gelê Kurd jî : piştî destpêkirina kedîkirina lawiran peydakirina çandinyê, avakirina Imperetorên mezin mîna Hûrî, Mîtanî,Godî ,Med....

Piştre bûyî qada cenga parzemîna ,hatî dagirkirin û parçekirin ta gihiştî astek wisa kû heyîna wî bixwe hatiye mandêlkirin.

Ha di rewşek wisa de ji nava vî gelê xudan dîrok bermayên ewqas mezin û niha bindest , parçebûyî û perîşan kesek mîna Rêber Apo derdikevi.

Rêber Apo jî mîna Îsa ,Manî ,Prometeus bêy kû tû meznatî berjewendiyên kesî ji kesayetiya xwe re yan malbata xwe re bixwazi û biparêzi xwe gorî mirovahiyê kiriye û bûye yekmîn rêberê mirovahiyê ya çerxa bîstûyeka.

**ç. Nivîsîna jîname,jînama xwe bixwe,nivîsîna rojane**

**Nivîsîna jînamê**

Jînama; bi awayekî dîrokî nivîsîna jiyana kesên di civakê de bi awayekî giştî ,bi baldarî tên pêşwazîkirin,bi zanîn ,huner û ramanê ve xerik dibin . Navdarên kû ji gel re xebat kirî jiyana wan ji xwendevanan re tê dayîn.

Jîname wek serpêhatî, riya wêneyîkirin û daxuyaniyan bikartînê û pêktînê.Lêbelê plana jînamê di şûna destpêk ,naverok û encama de plana serpêhatiyê de serî,vekirin bi dawîbûn tê bikaranîn.

Nivîskarê jînamê kesê kû jiyana wî digire dest, dikarê cih bidi hest û hizirînên girîng tên hesibandin,rê nadê ramanê xwe. Jînama divê tam di nava têgihek rast de bê nivîsîn. Jiber vê sedemê, nivîskarê jînamê piştî lêkolînekî piralî divê nivîsîna xwe binivîsi.

Weke di hemû corên nivîsînê de ,di jînamê de jî beriya nivîsînê pêwîste plan bê çêkirin. Di vê planê de tevayî zanîn û belgeyên hatîn komkirin,weke bala xwendevanan bikşîne li gorî hizir têne rêzkirin. Di vê rêzkirinê de jiyana kesê jînama wî tê nivîsîn, koronolojîk li rêzkirina dîrokê tê destgirtin.

Di jînamê de ,kesê tê têgihandin ji berhemê wî,di çalakiyê wî ,ji hizir û hestên wî ,ji nivîsînê kesê di derbarê wî de bi nêzîkatiyekî erênî nivîsandî ,bi çavekî bê alî ji van sûd tê wergirtin.

Di bin roniya van agahiyan de ,em planek ya jînamê çêbikin:

**Plana Jînamê**

**A. Serî ( giriş ):** Cihê kes di civakê de( bi kurt )

**B. Vekirin ( gelişme )**

**1.** Kengî ji dayîk bûye?
**2.** Cihê dayîkbûnê kû dere ?
**3.** Rewşa derdor kû têde mezinbûyî û gihayî çawa ye?
**4.** Çawa hatiye gihandin?
**5.** Erkê kirî çine ?
**6.** Taybetmendiyên kesî çi ne?
**7.** Xebatên wî çi ne?
**8.** Kî bandor kirine?
**9.** Eger di herêma wêje û huner de bê,girêdayî kîjan beşî ye,têgiha hunera wî çiye?
Berhemên wî çi ne?
**10.** Ger miribi ,bandorê mirina wî ya li ser gel û di derbarê cihê lê hatî veşartin de em çi dizanin?
**11.** Piştî mirinê nivîsînên di derbarê wî de hatî nivîsîn çi ne?
**12.** Wêne ,mînakê destnivîsa wî kîjanin?

**C. Dawî ( sunuc)**

Di vê beşê de nirxandinekî kurt di derbarê kesê jînama wî hatî nivîsandin de tê kirin.

**RAHÊNAN**

Ji pirtûk û ansklobadiya jînama kesekî naskirî,peyda bikin ,di refê de bixwînin.

**Jînama xwe bixwe**

Jînameya xwe bixwe di aliyê plan ,karanîn û têgihandinê de dimînê jînamê.

Lêbelê milê jînama xwe bixwe ,yê namînê jînamê jî heye. Li hember pesartina jînamê ya kû xwe dipesêrê erênî ,zanist,lêkolîn û delîlan ,di jînameya xwe bixwe de distûrek wilo nîne. Ji ber watyek vekirî dikşîni.

Jînameya xwe bixwe ,core nivîsîna kesê jiyana xwe bixwe têdigihînê ye. Dema kesek jiyana xwe dinîvîsê divê kû bi hestyar tevbigeri,dibi tiştê xwe yê veşartî ji me veşêri,rewşên xwe ,bûyeran hêjayî nivîsînê nebînê .

Nivîskarê jinama xwe bixwe di mijarên derbarê jiyana xwe ya taybet de bêyî kû pêwîstî bi tû belgeyan bibîne dinivîsi. Dibê kû li gorî têgihandinekî kronolojîk tevnegere,li milê din nivîskar di derbarê jiyana xwe de dibê kû tiştina jibîr bike. Dema jînameyek xwe bixwe bê xwendin ev tişt li ber çav bên girtin wê baş bi.

Aliyek yê bîranîn û jînameya xwe bixwe dimîmin hev,lê di aliyê din de cûdabûnê nîşan dikin .

Nivîskarê bîranînan jî, awayê têgihanidna jînamê û jînama xwe bixwe û pergalê wan bikartînin ,lê ji jiyana xwe hinekî dibirê û radigihîni. Armaca bîranînê ne têgihanidna serpêhatiya jiyana kesekî ye. Di jiyana kesan de rewşên diyar yên kû taybetmendiyê dikşînê ,bûyer û kesan dertêxe pêş di derbarê wan de hest û ramanê xwe diyar dike,ragihandina şopandina ye.

Plana jînama xwe bixwe bi awayekî cûda dibi kû bê çêkirin. Em mînakekî ji awayê pir tê bikaranîn bidin.

**Plana jînama xwe bixwe**

**Serî:** rewş ,bûyer û armancên bûyîn sedema nivîsîna jînama xwe bixwe têdigihînê.

**Vekirin**

Di beşê vekirinê yê jînama xwe bixwe de ,di aliyê naverokê de ,weke beşê vekirinê ya jînamê ye? Lêbelê weke me berî niha jî dabû diyarkirin nivîskarê jînama xwe bixwe agahiyên di derbarê jiyana

xwe de bêyî kû weke rêzkirina me ji jînamê re danî bikarbînê dikarê têbigihîne.

**Dawî**

Nivîskar di beşa dawî ya jînama xwe bixwe de , di derbarê jiyan xwe de nirxandinekî giştî dike,di vî beşî de ,di derbarê pêşerojê de ,nêrîna xwe datîn holê. Di beşê dawî de ,nakeve vekirina , ji peyvên **dîsa** yên kû xwendevan teng dike direve.

**RAHÊNAN**

Li gor vê plana jînama xwe binivîsin û bi xwînin.

**NIVÎSANDINA NIVÎSÎNA ROJANE**

Ji aliyekî ve nivîsînên rojane dimînin bîranînan,tişta nivîsîna rojane ji bîranînan cûda ,dîroka rojê diyar dike. Nivîskar bi hestê weşandinê ,nivîsînê rojane nagirê dest. Nivîskarê nivîsînên rojane,her roj her tişta dixwaze dinivîse. Nivîskarê dixwazê nivîsîna xwe ya rojane binivîsîne , wan carek din di ber çavan re derbarz diki, tişta ne pêwîst dîtî ,tişta di cih de nedîtî biweşîne,yan beşê pir taybet hesibandî dertêxe. Ziman û têgihandina wê,balkîşandina xwendevana de jî dihizirê ,bi wî awayî ji nû ve digirê dest.

Weke awên di nivîsînên rojane de ,cihê herî diyaker ,cihê dîrokê ye. Nivîskarê nivîsîna rojane ,her roj li kûşa jor a milê rastê yê rûpelek yê deftera xwe yan rûpelê kaxaza xwe ya spî dîroka rojane tavêjiyê ,ger pêwîst be demjimêr çend e diyar diki. Bi vî awayî di rojekê de ,di demên cûda de hest û ramanê xwe datîne holê;rewşa xwe ya mergî diyar diki. Kesên nivîsînên rojane digiri,piştre tişta nivîsandî di ber çavan re derbaz dikê,ji cîhana hest û hizirînê ,ji hêza xiyakirinê di balkêşandin û li bendê nayînê de çi guhartin heye dibînî. Nivîsînên rojane, li aliyekî mirov dikarê bêje, girtiname ( tûtanak ) ya jiyanê. Nivîsînên rojane yê baş hatî girtin ,di jiyan mirovan de weke xwedîkirina bi rêkûpêk ya girîng e. Vê carê xwedîkirina aliyê me, yê jiyanî û çandî û aliyê me yê rewanî ye.

Di derbarê nivîsandina nivîsînên rojane de planekî bi rêkûpêk(ayrinti) nayê çêkirin. Piştî dîrokê rasterast derbazî mijarê dibi,dema nivîsînên rojane dinvîsînê pêwîste hevokên saz diki kurt ,têgihîştî û bi bandor bin.

Bihndana nîvsalê ,dema girtina nivîsînê ronjane ya herî di cih de ye. Kesê di vê demê de,nivîsînên rojane bigri,nivîsandinê ji xwe re bêxe,çandek. Dibê kû di demê pêş de bibi nivîskarekî gelekî mezin .

**RAHÊNAN**

Ji agahiyên we ji cûrên nivîsînên rojane girtî sûd bigirin,nîvîsînê rojane binivîsin. di tevahiya rojê de ji tişta we jiyan kirî ,bûyerên hûn hêjayî nivîsînê dibînin,rewş û şopandinên xwe binivîsin.Bi rojaneyên hevalê xwe yê refê re bînin berhev

**d. Çêkirina Plana Ramanî**

Demê tû mijara plana giraniya wê raman çêdiki,tû dibênî kû nivîsîînên giraniya wan hizir,darizandin ,mukur û diyarkirin,ji destpêk,naverok û encamê pêktên.

Nivîsîna giraniya wan hizir yên weke gotar ,fikra,taqîkirin ,rexnekirin û civatî bi plana ramyarî tên nivîsîn,jibo em jî ,di derbarê cûrek ji van de,nivîsînekî binivîsin divê destpêkê em planê çêbikin.Em hewl bidin kû tiştê pêwîste , destpêkê binivîsin ,bi bîrbînin.

**a.** Pêwîste em mijarekî diyar bikin(kifişkirina mijarê )
**b.** Divê mijara xwe bi tixûb bikin.
**c.** Pêwîste ramana bingehîn danin holê.
ç. Divê diyar bikin ka , ramana bingehîn bi kîjan riyan vekîn?( îstatîstîk,taqîkirin,çavnêrî,gritina ji yek din,çûna tevhiyê û ji tevahiyê hatin )
**d.** Divê biryar bidin ka awayê vegotinê wê çawa bi?
**e.** Divê corê nivîsînê di cih de hilbijêrin(ramanî,gotar,taqîkirin,civet... ) Ev xebat amadekariyên ji beriya plan çêkirinê ne. Piştî vê agahiyên me jibo nivîsînê komkirî û hizirê me yê di rewşa pêşnûme de têxîn rêzek. Ev rêzkirina me di rewşa bendan de danîn holê ,divê riyek ya hişmendiyê ya kû xwendevan baş têdigihê bê şopandin.

Berhemên ramana hatî rêzkirin dê xwendevanî ,bibei ramana bingehîn( çûna tevahî;yan jî xwendevanê kû ramana bingehîn fêrbûyî ,bi arîkariya ramanên alîkar yên di nivîsînê de mijarê têdigihê. Ji van riyan ger ya yekemîn hilbijêrin,emê di beşa serî de , ramana bingehîn danin holê,ger em riya duyem hilbijêrin,divê bi gotina bingehîn ramana bingehîn xwendevan

bandor biki. Jiber vê divê paragrafa serî ji nivîsîna ramanî beşa herî bi bandor bi.

**Beşa vekirinê :** Ev beş ji paragrafên di wan de, ramanên arîkar yên kû hevkariya ramana bingehîn dikin pêktê. Her ramanekî arîkar bi bendekî derdikeve holê û bi parargrafekî tê vekirin. Bi vî şêweyî mijar asayî tê xwendin û hem jî hêsanî tê têgihîştin.

**Beşa dawî :** Di rasteka daxuyaniya jor de,dê ramana bingehîn danê holê yan jî bi awênek bidi bawerkirin sazûman biki.

Di rasteka van zanistan de ,plana ramanî ya mijarek ya li jêr hatî dayîn de çêkin.

1. Kesê pir ji xwe hez bike, pir kêm tê hezkirin.
2. Pêwîste dijminê destpêkê tû bikariyê hêrs ,bê hêvîbûn bê.
3. Tû çiqas bizanibî ,bizanibe,zanîna te bi qasî yê li hember te ji te têbigihiyê ye.
4. Li cihê kû jina azad û şerker hebê, li wir hêzdarbûn , zindîbûn û wêrekî heye.
5. Heskirina rastîn û evîn, evîna welat, a gel û azadiyê ye.

**e. Core nivîsînên bi plana ramanî tên nivîsandin**

Core nivîsînên wek hevpeyvîn ,gotar,ramanî(fikra) taqîkirin,rexne kirin,proje,konferans,rûniştina vekirî,rapor ,hevdîtin,lêkolîn û h.w.d nivîsînên bi palana ramanî tên nivîsînin.

**ê.Nivîsîna taqîkirin û ramaniya**

Me zanînên di derbarê core nivîsînên taqîkirin û ramanî de,di wana derbazbûyî de dîtibûn. Di ramanî û taqîkirinê de ,ramana bingehîn tê parastin,nivîskarên ramanî bi awayekî giştî ,ji pejirandina nêrîna xwe gumanê dikin. Lêbelê hizrê nivîskarê taqîkirinê ,ji bilî xwevegotinê armancek din nahilgirê. Di rasteka van zanînan de ,planê ramanî û taqîkirinê dikarin çêbikin. Beriya çêkirina plana ramanî û taqîkirinê ,zanînên di derbarê core taqîkirin û raman(fikra) de berfireh di mijarên destpêka pirtûkê de hatî têgihandin carek din di ber çavan re derbaskin.

**RAHÊNAN**

Plana taqîkirin û ramanî ,xebatê çêkirina plana mijarê li gor distûrên di benda (d) têne çêkirin. Vê plana raman carek din hûrkolîn bikin. Zanîna we ji vê planê girtîn bi zanînên xwe yê derbarê

taqîkirin û ramanê de ,piştî hûn bikin yek plana xwe ya ramanî û taqîkirinê çêkin.

**f. Nivîsîna name, daxwazname, telgraf, vexwendname**

**Nivîsîna name**

Name ,berhemekî wêjeyî ya herî kevnar ,dirêjî demê derketina nivîsînê dibê ye. Tê zanîn kû nameya destpêkê ,berî zayînê di sedsala XV an de hatiye nivîsîn. Nameya kû li Hatûşa Anatolyayê ,ya kû girêdayî qiralê, Hîtîtiyan di heman çaxê de hatiye nivîsîn.

**Name**

Jibo em hest raman û xiyalên xwe bûyerên me jiyankirî û dîtî,jibo daxwazê xwe ji yê ji xwe dûr re bêjin ji vê pêwîstiyê derket. Di roja me de bi pirbûna pergalê ragihandinê yên weke internet,faks,telefon,telgrafê nameyê girîngiya xwe ya berê winda kiriye. Name li gor awa û naveroka xwe di dû aliyan de tên destgirtin.

**Taybtmandiyên namê li gor awa û naveroka xwe ev in:**

a. **Kaxaz :** kaxaza namê ,kaxazekî spî û tame. Ji derveyî kertên tên çapkirin ,divê ev pîvan neyê xiabkirin. Di nivîsînên fermî de ,dirêjiya nivîsînê çiqas dibe bila bibi ,kaxaza tam ya ( A 4 ) tê karanîn. Her çiqas di name yên taybet kaxaza bi reng bê bikarbînin jî lê ya hêja û pir tê bi karanîn kaxaza spî ye.

b. **Pênûs û diwd :** Name, bi diwêda reş yan jî şîn ,ger gengaz bi pênûsa diwêd bê nivîsîn ,ev tê wateya rêzdariya yê hember xwe . Tê wateya " min dem ji we re cûda kir, hêjatî nîşan kir ,nirx didim we "

c. **Naverok û sazûmanî :**

1. Li koşeya jor ya nameyê ,cih û dîrok tê nivîsîn.
2. Beşa denglêkirin( hitabet ): denglêkirin di wateya dinglêkirina bi riya nivîsînê ya li hember xwe ye. Jixwe name,axaftina nivîskî tê hesibandin. Axaftin dibe peyvek yan jî ji bire peyvan bi.

Mînakên li jêr yên axaftinê lêkolîn bikin. Ji van mînakan sûd bigirin û hûn jî ji heval yan jî ji nêzîkî xwe re hevokên axaftinê sazbikin.

Kurê min,
Dayîka hêja
Mamostayê bi rûmet

Dostê hêja
Rê heval
Kaka ciwan

Li gor nêzîkatiya kesê name jê re tê nivîsîn tê guhartin. Axaftina baş, diyarkirina hestê xweşik,li gorî nirxdayîna yê li hember xwe destpêkekî girînge. Piştî axaftinê bêhnok tê danîn.

3. **Serî:** Di serê nameyê de,pleya nêzîkbûna yê li hember,li gorî naveroka mijarê ,zimanê têgihandinê tê cûdakirin. Weke em bêjin destpêka nameya em ji hevalê xwe re dinivîsîn şêwazekî germ nîşan diki. Nameya kû em ji rêvebiriya saziyekê re dinivîsin,divê bi awayek vekirî armanc bê diyarkirin û hestê baweriyê bidi şiyarkirin bigirîn dest. divê destpêka nameyê kurt paragrafekî yan ji dû paragrafan pêk bê.

4. **Vekirin :** Beşa nameyê ya vekirinê ,nivîsîna bingehîne,divê beşê de armaca nivîsîna nameyê ,nûçe ,daxwaz ,hest,raman dîtinên hevbeş yê girêdayî niyazan,rexne têkîliyên kar cih digiri. Kurtî û dirêjahiya vê beşa nameyê girêdayî pîvana niyazê mirove. Dibi kû nameyên wêjeyî dirêj bin,lê misoger divê yên kar kurtbin,tenê rewş û xwestek tê diyarkirin .

5. **Dawî :** Di beşa dawî ya nameyê de ,xwestekên baş tîni ziman ,di vê beşê de divê rêz û heskirin cih bigrin. Beşa dawî divê kurt bê girtin .

Name dikari bi yek ji van gotinê jêr dawî bibi .

Silav û rêz
Destê we mac dikim
Xêr bimînin
Bi heskirin çavê we mac dikim
Serkeftinê dixwazim...

6. Piştî beşa dawî milê rastê yê jêr nav û paşnav û îmza tê danîn,li milê cepê yê jêr navnîşan tê nivîsîn.

7. **Têgir :** Têgirên nameyan di gelek cor û pîvanan de tê çêkirin, ya herî tê karanîn ya di şiklê çargoşeyê de ye. Ji nîv kaxaza spî ya ( A4 ) bi çûktir e.

Rûyên pêş yê têgira bê derî wiha tê sazûman kirin :

1. Li koşeya çep ya jor nav û nîşana hinêr tê nivîsîn.

2. Di nîvê de , nav û cihê navnîşana girtek cih digire.
3. Li jêra koşeya rast ya namê,cihê biçê ,navê navçe û bajêr tê nivîsîn .
4. Nameyên derdikevin ji derveyî welêt,navê welatê diçiyê jî tê nivîsandin.
5. Li jora koşeya çepê, pol tê lêdan.

**Cûrên naman**

1. **Nameyên taybet:** Nameyên heval ,dost û evîndariyê;nameyên serxweşî,spasî,vexwendin,pîrozbahî û têlgraf ji corên nameyên taybetin.
2. **Nameyên wêjeyî:** Kesên navdar ,di herêma huner û wêjeyê de,bi armanca , hest û hizrê xwe bidin xuyakirin, rexnekirinê nameyên tê nivîsîn ji wan re **nameyên wêjeyî** tên gotin.

Di pêvajoya nivîsîna nameyên wêjeyî de ,taybetmendiyên ramyarî,hunerî, aborî,folklore ratêxe ber çavan. Di vê wateyê de nameyên wêjeyî,di nav heyînên çanda civakê ,ya herî girîng de cih digiri. Nameyên vekirî yên kû jibo di çapemeniyê de bê belavkirin hatîn nivîsîn beşek ji nameyên wêjeyî tên hijmartin. Di wêjeya me de ji cûrên nameyan re nirx hatiye dayîn. Di sedsala XV b.z heya roja me ya îro tê bikaranîn.

3. **Namyên Fermî:** Nameyên jibo ragihandina kar ,di navbera endamên saziyan de yan jî bi heman armancê ji kesê taybet re tê şandin re **nameyên fermî** tê gotin.

Di nameyên fermî de ziman,têgihandin,awên bi distûran ve hatine girêdan. Bi taybet nivîsînên di navber saziyan de tên bikaranîn " distûrên nivîsîna fermî" di bin sergotarekî de ,girêdayî rêvebirnameyekê tên meşandin.

4. **Nameyên Kar:** Nameyên bi armanca têkiliyên karê bazirganiyê yan jî jibo sazûmankirina mercên xebatê di navbera aliyan de,saziyên taybet ji hevre yan ji saziyê fermî re tên şandin re **nameya kar** tê gotin.

Mercname, nameyên sparişî û hevpeyman ji namyeyên kar tên hijmartin.

**RAHÊNAN**

Ji nasekê xwe yê dûr re,girêdayî jiyana xwe ya dibistanê yan jî girêdayî jiyana rojane nameyek taybet binivîse.

**Nivîsîna daxwazname:**

Jibo daxwaza kesan,gazindên wan yan jî rewşekê ,ji cihê(meqam) fermî re ragihîne,ji van nameyên fermî re **daxwazname** tê gotin.

Divê daxwazname ,li ser kaxaza spî ya bê xîzik ya pîvana wê tam,bi diwêda reş yan jî şîn bêyî kû reşkirin bikeviyê bê nivîsîn.

**Plana Daxwaznamê**

**a.** Navê cihê(medama) daxwazname jêre tê şandin ,bêyî kû bê kurtkirin tê nivîsîn.

**b.** Navê cihê kû cah(meqam) lê(bajar ,navçe) tê nivîsîn.

**c.** Di Nivîsînên daxwaznameyê de ,(rewş,pirsgirêk ,daxwaz,....) tê nivîsîn.

**ç.** Zanîn û pêwîstî(ev beş girêdayî daxwazê beşê dawî ye.)

**d.** pêvek,navnîşan,numara postê cih digire.

**e.** Li milê rastê wajo(îmza)dîrok, nav û paşnav tê nivîsîn.

Niha jî em vê planê pêkbînin.

**RAHÊNAN**

**1.** Mînaka daxwaznamê ya di nava çarçûveyekî de ya li rastê lêkolîn bikin. Plana daxwaznamê ya li jor ,bi bendên tîpan hatî cûdakirin ,li ser daxwaznamê nîşa bikin.

**2.** Daxwaznameyekê di derbarê belgeya şêniya(nifûs) xwe de,ji rêveberiya şêniya hûn girêdayî wî re rêkin û belgê şêniya xwe bixwazin.

**Nivîsîna Telgirafê :**
Di roja me yaîro de pergalên ragihanidinê yê lezgînî weke telefon,faks, pir in. Nûçeya tê xwestin zû bigihê kes yan saziyekî ,jibo nûçe ,rewş yan jî daxwaza tê xwestin, bi awayekî kurt û cewherî bigihê kes yan jî saziyan , ,ji tlgrafê sûd digrîn.
Tlgraf li gor demê gihandinê dibin sê beş :

**Asayî ,lezgînî,birûskî**

**Di dema nivîsîna tlgirafê de, ev distûr tên pêkanîn:**

**1.**Li beşa nîvê ya jora kaxaza tlgirafê,yek,ji peyvên "Asayî ,lezgînî, birûskî" ya tê xwestin tê nivîsîn.

**2.**Li koşeya çepê ya jora kaxaza tlgirafê nav,paşnav, navnîşana kesê digirê tê nivîsîn.

**3.**Mijara tlgirafê kurt tê nivîsîn.

**4.**Li koşeya jêr a rastê nav û paşnavê kesê rêdiki tê nivîsîn .

**5.**Li binê vî beşê nivîsînê, xîzik tê kişandin. Di bin

Mînaka daxwaznamê

Jibo Rêvebiriya Perwedê,
Amed

Di dawiya sala perwerdeya 2007-2008'an şahihiya mamosta ya ji aliyê we ve tê lidarxistin,ez dixwazim bi pêşengehekî wêneyan ,tevlî bibim.

Çil tabloyên kû ez dixwazim nîşa bikim ,di dosya alîkar de ne.

Daxwaza min dana distûra pêwîste.

Perwanga(dosya) arîkar 1
Navnîşan: 7.8.2007
Kolana şehîdan jimar 5.5 wajo
Mêrg Ehemd Amed Hogir Feraşîn

Mînaka tlgirafê

LEZGÎN
Girtek:
Pelşîn Ciwan
Taxa Behdîn
Kolana bîst hijmar 25
Eşrefiyê Heleb
Min kaxaza şêniya xwe windakiriye ,qeda şêniya min derxin û rêkin.
Dara

Hirer:
Dara Ciwan
Xwendevanê Zankoya Hwelêr
Enkawa

xîzikê re li milê rastê, nav û paşnavê hinêr tê nivîsîn. Ev agahî,demê tlgiraf negihê cihê xwe ,jibo li hinêr bizivirê tê dayîn. Dema bixwaze, navnîşana wî girtek bizanibe, wê demê xîzik nayê kêşan , di nava nivîsîna tlgirafê de tê nivîsîn.

**RAHÊNAN**

Qeyd a boriyê xwe, ji dadgeha hûn ,pêve girêdayîne ,bi riya tlgirafê bixwazin.

**Nivîsîna vexwendnameyê**

Nivîsînên kurt ,yên kû bi armanca bangkirina kesan ,jibo tevlî mijarên weke konferens,panel,rûniştinên vekirî ,di mijarên corbecor de,yên weke sempozyom,axaftinên amadekirî,dîlan ,pêşbirk ,şahî,pêşengeh,tûrena vekirin û girtinê yên tên çêkirin bibi jê re **vexwendname** tê gotin.

Di vexwendnameya de,pêwîste ziman sade û têgihîştî bi,pêwîste şêwaz li gorî kes yan jî cahê hatî vexwendin.

Mînak;vexwendnameyên dîlana dibê kû ji hundir bi awayekî bi hest bê nivîsîn. Lê vexwendnameyên civînekî zaninstî bi zimanekî li ger girîngiya mijarê tên nivîsîn. Di vexwendnameyan de pêwîste dîrok ,demjimêr ,cih û armanca vexwendinê bê diyarkirin.

Mînaka vexwendin

Rêvebiriya Dibistana Şehîd Koçerîn

Ji aliyê we ve rûmetkirina festivala ji aliyê xwendevanên refa dawî ve hatî amadekirin,bi rêzdarî daxwazdikin.

Dîrok : 4. Nîsanê
Demjimêr : 08:30
Cih : Navenda çand û huner .Mexmûr –Hewlêr

**RAHÊNAN**

Hûn jî daxwaznameyekê di derbarê pîrozbahiya kû xwendevanên dibistan qedandî amadekirin de ,di nava vê çarûvaya jêr binivîsin.

**4. Xebatên Nivîsîna Bi Plan**
**a. Nivîsîna serpêhatiya kurt.**
**b. Çêkirina nivîsînên ramanî yên kurt.**

**XEBATÊN AMADEKARÎ**

5. **Jibo têgihandina bûyerekî ,em ji kîjan andamên bingehîn sûd digirin?**
6. **Serkeftinên nivîskarê serpêhatiya kurt bûn bi çi ve girêdidin?**
7. **Nivîskarê serpêhatiyê,ji devê kesê yekem,ji devê kesekî di nava bûyerê de ,dinivîsê yan ji derve dimîne? Cûrebikin.**
8. **Nivîsînên ramanî yên kû bandora wan ya li ser jiyana me ya rojane bêjin.**

## JI ÇÛKA DAWÎ

" Çûk xeniqandin,giya hilkirin,rê di nava heriyê de man.
Dostên min !Cîhan tê guhartin, rojek dê bê hûnê di nava şînatiya ezmanan de ,gulên reş nebînin. Rojek dê bê,di kenarên riyan de,pirça kesk a dayîka min a ax jî nebînin. Ne jibo min, lê zarokino! jibo we ev xirabe ,me pir çûk û şînatî dîtin. Jibo we dê xirab be .Ji min gotin."

**4. XEBATÊN NIVÎSÎNA BI PLAN**

**A. Nivîsîna serpêhatiyek kurt**

**1. Nivîsîna serpêhatiyên kurt yên kû mijara wan bi xeta bingehîn hatî diyarkirin.**

Ji beriya nivîsîna serpêhatiya kurt. em van distûran bi bîrbînin:

**1.** Divê bûyer jiyanbûyî yan dibê jiyan bibi.
**2.** Çêkirina serpêhatiyê şêwayê vegotinê ye.
**3.** Plan giraniya wê tevgere.

4. Pêwîste kes, ,dem û cihê bûyerê,bi bûyerê re ,di nava ahengiyekî debin.
5. Pêwîste ramana bingehîn ya serpêhatiyê bê diyarkirin.
6. Beşê destpêk ,naverok ,encam bi şêwayekî zanistî bê bikaranîn. Jibo armanca kû hertim balkêşiya xwendevan zindî bimîni.
7. Divê hest ,hizrîn û endamê xiyala ,waneyîkirin,danûstandin ,neyên ji bîrkirin, pêwîste di têgihandinê de zindîbûn ,di hilbijartina peyvan de taybetbûn , li berçavan bên girtin.
8. Divê em di hevokê de ,nekevin şaşîtî û bê biryarbûnê;divê şaşîtiyê rastnivîs û hêma danînê neyên kirin.
9. Şêwaza tê hilbijartin dibê kû li gor mijarê sade ,pêkenok ,zarokî yan jidil bi.

**RAHÊNAN**

Di derbarê serpêhatiya jêr de hinek agahiyên kurt hatine dayîn,Bi sûdgirtina ji van agahiyan ,serpêhatiyekî kurt binivîsin. serpêhatiya we nivîsandî ,bi serpêhatiyek we awêjkirî(ecibandî) re hember bikin,aliyê wê yê wek hev û yên li hember hev diyar bikin.

**Yên tên dayîn**

1. **Cor :** serpêhatî
2. **Mijar:**serpêhatiya kesekî penaber
3. **Awayê vegotinê:**Çêkirina serpêhatiyê
4. **Ramana bingehîn:** Jibo em bi rûmet jiyan bikin, pêwîste em berxwedanvan bin.
5. **Derdor (cih):** Li gorî mijarê cihek tê pêşnûmekirin
6. **Dem:** Tevahî werzan bi taybet werza peyîzê bê hilbijartin. Di rojê de tevahî demjimêran dibi bê bikaranîn.
7. **Kes:** Ciwanekî bîstûçar salî kur yan keç yê zanko qedandî,bê xwestin ciwanek ji derdor hilbijatî zanko ne xwendî jî dibi.
8. **Gotin:** Weke gotina sepêhatiyê dikarin demê borî yê sade ,boriyê berçav ,boriya vegêr, boriyê fireh bipejirînin.

**2. Bi dayîna parça yekê ji zincîrek ya bûyeran ,nivîsandina serpêhatiyekî kurt.**

Di bin roniya zanînên we ,yên di derbarê serpêhatiyekî kurt ya kû mijara wê bi xeta bingehîn hatî diyarkirin, dikrin serpêhatiya ji zincîra bûyera, parçeyek hatî dayîn binvîsin.

## DAYÎK

Dayê Nûfel, xwe daye koşeyek ya xaniyê xwe yê kevnar û li keça xwe temaşe dikir ,serê xwe dihejand : " Xwezî min ev keça xwe şûna rêkira gundekî."

Çiqas banî keça xwe dikir,keça wê bersiv nedida,dixwest pêre şer biki,lê hêza wê ya şerkirinê nemabû.

Jixwe çend roj bûn,birqa wan tinebû ,birqa wan heftiyê sê çar caran xiradibû,ger kehreb heba jî ,ma gelo keçê tiştek dikir? Di odeya biçûk de findek pêketîbû. Mirov dikari bêjê jibo rohnîkirinê, vê findê bikartînin. Nava odê tev sih bû,tarîtiya odê her wekû bandorê li xweşikbûna keçê diki,her êvar xeyîdîbû. Xwe wek di vî gund de dîl hatî girtin. Deryê Mêrdîn`ê dihat ber çavên wê ,di xiyalên xwe de li riya şila dibriqê ya nava Amed`ê temaşe dikir...

Lê di rastiyê de şilatiya barana dibarî ,li dîwarê ji kelpîçê axê hatî çêkirin re tavêt. Heriya nava kolana car car di derî re derbazî hundir dibûn .

Li hember vê rewşê cave wê tejî hêsir dibûn,jiber sala borî ,di vê demsal û demjimêrê de ji parka Oxûr Qaymez dihat pêre gelek xweştiviyên wê jî hebûn.

Ew roj derbaz bûn,ew heyîn bi dawî bûn êdî Amed dûr e. Pêwîste xwe li gor nû ketiyê amide biki,lê nedixwest Amed`ê ji bîrbiki.

**3. Nivîna serpêhatiyek kurt ya ji xwe re hêlayî**

Li gor di derbarê nivîsîna serpêhatiyan de zanînên we zêdebûyîn,ji nû ve ,jibo nivîsîna serpêhatiyên nû çavnêrîna xwe berdewam bikin. Heya niha zanînên we girtî,dibê kû bi we teknîka nivîsîna serpêhatiyê dabi qazanckirin,lêbelê nivîsînên me di mijarekê de nivîsî, ger ji aliyê hinek din ve hat pejirandin û xwendin wê demê dikarin xwe serkeftî bibînin. Jiber vê pêwîste hertim xwe di nava çalakiyên xwendin û nivîsînê de bibînin.

Jibîr nekin; bi xwendin,guhdarkirin,şopandin û di nava bûyeran de jiyankirin , şopandin û hizirînê, şarazayî tê qazanckirin. Ji vê pêvajoyê re ,dikarin bêjin pêvaoya "dagirtî". Axaftin û nivîsîn valakirineke. Ev herdû pêvajo heta dawiya jiyanê berdewam dikin. Ger ne wilo bi,hest ,hizir û cîhana me ya xiyala, dê bi demê re teng bibi, hêza girtina me ,dê bikevi, şarezahiya me wê Kevin bibi;bi kurtayî pêşketina me dê rawesti,ev rewş têkiliyên di nva kesan de ,dê

rê li ber binketinê veki,dê bibi sedem kû em bibin kesek ez ezî ,bes rûmetê bidin ramana xwe, û bibin kesekî ne lihevkirî û bê têgih. Kesê ketî vê rewşê,ji nav civakê berbi tenêtiyê ve tê dehfdan ,bê gêwil dibin.

Jibo em zanînên xwe zêde bikin û pêşketinên çêdinbin di nava xwe de bihelînin,pêwîste hertim bixwînin û jibo xwe vegotin bikin,di nava rêkûpêkiyek diyar de xebatên xwe yê xwendin û nivîsînê berdewam bikin. Li milekî serpêhatiya xwe binivîsin ,li milê din pêwîste pirtûkên me xwedî dikin,kîna me vedikin,cîhana me ya xiyalan hertim fireh dikin, bixwînin.

Ev hewldanên xwendinê pêwîste di salên zankoyê û pêşerojê de bidome. Her berhemekî nû em bixwînin ,weke di çêkirina serpêhatiyê de ,hin zanînên nû didi qazanckirin,di beşê din yê wêjeyê de jî,hêza me ya şîrovê bi bandorbûnê zêde diki.

**RAHÊNAN**

Ji mijarên jêr yekê hilbijêrin ,serpêhatiyek kurt binivîsin.

**a.** Goşt ji te re ,hestî ji min re.
**b.** Kesê hingivî digirin ,tiliya dalêsin.
**c.** Kesê hingivî bixwi mêşê pêve bidin
**ç.** pîr biki lê ji bîr neki.

**B. Sazkirina Kurtenivîsên Raman**

1.Fikra
2.Nivîsîna gotarê
3.Nivîsîna ceribandinê

**B. Sazkirina Kurtenivîsên Raman(fikara)**

Di waneyên beriya niha de ,bi riyên mukur û diyarkirinê awayê vegotinê hatibû dîtin,corê ketibûn vê riyê hatibûn têgihandin,plana giraniya wan hizrîn ,çawa çêdibê ,di vê planê de ,ji çi re cih hatiye dayîn fêr bibûn.

Bi arîkariya zanînên me ji vê beşê girtî,emê hewlbidin kû nivîsandinekî kurt binivîsin.

**1.Nivîsîna fikrayê**

We agahiyên di derbarê vegotin û corên lihevhatî yê di mijarê de diyarkirî û agahiyên di derabrê corên fikra de girtin.

Fikra ,ya weke nivîsînekî hizrî ,corenivîsîneke di rojnamên rojane de di stûnên diyar de cih digirin ,weke bûyerekî rojane tên

şîrovekirin. Nivîskarê fikreyê mijara hilbijartî bê kû bikeve nava belavbûnê dinivîsê.Her mijarên kû balkêşî di wan de heyî yên weke ,ramanî,civakî,pîşeyî, di mijarên aborî de, di qada werzîşê de ,bi kinahî mijarê bûyerên rojane û balkêş tên nivîsîn.

Di welatê me de nivîskariya fikraya qadek ya pîşeyî ya taybet û balkêşe. Di welatên biyanî de ,nivîskarên her roj nivîsînê didin rojnameyekî nînin. Nivîsîkarên fikrayan nîvîsînên xwe bi awayê pêkenok,balkêş,zindî,tinazok,kîn.....dinvîsînin.

Jiber kû fikra hertim di rojnameyan de, di demek dirêj de berdewam nakin lê fikra balkêş û asayî tên têgihîştin ,ji corê nivîsînên din tên cûdakirin,di welatê me de, nivîskarên fikrayan yên pir serkeftî dê çêbibin. Di beşa serî ya fikrayê de mijar, yan jî pêrsgirêk tê gotin. Di beşa vekirinê de di derbarê mijarê de hizir,şîrove,rexnekirin... datîne holê,di beşa dawî de darizandin yan jî pêşniyar cih digirin.

**Jibo nivîsîna fikrayê riya hûn bişopînin eve:**

**a.** Mijarekî balkêş ya kû hûn nivîsandinekî li ser binivîsin hilbijêrin.
**b.** Mijara xwe bi tuxûb bikin.
**c.** Armanca nivîsîna xwe diyar bikin.
**ç.** Ramana bingehîn danin holê.
**d.** Pêwîste we ramana alîkar ya kû destekê didi ramana bingehîn amadekirbi.
**e.** Hûn dizanin pêwîste ,plana giraniya wê hizrî çêbikin. Zanînên we komkirî di plana xwe de bi cih bikin.
**ê.** Erê dikarin fikraya xwe binivîsin(dikarin,her ramanekî arîkar weke pragrafekî nîşan bikin.

**RAHÊNAN**

Jibo nivîsîna fikrayê hûn fêrî awayê vegotina tê xwestin ,zanînên di derbarê corenivîsînê de ,çêkirina planê bibûn,li gor van fêrbûnên xwe ,li ser bûyerekî bala we kêşandî fikrayekî binvîsin.

**2.Nivîsîna Gotarê**

Di serê ûnîta me de ,dibin sergotara diyarkirina corenivîsînên di cih de,di derbarê corê gotarê de me agahî dabûn. Weke tê bîra we gotar nivîsînek ya diyarkirin û mukuriyê ye.

Agahdayîna di mijarekê de ,destekirina nêrînekê yan jî nivîsînê bi armanca daxuyaniyekî hatî nivîsandin de,ji van nivîsînên di wan de diyarkirin û mukurî heyî re **gotar** tê gotin.

Gotar ,ji corê nivîsînên bi plana giraniya wê hizirîn hatî nivîsîn ,ya herî girîg e .

Di gotarê de ramana bingehîn ,hizrekî bi xwendevan dana pejirandine. Jiber vê sedemê pêwîste gotar bi awayekî bê bawerkirin bi ,jibo kû bê bawerkirin riya tekane têgihandina rast ,sade û bê xaza ye. Nivîskarê gotarê jibo hizra xwe bidi pejirandin dikarê sûd ji îstatîstîk ,şopandin ,taqîkirin ,ji çêkirina girtinê;ji tevahî hatin û berbi tevahî ve çûn,yên weke van serî li riyê pêşxistinê didin.

Gotar di kovar û rojnameyan de tên nivîsîn. Di gotarên rojnameyan de ,piranî mijarên rojane tên nivîsîn.

Dikarin di pîşe heta konevanî ,ji aborî ta leşkerî,ji çandinî ta perwerdê ,li ser her tişta bê bîra we ,gotarê binivîsin. Nivîskarê gotarê, armanca zanekirina gel û di rasteka nêrînekê de ,avakirina raya giştî bingeh digri.

Gotar li gor armanca li jor me dayî diyarkirin ,pêwîste bi zimanekî sade û vekirî bê nivîsîn ,bi taybet gotarên banî xwendevanê rojnameyê dikin. Dema gotarê dinivîsînin, dibi taybetmendiyê xwendevanan li ber çavan bigrin. Nivîskarê gotarê pêwîste ji tiştên hestyariyê bireve.

Pêwîste agahiyên di gotarê de tên dayîn pasartî ,lêkolînek rastbi. Nivîskarê gotarê yê kû xwendevanê xwe şaş têbigihîni,dibê kû bibi sedema encamên bûyerên bi êş. Ji ber kû xwendevanê gotarê ,bi bawer ,lê bawer ,di nava jidiliyek mezin de gotarê dixwîni ,di beşa destpêkê ya gotarê de mijar tê diyarkirin,îdîa tavêjê holê. Di beşa vekirinê de ,hewldidê kû bi pelge û zanînên hatî lêkolînkirin û hatî bawerkirin,bi mukurbûn nêrîn û mijarê bidê bawerkirin.

Di beşa encam de mijarê bi darizandinekê ve girêdide.

**RAHÊNAN**

Li ser mijarekî bala we kêşayî ,ya hûn bikaribin li ser bixebitin gotarekê binvîsin. Jiber vê destpêkê ji agahiyên xwe yê di derbarê gotarê de sûd bigrin,hûnê çi bikin ?biryar bidin. Palana xebata xwe hûn bi xwe diyar bikin ,yan jî riya li jêr hatî diyarkirin bişopînin.

**1.** Mijarekî bala we kêşayî hilbijêrin ,bi tuxûb bikin.

**2.** Di derbarê mijara xwe de lêkolîn bikin.
**3.** Ramana xwe ya bingehîn bidin diyarkirin.
**4.** Plana gotara xwe amade bikin.
**5.** Di çarçûva plana xwe de gotara xwe binivîsin .

### 3. Nivîsînên Taqîkirinê

Zanînê di derbarê awayê vegotin û corên di cih de yên derbarê taqîkirinê de me dan,berî em derbazî nivîsînên taqîkirinê bibin;zanînên xwe yên di derbarê vê corenivîsandinê de zêde bikîn.

Nivîskarê di mijarekê de ,hest û hizirînê xwe berî kû herê darizandinekî ,bi têgihandinekî hundirîn û taybet dinvîsê,ji vî core nivîsînê re **taqîkirin** tê gotin.

Taqîkirin jî weke fikra ,gotûbêj ,rexnekirinê ji core nivîsînê giraniya wê hizirîne. Di fikrayê de bûyer li derdora bûyerkê kom dibin. Di gotûbêjê de jibo xwendevan têgihek weke denglêkirinê tê hilbijartin pirs tên kirin,ji pirsan re bersiv tê dayîn. gotûbêj, te dertêxe pêş. Di rexnekirinê de digihîne encam û darizandinekî. Kes yan berhemê mijara rexnekirinê jî bi riyên corbercor tên ravekirin,nirxandin û diçe darizandinekê .

Nivîskarê fikrê,ji gotûbêj û rexnê cûda ,taqîkirinê jî dinîvîsê,xwe dertêxe pêş,dabaşa xwe diki,xwe bi yekî din re tîne berhev aliyên cûda datîne holê. Nivîskarê taqîkirinê ,dabaşa guman ,şabûn,hêrsbûn, ,nêrîna wî yê li Cîhanê ya kû wî ji kesên din vediqetînê, diki.

Dema vê diki ,armanca wî ne ewe kû ji xwe pir hezdiki. Nivîskarê taqîkirinê ,serbixwe ,azad ,taybet,bê şert û merc ji têgihandinekî bê mukurî sûd digri û dixwazê bigihi xwendevan. Ger gotin di cih de be ,di taqîkirinê de ji min destpedikê ,dixwazê bigihê me.

Nivîskarekî serkeftî yê taqîkirinê pêwîste xwediyê nêrînek ya li Cîhanê ya fireh ,wêjeyekî dewlemend û hunerê çandî bi,lewra taybetbûyîna vî berhemî girêdayî vê ye. Nivîskarê taqîkirinê ,mijara digirê dest cara yekê bi nêzîkatiyekî nû,bi awayekî cûda têdigihîne. Azadbûna di taqîkirinê de ,vê riyê çêdiki. Hevokên taqîkirinê rast,vekirî,sade,berdewam û zindî ne.

Jibo em taqîkirinekî binvîsin riyên li jêr hatî pêşniyarkirin dikarin bişopînin.

**a.** Li gor mijara we bijartî,ramanekî binehîn diyar bikin.
**b.** Di derbarê mijarê de ,nêrîna xwe ya taybet binvîsin.
**c.** Hizrînek kû van hizirîna rêz biki bafirînin.
**ç.** Bê kû em bikevin gumana bawerkirinê ,weke hûn ji xwe re baxivin ,bi têgihandinekî vehês binvîsin.

**d.** Hevokên xwe ji çavlêkirinê dûr ,bi awayê te têbigihînê ,balkêş ,hewlbidin kû hûn peyvên taybet çêbikin .
**e.** Jibo balkişandinê bê jî, pêwîste bikaranîna peyvan di aliyê wate û awên de xiranekin.
**ê.** Ji awayekî xwendevanê we tênagihê ,ji taybetiyên kû xwendevan ji nav dernakeve birevin. Biwêjên her kes bi kartîne ,waje,hevtemamkirin û birepeyvan bikarbînin.
**f.** Hewlbidin kû hûn taqîkirina xwe ,bi hevokekî balkêş dawî lê bînin.

**RAHÊNAN**

Ji van mijarên jêrîn yekî hilbijêrin û li ser taqîkirinekê binivîsin. “ hezkirin,dostbûn,cûdabûn ,tirs,rastî ,virkirin,baş hizirîn,tevlihevî,ciwanî,kalbûn...”

**5. Hûrkolîna Nivîsînan**

**a. Di aliyê planê de**
**b. Di aliyê rêziman de**
**c. Di aliyê rastnivîsînê de**
**ç. Di aliyê hêma danînê de**
**d. Di aliyê ji şarazayiya sûd girtinê de**

**XEBATÊN AMADEKAR**

1. **Ger hûn mamosta bana ,we karê malê yê xwendevanê xwe di kîjan aliyan de hûrkolîn bikira.**
2. **Xwendevanekî di rêziman de xurt ,di têgiha taqîkirinê de ne serkeftî be,hûn bi çi ve girêdidin?**
3. **Hûn têgiha zimanê axaftinê , distûrê rast nivîsînê û hêma danînê nîşankirin, çawa dinirixînin?**

## XALA DAWÎ

Rojekê mirovan,bêhnok winda kir, wê demê ji hevokên zehmet tirsiyan û dest bi vegotina hevokên asayî kirin,her kû hevok sivik dibûn,hizirîn jî hatin sivikirin. Piştre hêmaya baneşanê winda kirirn; bi dengekî nizim û bi guhartina giraniya (tonê)deng dest bi axaftinê kirin. Êdî ne ji tiştekî dixeydîn, ne bi tişekî şadibûn. Qet tiştekî di wan de ,xurûşekî biçûk çênedikir.

Piştî demekê hêmaya pirsê winda kirin û êdî ketin rewşekî tiştekî nepirsin,êdî tiştekî bala wan nedikêşand: Ne Gerdon, ne Cîhan ne avahiyên wê yê deh qet ,ne di xema wan de ne.

Piştî çend salan hêmaya cotxal winda kirin û dev ji sedemê tevgerê xwe,ji yekî din re gotinê, berdan.

Di dawiya jiyê xwe de ,di destê wan de tenê hêmaya neynokê mabû. Di derbarê xwe de ,nêrînek ya wan nebû,bes nêrînên kesên

din dubare dikirin. Hizrîn ji bîr kirin û bi vî awayî giha xala xwe ya dawî.

**PEYV:**

**Jî :** temen

**Gerdon:** evren

**PIRS:**

**1.** Têgiha kû hevokên zehmet û bêhnokê bi hev ve girêdidi vekin.

**2.** Hêmaya baneşanê di hevokê de ji derveyî palkişandin li ser parçê li kû tê bikaranîn?

**3.** Ji pragrafa dûwê bikevin rê ,dema jiyan bê lêpirsîn bi kesan çi dide qazanckirin?

**4.** Kesê nêrînên kesan tim dubare dikin ,di nava civakê de cihê wan çi ye? Core bikin.

**5.** Nivîskar di derbarê nîşanê hêma danînê de, agahiya didi,hûn jî pragrafekî li ser kesê li gor distûran tev nagerê û zoriyê pê re rûbirû dimînê çêkin.

**5.Hûrkolîna Nivînan**

Di xebata nivîsîna de ,jiber kêmbûna zanîn ,balkêşî û ceribandina car car şaşîtiyên corbercor dikîn,heya kû ev şaşîtî rast nebin,herdem di mijara nivîsandinê de şaşbûnên bûyî weke terzekî ,dê riya wan vekirî bi. Em vê bi mînakekî nîşa bikîn:

Di roja me de li gor xwendevanê zanko qedandiye hîna kîjan peyv bi hev ve, kîjan cûda tên nîvîsîn nizanin,hijamara yên bi vî awayî ne kêmin ,li milê din rojanmeyên her roj bi milyona weşanê dikin pêvekên pêwîste cûda bên nivîsandin pêve,yên pêwîste pêve bên nivîsandin cûda dinivîsin.

Tû nêrînên xwe bi riya nivîsandinê dighînî milyonan kesan ,nivîsînek şaş dide ragihandin,ev core şaşiyên di civakan de pir ,têgihîştina kesên civakê ji hevdû zorê dikêşînê ,ger di civakekê de lihevhatin pêk neyê tevlihevî derdikevi ,di navbera kesan de yekitî xirab dibe ,wekû fikrînerê bi nav deng Konfoçyos dibêje : Di nava civakekê de karê sereke bê kirin sazûmankirina ziman e. Şaşiyên di peyvîn û nivîsînê de tên dîtin ger di salên xwe yên xwendekariyê de rast nekîn ,di pêşeroja kesan de aliyê wan yê de civakî de dê rê li şaşiyan veki ,ev rewş serkeftinê asteng diki. Xwevegotinkirina kesan bersiv nadi ,yan jî zoriyê dikêşi ji ber vê sedemê ,pêwîste di

pêvojoya xwe ya xwendekariyê de, divê şaşiyên peyvîn û nivîsandinê deraz bike .

Jibo xebata şaşiyên nivîsandinê ;diyar bikin ,pêwîste li ser plan, rêziman ,hêma û şarezayiyên rawestin.

Niha em vê şêwayê lêkolînê bi rêzê ve vekin:

**a.Lêkolîna di aliyê planê de.**

Zanînê di derbarê planê de,di mijarên beşê beriya niha de hûn fêrbibûn. Beşê pêwîste di planekî de bin,di van beşan de kîjan pergal (hest,raman,xiyal,bûyer,wêneyîkirin) têne bikaranîn.

Dema kû di milê plan de lêkolîn li ser nivîsandinekê tê kirin,endamên wê di cihê xwe de hatine bikaranîn yan na diyar dikin. Ger di nivîsandinê de plan neyê çêkirin yan tevlî plana hatî çêkirin nebê,jibo ramana alîkar paragrafên cûda neyên çêkirin, ji nivîsandinê re sergotar neyên danîn,girêdan di navbera ramana alîkar û bingehîn de nayê çêkirin ,şaşiyên di milê planê de tên kirinin.

**b.Lêkolîna di aliyê rêziman de**

Di xebatê nivîsîna têgihandina de ,di aliyê rêziman de şaşiyên zêde tên kirin ev in:

1. **1.** Avakirin hevoka xirabe ,di hevokê de girîngî nedana rawestandekan(bikaranîna peyvên ne pêwîst),bi têgihandinekî ne li gor mijarê nivîsîn(weke di mijarek jidil de bikaranîna pêkenok...)
2. **2.** Bikaranîna peyvên argo(zimanê nayê têgihandin) yan jî hişk ,ne li gor pîvana mijarê ,ji virde wirede tê kêşan .
3. **3.** Di nava hevokê, yan jî nava hevokan de ,li gor têkiliyê wateyê şaş çêkirin.
4. **4.** Ne karanîna peyvan li gor wata wan. Peyvên heman wateyê didin, bê kû bê xwestin ne di cih de, bikaranîna wan.
5. **5.** Di şûna peyvên di kurdî de heyî bikaranîna peyvên biyanî.
6. **6.** Li gor, li ser yekî ve ,nakê,ne yekî din didê axaftin,bikaranîna peyvên herêmî yên kû neketî nava çandê.

**c.Lêkolîna di aliyê nivîsînê de**

Di xebatê de ,şaşiyên em pêre rûbirû dimînin ev in:

**1.** Ne bikaranîna tîpa mezin li ser navê taybet.
**2.** Ji hev ne cûdakirina “kû” ya peywend û “ kû” ya mercî.
**3.** Amraza ma ya kû peyva pirsyariyê ye ,bi peyvê ve tê zeliqandin.

**4.** Şaştiyên di nivîsandina hijmaran de(di şûna “ dû sed û pêncî”dûsed û pênc tê bikaranîn)
**5.** Li şûna **aştî,** ya kû bingehê xwe ji peyva sade ya **aştkirinê** digrê peyva aşîtî tê bikaranîn.
**6.** Peyvên hevgirtî yan jî peyvên pêwîste cûda bên nivîsîn ,şaş tên bikaranîn.
**7.** Pêvekên rakêş yê kû li dawiya navên taybet tên ,bi hêmaya birînê nayên cûdakirin.
**8.** Di dawiya rêzikê de parçekirina kiteyê.
**9.** Di dawiya rêzikê yan di destpêka rêzikê de bi tenê hêlana peyvekî.

**ç.Nirxandina di aliyê hêma danînê de**

Di nivîsîna de, şaşiyên hêma danînê yên herî zêde tên dîtin bi rêzê ve ev in:

**1.**Yan ji binî xalê bikarnaynin yan jî li ser her tîpekê bi kartînin.
**2.** Şaş karanîna bêhnokê yan jî ,ji binî ne biraranîna wê.
**3.** Ne bi karanîna xalbêhnok yan di cihê şaş de bikaranîna wê.
**4.** Li gor tê xwestin jî,nivîsandinê nayêxin nava neynokê û dinivîsê.
**5.** Di cihê pêwîste de ne bikaranîna rêze xalan ,di cihê nayê xwestin de bikaranîna wan
**6.** Li şûna cotxalê bikaranîna hêmaya encamê.
**7.** Ne bikaranîna banaşanê ya ne di cih de karanîna wê.
**8.** Ne bikaranîna hêmaya pirsê yan ne di cih de karanîna wê.

**d.Lêkolîn di aliyê ji zanîna sûd girtinê de .**

Li gor sûdgirtina ji zanînê ,bi awayekî giştî em rastî van şaşîtiyên jêr tên.

**1.** Ne diyarkirin di têgihandinê de,
**2.** Bi mijarê ve ne xerîkbûn,
**3.** Têgihandina bi peyvên xweş, nayên têgihandin,
**4.** Têgihandina bi zêdayî,
**5.** Agahiyên şaş,
**6.** Bi şaşî hizir bi rêvebirin,
**7.** Kesê ji rêzê yê qelb(ne eslî) pir tê zanîn ,pir dibin pîvanê xwe de zanînan didi,
**8.** Di aliyê hest yan bi karanîna vegotinê de ,(bê bandor),
**9.** Dikevi nava vekirinên di mijarê de ne pêwîst,

**10.** Mijarê jidil nagri, derbaz diki, ji bo dema dagrê bê kû bale bikşîne dinivîse.

Distûrên di derbarê lêkolîna nivîsînan de ,kesên di lêkolîna mijaran de baş têgihîştî,şopandina kesê mirovan rastdikin û mamostayan di cih de dibînin,lêbelê dem dem divê lêkolîn bi xwendevanan jî bê kirin. Jiber vê pêwîste destpêkê bingehê lêkolînê bên têgihandin piştre xebatên birên xwendevana bên kirin,wilo bikin kû xwendevan kêmasiyên xwe bibînin .

**RAHÊNAN**

1. Jibo em şaşiyên xwe yê hêma danînê rakin,mijarê şaş hatî hêmakirin bi dengek bilind bixwînin. Bi vî awayî girîngiya nîşanên hêma danînê û erkê wan, emê têbigihînin. Ev têgihandin yê di xebatê nivîsîn û axaftinê de ,sûdek mezin bidi me
2. Bi awayekî di cih de ,hêmanyên pêwîst ji mijara jêr re bikarbînin.

## BÛNA WEK WAN

“ Wek wan bûyîn wek wan wergirtin wek wan xwarî û vexwarî wek wan rabûn û rûniştin bi zimanê wan axaftin Bihesibîne min ev tev kirin lêbelê emê çawa wek wan bihizirin Em çawa weke wan pê bihesin

Şewitadina tevayî van pirtûkên oda min dagirtî

Van wêne van taboyan ezê bêxim bin lingê xwe biparçiqînim

Kêr çi tê Hemû ketin hundirê min Di hundirê min de nayên hilandin nayê kolan bi şuştinê likeyên wan nayên paqijkirin Dîwarê minê hundirîn bi van neqşên biyanî û bi rengê biyanî dagirtîne Aliyê minê ji derve jî hatî guhartin ma kêr çi tê Ez çi me ez ez kî me ez tiştê ne ji vê xakê jî û ji derve hatî her alî xirakirine her tişt ketiye di rewşa heyberê kîmyewî de

Roja derbazbûyî di geryanê de digeriyam lingê min li qotiyek ya konserwê ket Sekinîm Min temaşe kir Ev Qotî ji Emerîkan hatiye qoteiyek bû li ser vê qotiyê bi zimanê Îngilîzî tiştin hatibûn nivîsîn Ev qotî kîjan rêwiyan li vir danîne Kî dizane kengî maye li vê derê nizanim Lêbelê bi têkilyekî asayî tewam min girt dest xwe û temaşe kir wilo li min hat kû min tiştekî mezin dîtî

Ez êdî di vê xakê de weke vê qotiyê me ”

## XUTKIRINA HEST Û HEVKARIYA GEL

Di hizir û ramanê serok Apo de xurtkirinahizir ,raman û hevkarî heye.
Yên kû hizrê xwezayî yê gelê me ,bi zanistê ve girêdayî ,em kirîn xwedî vîn,hevkariya di nava gelê me de ,ya kû li cem me tişta herî bi rûmet afirandî û fêrî xebatên hevbeş kirî ,kirî gel ,gihandina wî avakirî ,bi hemû cor û awêna pêşxistiye.

Gelê Kurd kiriye hêz ,êdî dikari di her qadê de mafê xwe biparêze . Li hember tevayî zora neyaran rawesta ye.

Ji çand û hunerê pir hez dikê ,weke di perwerda ramanî de hêza wî ya dayîna perwerda bedenî jî heye. Jiber vê kariye kesên di hemû aliyan de jîr bafirînî .

Armanc ewe kû welatê me ,bikeve rêza welatê herî pêşketî de ,gelê me jî weke gelê herî serfiraz di nava şahiyê de jiyn biki.

Demokrasiyetek wilo daniye pêşiya gelê Kurd, mafê tevahiya mirovan di nav de tê parastin .

Xwediyê vê rûmeta mezin di bin mercê tecrîdê de ,jibo parastin û xwedî derketina li mafê kesên tên perçiqandin derdikeve û dixwazi biratiyek rast di nava tevahî mirovan de bide sazkirin.

**RAHÊNAN**

Di derbarê wekheviya serok dixwazi bide rûnandin de ,parçeyekî binivîsin.

# TEST IV
## ( Nivîsandin)

**1-Kijan ji van weke taybetmendiya mijarê nayê jimartin?**

**a.** Tuxûb
**b.** Ast
**c.** Balkêş
**ç.** Ligor hiş
**d.** Sazûmanî

**2- Ji mijarên jêr kîjan li gor yê din bituxûb tê jimartin**

**a.** Derdor
**b.** Rêber Apo
**c.** Civak
**ç.** Ji jiyê 0-2 yê pêşketina zêhnê zarok
**d.** Aborî

**3- Jibo peydakirina mijara nivısîneke kijan ji pirskirinên jêr bipirsin di cih deye?**

**a.** Divê nivîsînê de li ser çi bi giranî tê rawestandin?
**b.** Ev nivîsîn çima nivîsiye?
**c.** Ev nivîsîn kengê nivîsiye?
**ç.** Ev nivîsîn kê nivîsiye?
**d.** Di vê nivîsînê de kijan awayê têgihandinê karaniye?

**4-Kijan ji yên jêr ne riya pêşketina ramana bingehîne?**

**a.** Sûd girtina ji îstatistikan.
**b.** Çavnêrî
**c.** Taqîkirin
**ç.** Wêneyîkirin
**d.** Têbînîkirin

**5- Ji testa sûd bigrin û ji xwenkaran yên kû zanist pîvayîn,nekarîn hevok û paragrafa sazbiki pêşneketî tên dîtin. Divê mijarê de bi sed xwendekaran xebata paragrafê dayîne çêkirin, tenê sê xwendekar di têgihandina nivîskî de serkeftî hatîne dîtin?**
**Di parça jorî de demê raman tên rêzkirin ji kijan teknîkê sud hatiye girtin**?

**a.** Rêzbûna bûyerê
**b.** Ji tevayê hatin
**c.** Taqî
**ç.** Çavnêrî
**d.** Gihiştina tevahiyê

**6- Ji yên jêr kijan ne ji endamên awênê têgihiştina serpêhatî kirinê ne?**

**a.** Bûyer
**b.** Dem
**c.** Derdor
**ç.** Darezîn
**d.** Kes

**7-Kijan têgihandinên li jêr ne core serpêhatiyê ne?**

**a.** Taqî **b.** Lehîstok

**c.** Çîrok **ç.** Roman

**d.** Jînname

**8.Corên nivîsîna bermayekê di hêla hawêjkirin, nehawêjkirin, naverok ,awênê karanîna wê têdigihîni kijane?**

**a.** Ceribandin **b.** Rexne

**c.**Bîranîn **ç.** Fikra

**d.** Gotar

**9.** Ji awênê bi peyvan têgihandina dîtina derveya kesekê, tam herwekî wêneyê wî xîzbiki re çi nav tê dayîn?

**a.** Çavnêrî **b.** Vekirin

**c.** Portre Fîzîkî **ç.** Portreya mergî

**d.** Çîroka rewşî

**10- Kijan ne ji beşên nivîsînên ramanîne?**

**a.** Serî **b.** Naverok

**c.** Vekirin **ç.** Dawî

**d.** Neyek jî

**11.Ji vebijêrkên jêr kîjan kêrî nivîsîna taqîkirinê tê ?**

**a.** Gumana bawerkirin dikşînê. **b.** sedî sed digihê encamê

**c.** Têgihandin ji dil û bi rêkpêk bi. **ç.** Ji tabet û afirandinê re rêz digrê.

**d.** Hirizir xwe dipesêre bûyerekî.

**12.Ji yên li jêr kîjan ne sedemê nîvîsîna bingehîne.**

**a.**Rastî danîna hole **d.** Hişyarî dayîna jibo nifşê bê.

**c.** Agahîdayîna di derbarê pêşerojê de **ç.** Hezkirina ji hizirînekî.

. **b.**Di derbarê pêşerojê de agahî dayîn

**13.Kîjan ji yên li jêr ne nameya kare?**

**a.** Daxwazneme **b.** Nameya bazirganî

**c.** Nivîsînên jibo serxweşiyê **ç.** Ragihandin

**d.** peyman

**14.Kîjan ji yê li jêr nameya taybete?**

**a.** Daxwazname **b.**Nameya bazirganiyê

**c.** Nameya serxweşiyê
**ç.** Peymaname
**d.** Kartên pîrozbahiyê

**15. Di nameyê de piştî denglêkirinê kîjan hêma tê bikaranîn ?**
**a.** Xal
**b.** Bêhnok
**c.** Baneşan.
**ç.** Sê xal
**d.** Cotxal

**16.Kîjan ji yê li jêr weke taybetmendiyek bingehîn ya nameyê nayê hijmartin?**
**a.**Wateya hezkirina di navber dû kesan de didi.
**b.** Rastiyekî diparêze
**ç.** Hizrînekî destek diki.
**c.** Nêrînekî vekirî datîne holê
**d.** Di mijarekî de agahiyên ronîker dide.

**17.Kîjan ji yên li jêr nabin mijara hevpeyvînê?**
**a.** Nîvîsîna şopandin û taqîkirina rojnanamevanekî dide pêhesandin.
**b.** Bernamê hevdîtinê yê kû nûçevanek didê televisyonekî.
**c.** Axaftina spîkerek yê rodyoyê bi wezîrê perwerdê re kirî.
**ç.** Nivîsînên bêranînên wênekêşekî di nava xwe de digirin.
**d.** Nivîsîna axaftina xwendekarekî bi rêveberê dibistanê re didi têgihandin.

**18. Dema em hest hizrîn ,bûyer,rewş ,nûçe daxwaz…Li gor hişmendiyê dikin rêz û têdighînin,ji vê rêzkirina nivîskî û devokî ya kû li gor wateyê hatî kirin çi nav lê tê kirin?**
**a.** Kurtî
**b.** plan
**c.** Rêzkirin
**ç.** Wêneyîkirin
**d.** Sentez

**19. Kîjan ji yê jêr di nava sûdê planê de cih nagri?**
**a.** Di mijarê de yekîtiyê avadiki.
**b.** Ji belavbûnê rizgar dike
**c.** Demê qazenc diki.
**ç.** Pêşiya bê biryarbûnê digre
**d.** Dihêlê kû em fêrî distûrê nivîsînê bibin

**20. Dema serpêhatiyek kurt tê nivîsîn bi kîjan ji yên li jê re li hev nayên?**
**a.** Hevokên kurt tên sazkirin.
**b.** Têgihandinekî bi bandor û xurûş tê kirin.
**c.** Vekirinê dirêj pêktîne.

**ç.** Bûyer ji şopandina sûd digre bi wî awayî tê têgihandin.
**d.** Taybetmendiyên kes yê diyar radixe ber çavan.

**21. Di kîjan cûrên nameyan de ziman ,têgihandin,awa ,islûb bi fermanameyek diyar bi distûran ve hatiye girêdan?**

**a.** Nama wêjeyî **b.** Nama kar
**c.** Tlgiraf **ç.** Nama fermî
**d.** Nama taybet

**22. Daxwaznameyek di kîjan rewşan de nayê bikaranîn?**

**a.** Dema cihê saziyê ne nivîsî bi. **b.** Dema bê wajo(îmze) bi.
**c.** Navnîşan ne durist bi. **ç.** Daxwaz pir hatibe vekirin.
**d.** Navê li xwe kirî bikaraniye.

**23. Nivîsîna kû têgihandina wê ne vekirî di kîjan aliyan de lêkolîn bikin ne raste?**

**a.** Di aliyê planê de . **b.** Di aliyê rêziman de.
**c.** Di aliyê rastnivîsînê de. **ç.** Di aliyê hêma danînê de.
**d.** Di aliyê ji zanîna sûd girtinê de.

**24.Di kîjan hevokên jêr de şaşiyên nivîsînê hene?**

**a.** Naxwazim te tenê bihêlim. **b.** Pirtûka me berbi dawî ve diçe.
**c.** Şaşiyên nivîsînê ne xema min e. **ç.** Hewaya çiya xweş e.
**d.** Es dixwazim behdanekê bikêşim.

KILÎLA BERSIVAN

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Mijara testa 1 | 1.a | 2.d | 3.b | 4.a | 5.b | 6.d | | | |
| Mijara testa 2 | 1.c | 2.b | 3.a | 4.d | 5.d | | | | |
| Mijara testa 3 | 1.c | 2.a | 3.c | 4.a | 5.ç | 6.c | 7.b | 8.a | |
| Mijara testa 4 | 1.d | 2.ç | 3.a | 4.ç | 5.c | 6.ç | 7.a | 8.b | 9.c |
| | 10.c | 12.d | 13.c | 14.c | 15.b | 16.a | 17.ç | 18.d | 19.d |
| | 20.c | 21.ç | 22.b | 23.c | 24.d | | | | |

Jêderê Sûd Jê Hatine Girtin:

**1.** Pirtûka parastina gelekî ya Rêber APO
**2.** Kovara Vêsta
**3.** Kovara Hawar`ê ya Celadet Elî Bedirxan
**4.** Pirtûka konferansa çand û huner ya li Lubnan hatibû li darxistin.

**Têbînî**: Di demê amadekirina vê pirtûkê de sûd ji pirtûka dariştinê ya amadeyî ya refa 3 ya Tirkî jî hatiye girtin.